



Kurdiyat



e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2023 Sayı/Hejmar/Issue: 7

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>



Kurdiyat



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Yayıncı | Weşanger | Publisher
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü
Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl Enstîtuya Zimanên Jîndar
Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages

Sahibi | Xwedî | Owner
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına
Li Ser Navê Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl Enstîtuya Zimanên Jîndar
On Behalf of Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages
Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Editör | Edîtor
Dr. Öğr. Üye. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Kurdiyat - Yıl/Sal/Year: 2023, Sayı/Hejmar/Issue: 7

Dizinlenme Bilgileri | Abstracting and Indexing Services
ASOS, EuroPub, OpenAIRE, Google Scholar, Ideonline, Index of Academic Documents

Lijneya Weşanê | Yayın Kurulu | Editorial Board

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Jaffer SHEYHOLISLAMI	Carleton University, Canada
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Pakhshan Sabir HAMAD	Soran University, KRG/Iraq
Prof. Dr. Yadgar Rasool H. AMEEN	University of Soran, KRG/Iraq
Doç. Dr. Ayhan TEK	Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Hayrullah ACAR	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Associate Prof. Hemin Omar AHMAD	Soran University, KRG/Iraq
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Assistant Prof. Hewa Salam KHALID	Indiana University, USA
Assistant Prof. Yadollah PASHABADI	University of Kurdistan, Iran
Dr. Öğr. Üye. Zafer AÇAR	Bingöl Üniversitesi, Türkiye

Edîtorên Biwarî | Alan Editörleri | Field Editor Board

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Kenan SUBAŞI	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Ömer DELİKAYA	Bingöl Üniversitesi, Türkiye
Dr. M. Şirin FİLİZ	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Zafer AÇAR	Bingöl Üniversitesi, Türkiye
Dr. Şehmus KURT	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye

Edîtorê Zimanî | Dil Editörü | Language Editor

Araş. Gör. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Öğr. Gör. Mahmoud ALNAFFAR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye

Sekreteryaya | Secretary

Öğr. Gör. Hacı YILMAZ Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Dizgi/Rûpelsazî/Design

Erdal YILDIZ

İletişim/Têkilî/Contact Details

e-mail: kurdiyat@yyu.edu.tr | yde@yyu.edu.tr

<https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdiyat>

Tel /Phone: 0432 225 14 52

Faks /Fax: 0432 225 12 28

Adres/Navnîşan/Address

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van

Yayın Tarihi/Tarîxa Weşanê/Publication Date

Haziran/Hezîran/June 2023

Lijneya Şêwrê | Danışma Kurulu | Advisory Board

Prof. Dr. Halit DEMİR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ	Bingöl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Jaffer SHEYHOLISLAMI	Carleton University, Canada
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Yadgar Rasool HamadAMEEN	University of Soran, KRG/Iraq
Doç. Dr. Ahmet KIRKAN	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Ayhan TEK	Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Kemal KAYA	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Kenan BULUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Necat KESKİN	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Associate Prof. Hassan SARBAZ	University of Kurdistan, Iran
Assistant Prof. Abdulsalam N. ABDULLAH	University of Zakho, KRG/Iraq
Assistant Prof. Habilallah SALIMI	University of Kurdistan, Iran
Assistant Prof. Hewa Salam KHALID	Indiana University, USA
Assistant Prof. Zaniar NAGHSHBANDI	University of Kurdistan, Iran
Dr. Öğr. Üye. İlyas SUVAĞCI	Hakkari Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Kenan SUBAŞI	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Mehmet YONAT	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Yaşar KAPLAN	Hakkari Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üyesi Ramazan TURGUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Dr. M. Şirin FİLİZ	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Şehmus KURT	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Güneş KAN	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. İbrahim TARDUŞ	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Pınar YILDIZ	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Sevda ORAK REŞİTOĞLU	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Ümran ALTINKILIÇ	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye

Kurdiyat-7

Hekemên vê Hejmarê | Bu Sayının Hakemleri | Reviewers of The This Issue

Prof. Dr. Hayreddin KIZIL	Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN	Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY	Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Hemin Omar AHMAD	Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üye. Ömer DELİKAYA	Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üye. Mehmet YONAT	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üye. Yaşar KAPLAN	Hakkari Üniversitesi
Dr. Öğr. Üye. Yadollah PASHABADI	University of Kurdistan, Iran
Dr. Öğr. Üye. Abdulbari AZIZ OTHMAN	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Dr. Ayhan YILDIZ	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Güneş KAN	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Şehmus KURT	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Mesut ARSLAN	Siirt Üniversitesi

Dergide yayımlanan makalelerin tüm sorumluluğu yazarlarına; yayın hakları ise Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'ne aittir. Yayıncının izni olmadan kısmen veya tamamen herhangi bir şekilde basılamaz ve çoğaltılamaz. Dergi Yayın Kurulu gönderilen yazıları yayımlayıp yayımlamama konusunda serbesttir. Dergiye gönderilen makaleler iade edilmez. Yayın Kurulu ve editöryal ekip makalelerle ilgili herhangi bir yasal yükümlülük kabul etmez.

Berpirsiyariya meqaleyên ku di kovarê de tene weşandinê ya nivîskarên wan bi xwe ye. Mafê weşana gotaran jî aîdê Enstîtuya Zimanên Zîndî ya Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê ye. Qismen yan jî bi tevahî, bêyî destûra weşanger tu gotar nayê çapkirin û zêdekirin. Lijneya Weşanê ya Kovarê di biryara xwe ya weşandin yan jî neweşandina gotarê de azad e. Gotarên ku ji bo kovarê hatine şandin bi şûn de cardî nayên îadekirin. Lijneya kovarê û komîteya edîtorî derbarê gotaran da mesûliyeta qanûnî qebûl nake.

All responsibility of the articles published in the journal belongs to the authors and the publication rights belong to the Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages. It may not be reproduced or reproduced in any form, in whole or in part, without the permission of the publisher. Editorial board of the Journal is free to publish and publish the articles. Articles submitted to the journal are not returned. Editorial board does not accept any legal liability for articles.

İçindekiler / Naverok / Contents

Editörden/Ji Edîtor/From The Editor ————— 6

“JİYANA PÎROZ” A MELA ‘ELADÎNÊ KOPÎ: SIYEREKE MENZÛM DI EDEBİYATA KURDÎ DE ————— 9

Kürt Edebiyatında Manzum Bir Siyer Örneği: Molla Alaeddin Kopî'nin “Jiyana Pîroz” Adlı Eseri

Mullah ‘Aladdin Kopî’s “Jiyana Pîroz”: A Poetic Siyar in Kurdish Literature

Halit ERTAŞ

HÊMAYA DÎROKÊ DI HELBESTA TÎRÊJ DE ————— 27

Tîrêj Şiirinde Tarihsel İmgeler

Historical Images in Tîrêj Poetry

Nurettin ERTEKİN

ئەحمەدموختار جاف وەکوو شاعیریکی رۆشنبیر و چیرۆکنووسیکی ریفۆرمخواز ————— 45

Ahmad Mukhtar Jaff as an Intellectual Poet and a Reformist Story Writer

Bir Entelektüel Şair ve Reformist Öykü Yazarı Olarak Ahmed Muhtar Caf

Awat Hassan WALI

MELA ‘EBDIRREHÎMÊ WESTANÎ Û ŞERHA WÎ LI SER DÎWANA MELAYÊ CİZİRÎ ————— 59

Molla Abdurrahim-i Vestanî ve Molla Ahmed-i Cizîrî Divanı Şerhi

Mullah ‘Abd al-Rahim Wastanî and his Sharh on the Mullah Ahmad al-Jazeri’s Dîwan

Tahsin İbrahim DOSKİ

IV. SEMPOZYÛMA NAVNETEWÎ YA KURDIYATÊ MELAYÊ CİZİRÎ Û MÎRASA WÎ ————— 75

IV. Uluslararası Kurdiyat Sempozyumu Melayê Cizîrî ve Mirası

IV. International Kurdiyat Symposium Melayê Cizîrî and His Heritage

Nevzat EMİNOĞLU

Ji Edîtor

Kurdiyât bi hejmarê xwe ya heftemîn li pêşberî akademîsyen û lêkolerên kurdolojiyê ye ku ev jî ji bo me tevan cihê kêfxweşiyê ye.

Gotara ewil di vê hejmarê de bi sernavê “**“Jiyana Pîroz” a Mela ‘Eladînê Kopî: Siyereke Menzûm di Edebiyata Kurdî de**” ya Halit Ertaş e. Ertaş, di vê nivîsarê de danasîn û krîtîka siyereke menzûm kiriye, û tevkariyeke nû li edebiyata kurdî ya dînî kiriye. Gotara duyem a Nurettin Ertekin e ku wî bi nivîsara xwe ya “**Hêmaya Dîrokê di Helbesta Tîrêj de**” xwestiye di çarçoveya her sê dîwanên Tîrêj de li ser têkilîya helbest û dîrokê raweste. Gotara sêyem a vê hejmarê ya Awat Wali ye ku bi sernavê “**Ehmed Muxtar Caf Wekû Şa‘îrêkî Roşînîr û Çîroknûsêkî Rîformîxwaz**” di kovarê de cih girtiye. Wali di nivîsara xwe de şair û çîroknûs Ehmed Muxtar Caf daye nasandî û di berhemên wî de unsûrên sereke di bin çar sernavan de civandine û nirxandine. Tehsîn Îbrahîm Doskî bi sernavê “**Mela ‘Ebdîrrehîmê Westanî û Şerha Wî li ser Dîwana Melayê Cizîrî**” behsa jiyana Mela Ebdîrrehîmê Westanî kiriye û şerha wî ya destnivîs daye nasandî. Ev nivîs digel nirxa xwe ya akademîk, ji ber ku alim û edîbekî Wanî dîsa li bajarê Wanê dide nasandî, lewma hêjayî behskirinê bû.

Kurdiyât di heman demê de çalakîyên akademîk jî tenzîm dike. Îsal di meha 27-28ê Nîsanê de **IV. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyâtê** ya bi temaya “**Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî**” li zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê hat lidarxistin. Hinek ji wan pêşkêşî û teblîxên vê sempozyûmê di sala 2023an de wek beşa pirtûkê, hinek ji wan jî di hejmarê 8an a Kurdiyâtê de wek gotarên akademîk dê bîn weşandin. Vêca Nevzat Eminoğlu, bi sernavê “**Nirxandina Sempozyûmê, IV. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyâtê Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî**” nirxandî û rexneya vê sempozyûmê kiriye. Ji ber ku nirxandî û rexneyên akademîk hê jî di akademiya kurdolojiyê de di asta tunebûnê de ye, ji vî aliyê ve em hêvî dikin ku ev nirxandî dê bibe mînak û piştî her sempozyûmê rê li ber xebatên wereng veke.

Belê, her kovarek mizgînberê hejmarê li dû xwe ye, bi vê hêvî û hissiyatê ji bo hejmarê zivistanê em li benda xebat û lêkolînên we ne...

Dr. Yakup AYKAÇ

Editörden

Kurdiyat Dergisini yedinci sayısıyla Kürdoloji sahasında çalışan akademisyen ve arařtırmacıların karřısına ıkarmanın haklı gururunu ve mutluluęunu yařıyoruz.

Bu sayının ilk makalesini Halit Ertař'ın “**Kürt Edebiyatında Manzum Bir Siyer Örneęi: Molla Alaeddin Kopî'nin “Jiyana Pîroz” [Kutlu Yařam] Adlı Eseri**” oluşturuyor. Ertař, yazısında Kürtçe bir manzum siyer örneęini tanıtarak kritize etmiř ve böylece Kürtçe dini edebiyat literatürüne yeni bir eserle katkıda bulunmuřtur. Derginin ikinci makalesinde Nurettin Ertekin “**Tîrêj Şiirinde Tarihsel İmgeler**” bařlıklı yazısında Kürt řair Tirêj'in üç řiir divanını inceleyerek řiirdeki tarihsel imgeleri ele almıřtır. Kurdiyat'ın üçüncü makalesinde Awat Wali “**Bir Entelektüel Şair ve Reformist Öykü Yazarı Olarak Ahmed Muhtar Caf**”la dergiye katkıda bulunmuřtur. Wali, sözkonusu makalesinde Kürt řair ve öykü yazarı Ahmed Muhtar Caf'ı tanıtmıř ve eserlerinde öne ıkan unsurları dört bařlık altında toplamıř ve kritize etmiřtir. Tahsin İbrahim Doski “**Molla Abdurrahim-i Vestanî ve Molla Ahmed-i Cizîrî Divanı Şerhi**” bařlıklı makalesiyle Molla Abdurrahim-i Vestanî'nin hayatını ele almıř ve onun Molla Ahmed-i Cizîrî'nin divanına üç dilde yazmıř olduęu řerhi tanıtmıřtır. Bu makale akademik yönden deęerli olmasının yanı sıra, Vanlı bir alim ve edibi yine Van'da ıkan akademik bir dergide tanıtması hasebiyle de ayrıca bir önem arz etmektedir.

Kurdiyat, akademik bir dergi olmanın yanında, ayrıca akademik faaliyetler de düzenlemektedir. Bu yıl 27-28 Nisan tarihlerinde “**Melayê Cizîrî ve Mirası**” temalı IV. Uluslararası Kurdiyat Sempozyumu, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi'nde gerekleřtirildi. Bu sempozyumun sunum ve teblięlerinin bir kısmı 2023 yılında kitap bölümü olarak, bir kısmı ise akademik makale olarak Kurdiyat'ın 8. sayısında yayınlanacaktır. Bu akademik etkinlikten dolayı, Nevzat Eminoęlu “**Sempozyum Deęerlendirmesi, IV. Uluslararası Kurdiyat Sempozyumu Melayê Cizîrî ve Mirası**” bařlıklı yazısıyla sözkonusu sempozyumu akademik bir gözle deęerlendirmiřtir. Bu türden sempozyum deęerlendirme ve eleřtirme yazıları Kürdoloji sahasında yok denecek kadar az olmasından ötürü, mezkûr yazının kendinden sonraki bu türden yazılara örnek olacaęı ve kapı aralayacaęını ümit etmekteyiz.

Malumunuzdur ki her yeni dergi kendinden sonraki sayının habercisidir, bu ümit ve hissiyat ile Kış sayımızda akademik arařtırma ve makalelerinizi beklemekteyiz...

Dr. Yakup AYKAÇ

From the Editor

We are proud and happy to present the seventh issue of the Kurdiyât Journal to academics and researchers working in the field of Kurdology.

The first article of this issue is Halit Ertaş's "**Mullah Aladdin Kopî's "Jiyana Pîroz" [Blessed Life]: A Poetic Siyar in Kurdish Literature**". In his article, Ertaş introduces and criticizes a Kurdish verse-*siyar* example, thus contributing to the Kurdish religious literature with a new study. In the second article of the journal, Nurettin Ertekin, in his article titled "**Historical Images in Tîrêj Poetry**", analyses three poetry *dîwan* of the Kurdish poet Tîrêj and discusses historical images in his poetry. In the third article of Kurdiyât, Awat Wali contributed with "**Ahmad Mukhtar Jaff as an Intellectual Poet and a Reformist Story Writer**". In this article, Wali introduces the Kurdish poet and short story writer Ahmed Mukhtar Jaff, and he gathers and criticizes the prominent elements of his works under four headings. Tahsin İbrahim Doski, in his article titled "**Mullah 'Abd al-Rahim Wastanî and his *Sharh* on the Mullah Ahmad al-Jazeri's *Dîwan***", discusses the life of Mullah 'Abd al-Rahim Wastanî and introduces his trilingual commentary on Mullah Ahmad al-Jazeri's *Dîwan*. In addition to being academically valuable, this article is significant because it presents a scholar and literary critic from the city of Van and in an academic journal published in Van.

Kurdiyât, besides being an academic journal, also organizes academic activities. This year, IV. International Kurdiyât Symposium with the theme of "**Melayê Cizîrî and His Legacy**" was held on 27-28 April at Van Yüzüncü Yıl University. Some of the presentations and papers of this symposium will be published as a book chapter in 2023, and some will be published as academic articles in the 8th issue of Kurdiyât. Due to this literary event, Nevzat Eminoğlu evaluated the symposium in question from an academic point of view with his article titled "**Symposium Review, IV. International Kurdiyât Symposium Melayê Cizîrî and His Heritage**". Since such symposium evaluation and criticism articles are almost non-existent in the field of Kurdology, we hope that the article mentioned above will set an example and open the door for future articles.

As you know that each new journal is the precursor of the next issue; with this hope and feeling, we are waiting for your academic research and articles in our Winter issue.

Dr. Yakup AYKAÇ



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 7

e-ISSN 2717-8315

Doi: 10.55118/kurdiyat.1295408

Rüpel/Sayfa Page: 9-26



Cureya Nivîsarê/Makale Tûrû/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Geliş Tarihi/Received: 10.05.2023
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted:
08.06.2023
Halit Ertaş, Yüksek Lisans, Mardin Artuklu
Üniversitesi.
halitertas0000@gmail.com
ORCID: 0000-0002-2743-2394

Atf: Ertaş. H. (2023). "Jiyana Pîroz" a Mela
'Eladînê Kopî: Siyereke Menzûm di Edebiyata
Kurdî de", Kurdiyât, 7, 9-26
Citation: Ertaş. H. (2023). "Mullah 'Aladdin
Kopî's "Jiyana Pîroz": A Poetic Siyar in Kurdish
Literature", Kurdiyât, 7, 9-26

"JIYANA PÎROZ" A MELA 'ELADÎNÊ KOPÎ: SIYEREKE MENZÛM DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Halit ERTAŞ

Kurte

*Siyer ew cure zanist e ku jiyana Hz. Pêxemberî ji xwe re dike babet. Bi gotineke di ji wan berheman re siyer tê gotin yên ku jiyannameya Pêxemberî bo xwe dikin mijara sereke. Bi rengekî siruştî cara pêşîn di edebiyata erebî de derketiye meydanê. Her li dû vê yekê, di edebiyata miletên musulman de reng ve-daye. Her wekî erebî û farisî û tirkî, di nav edebiyata kurdan de jî derketiye meydanê û bi zaravayên kurdî gelek nimûneyên wê çêbûne. Mijara vê gotarê jî siyera menzûm a Mela 'Eladînê Kopî ye. Mela 'Eladîn di vî biwarî de berhemeke menzûm nivîsiye û navê wê jî daniye *Jiyana Pîroz*. Amanca me di vê gotarê de nasandin û lêhûrbûna vê siyera menzûm e ji layenê naverok û şeweyê ve. Her weha bi xêra vê xebatê di edebiyata kurdî ya klasîk de berhemeke nû di literatûrê de zêde dibe. Di encama vê xebatê de hate dîtin ku *Jiyana Pîroz* siyereke menzûm e, taybetiyên xweser di xwe de dihevine, ji layenê teşeyê ve di forma mesnewiyê de hatiye nivîsin, ji layenê zimên ve rewan û zelal e; her weha ji layenê naverokê ve jî tenê serdema Mekkeyê ji xwe re kiriye babet.*

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Jiyana Hz. Pêxember, Siyerên Kurdî, Mela 'Eladînê Kopî, Jiyana Pîroz.

Kürt Edebiyatında Manzum Bir Siyer Örneği: Molla Alaeddin Kopî'nin “Jiyana Pîroz” Adlı Eseri

Özet

Siyer Hz. Peygamberin hayatını konu edinen bilim dalıdır. Başka bir deyişle Peygamberin hayatını konu alan eserlere siyer denir. Tabii olarak ilk defa Arap Edebiyatında meydana çıkmış olup İslam Edebiyatında önemli yer tutmuştur. Arap, Fars ve Türk edebiyatlarında olduğu gibi Kürt Edebiyatında da Kürtçenin çeşitli diyalektlerinde kendini göstermiştir. Bu makalenin konusu Molla Alaeddin Kopî'nin manzum olarak yazdığı siyer eseridir. Molla Alaeddin bu konuda *Jiyana Pîroz* (Kutlu Yaşam) ismin de manzum bir siyer örneği vermiştir. Bu makaledeki temel gayemiz şekil ve muhteva açısından bu manzum siyer üzerine yoğunlaşp tanıtmaktır. Ayrıca bu çalışma sayesinde Klasik Kürt Edebiyatına yeni bir eserin eklendiği âşikardır. Bu çalışmanın akabinde *Jiyana Pîroz*'un manzum bir siyer olup kendine has ege-men özellikler barındırıp şekilsel açıdan mesnevi formunda açık ve akıcı bir dille kaleme alındığı anlaşılmıştır. Ayrıca muhteva açısından sadece Mekke dönemini konu edinmiştir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Hz. Peygamberin hayatı, Kürtçe siyerler, Molla Alaeddin Kopî, Jiyana Pîroz.

Mullah ‘Aladdin Kopî’s “Jiyana Pîroz”: A Poetic Siyar in Kurdish Literature

Abstract

Siyar is the branch of science that deals with the life of our Prophet. In other words, the works about the life of the Prophet are called *siyar*. Naturally, it first emerged in Arabic literature and played an important role in Islamic literature. As in Arabic, Persian and Turkish literatures, it has also emerged in Kurdish literature in various dialects of Kurdish. The subject of this article is the *siyar* written in verse by Mullah ‘Aladdin Kopî. Mullah ‘Aladdin has given an example of a poetic *siyar* on this subject called *Jiyana Pîroz* (Holy Life). Our main aim in this article is to focus on and introduce this verse *siyar* in terms of form and content. In addition, it is obvious that a new work has been added to the Classical Kurdish Literature thanks to this work. Following this study, it is understood that *Jiyana Pîroz* is a *siyar* in verse and has its own sovereign features and is written in a clear and fluent language in *mathnawi* form; in addition, in terms of content, it deals only with the *Meccan* period.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Life of the Prophet, Kurdish siyars, Mullah ‘Aladdin Kopî, Jiyana Pîroz.

Destpêk

Wekî tete zanîn Hz. Pêxember bi şexsiyet û erka xwe ji nû ve mêjû nivîsandiyê. Li gel mêjûya Îslamê musulmanan han dayîne bi rengê herî baş Hz. Muhemmed (sew) li mirovahiyê bidin nasîn. Ji ber hindê serî li gelek rêkên cur bi cur ên lîteraturê dayîne. Yek ji wan rêkan jî nivîsîna siyerê ye. Wate jê, ew berhemên li ser jiyana Pêxemberî hatîne nivîsîn ji wan re siyer tê gotin. (Yaman, 2009: 316). Li gorî daneyên li ber destan siyer piştî nîveka sedsala pêşîkê ya hicriyê ji hedîsê veqetiyaye û rêkeka xweser bo xwe ava kiriye. Di vî biwarî de tete dîtin ku carinan ji rexnegiriya zanista hedîsê dûr dikeve. Yek ji egerên vê yekê li gel babeta jiyana kesayetên giring ên mêjûyê, kartêkirina vegotinên menqîbewî û mîtolojîk in li gor aghiyên rastî yên mejûyê (Özdemir, 2007: 129).

Musulman ji bo ku erka xwe ya dînî pêk bînin hewcedariya wan bi rêberê Îslamê Hz. Pêxember (sew) heye her gav. Pêxemberî emir û nehyên Xwedê bi rêka Qur'ana Pîroz bi rengekê paqij beyan kiriye bo insanîyetê. Musulman da kamil bibin hewcehiya xwe bi Hz. Pêxemberî anîne. Ji ber hindê pêdivî bi zanîna jiyana pêxemberî dîtine bi rêka jêderên rast û durist. Gelo ibadetên xwe bi çî rengî dikir, berevaniya xwe çawa li rûber dijminên xwe dikir, jiyana wî ya rojane çawa bû, li beranber neheqîyan çawa disekinî, mêrekî çawa bû bo jinên xwe, babekî çawa bû, xem û endîşeyên wî çî bûn? Ev hemî û zêdetir, bûyîne meraq bo ehlê wî.

Xwedê di Qur'ana Pîroz de weha kerem kiriye li ser Pêxemberî: "Bibêje (Pêxember): Eger hûn bi rastî ji Xwedê hez bikin, naxwe bidin pey min, Xwedê dê ji we hez bike û li gunehên we bibore. Xwedê her gunehbexş e, dilovîn e" (Alî Îmran, 3/31). Xwedê bi vî rengî berê musulmanan dide pêxemberê xwe. Ev ayet û yên bi vî rengî qedir û giringiya Pêxemberî nîşan dane û her tim berê musulmanan zindî hêlane li Pêxemberî. Musulmanan xwestine Îslamiyetê li gorî usûla wê bi hemû rukn, erk û esasên wê bijîn. Yek ji egerên vê yekê jî eşq û şewqa mezin a li hember Pêxemberî ye ku Pêxemberî bi kiryarên xwe, refarên xwe û miameleyên xwe di her qadê de li gel hemû cure mirovan bûye egera hezjêkirinek mezin, heta muşrikan jî pir hez jê kiriye. Li hember vê hezjêkirinê gelek ji dildarên vê rêkê xwestine di jiyana xwe de vê hezjêkirina xwe bi şikleki birêjin. Yek ji egerên dîtir ên nivîsandîna berhemên ayînî di vê rêkê de, taybet li ser babeta berbas û li ser Pêxemberî, wezîfedîtina pîroziya vê yekê ye di seranserê mêjûya Îslamî de. Şair û aliman wekî xizmetguzariyeka di rêka ayînî de vê yekê wekî ferz dibînin zor caran û bi vî rengî han dayîne berhemên li ser Pêxemberî binivîsîn û wezîfeya xwe pêk bînin.

Her wekî ku amaje pê hatî kirin, siyer ew cure berhem in bi rengekî mensûr an jî menzûm hatîne nivîsîn li ser jiyana Pêxemberî. Anku jidayikbûna wî, têkiliyên wî, nubuwweta wî, cengên wî, rûdanên wî, şexsiyeta wî û hwd. Di vê çarçoveyê de kesên li dora Pêxemberî anku kesayetên mîna xulefaî raşidîn, sehabe, xanimên pêxemberî û hwd bûyîne babet bo van berhemên. Li ser vê babetê mesnewiya Mela 'Eladinê Kopî jî bi navê *Jiyana Pîroz* li ber destan e. Mesnewî teşeyekê giring û naskirî ye di nav teşeyên nezmê de yên ku ji beytan pêk tên û wek cureyekê edebî jî qadeke berfireh a edebiyata Îslamî ya klasîk e (Adak, 2019: 245). Di vî warî de lêkolîn û nixandîna vê berhemê ji layenê ruxsarî û naverokî ve hatiye kirin.

1. Siyer

“Siyer” di binereta xwe de peyvek erebî ye, ji koka xwe ya “seyr”ê dariştiye û li gor ferhenggan wateya “reftar, hal, rê, rewîştê kesekê, xislet û çîroka jiyane” dide. Ev peyv ji pirjimariya “sîret”ê pêk hatiye (Yaman, 2009: 316). Sîret hem madî û hem jî me‘newî anku diyariya rewşê ye. Pêxember di mêtûya Îslamê de wekî pêşewayekî hatiye dîtin. Lewra ji destpêka Îslamiyetê heta niha jiyana wî her tim bûye babetek serincrakêş û berhem li ser hatine nivîsîn. Çawa ku siyer bo jiyana Pêxemberî tete gotin her wesa sîret jî hem ji bo jiyana Pêxemberî hem jî ji bo jiyana kesayetên dîtir tete gotin.

Bi giştî di destpêka van berhemana de, ewil babetên şexsiyeta wî, pesindayîna wî û nixê peywirdariya wî tete vegotin. Bajarê Xwedê lê dayî Mekkeyê, Ke‘beyê, qebîleya Qureyşê, rewşa ereban di Serdema Cahiliyeyê de û fama jiyana wan, nazilbûne peyama îlahî, pêxemberbûna wî û standina wehiyan, bizavên teblîxkirinê di serdema Mekkeyê de, hicretên bo Hebeşistanê û Medîneyê, muhacir û ensar, yê hicret nekirin û munafiqên serdema Mekkeyê, bizavên piştî hicretê, barûdoxa giştî ya musulmanên li Medîneyê û girêdana wan li gel Resûlê Xwedê, munafiqên serdema Medîneyê, pêwendiyên bedewî û ehlê kitabana, pêwendiyên li gel müşrikên Mekkeyê, şer û ceng û rûdanên wî demî, şerên Bedir û Uhûd û Xendekê, rêkeftina Hudeybiyeyê, fethkirina Mekkeyê, şerên Huneyn û Tebûkê û gelek ayetên di Qur‘anê de behsa wî kirin bi şeweyekê giştî dibin babet bo xebatên bi vî rengî, sehabiyên wî û gelek babetên dîtir tene pêşkêşkirin (Şalul, 2019: 22-23).

12

Di vê çarçoveyê de “mexazî” anku “cihê cengê, ceng û serpêhatiyên cengê” pirjimar e û ji yekjimariya “maxzat”ê dariştiye. Ev term bûye navê berhemên cengên Pêxemberî yê li beranber müşrikan. Hem wekî cureyekê serbixwe hem jî li gel siyerê bi hemwateyî hatiye emilandin. Her li ser biwarê gelek berhem di alema Îslamî de hatine nivîsîn; bo wêne siyera herî kevn ku ji layenê Îbn Îshaq ve bi navê Ebu‘l-Fida Îbn Kesîr hatiye nivîsîn ku carinan bi *Sîretu‘l-Îbn Îshaq*, carinan bi *Mexazî Îbn Îshaq* û carinan jî bi navê *es-Sîretu‘n-Nebewiyye* hatiye binavkirin (Fayda, 2009: 319). Her dîsa li dû vê babetê siyer û mexaziyan cihê xwe di edebiyata kurdî de jî girtine; wek nimûne, Eliyê Herîrî menzûmeya bi navê *Qewlê Hespê Reş* di vê biwarê de nivîsiye. Her weha Mela Yasîne Alikî jî bi navê *Xezwetu‘l-Huneyn* mexaziye li ser Hz. Elî nivîsiye (Bnr. Bişaroğlu, 2022).

Her wekî hatî destnîşankirin ku ew berhemên li ser jiyana Pêxemberî hatine nivîsîn siyer in, li dû vê yekê berhemên li ser jidayikbûna Pêxemberî wekî *mewlîd*; yê li ser miraca wî wekî *mira-cname*, yê li ser wefata wî *wefatname*, yê li ser mucîzeyên wî *mucîzename*, yê li ser şerên wî *xezawetname/cengname* û hwd tene binavkirin (Ertekin, 2022: 15). Li ser vê babetê bo nimûne yek ji mînakên cengnameyê ji layenê Eliyê Herîrî ve hatiye nivîsîn bi navê *Qewlê Hespê Reş* di kurdî de (Bnr. Yıldız, 2021; Aykaç, 2023: 105-111).

1.1. Jêderên Nivîsîna Siyera

Nivîsandina ilmê siyerê di tarîxa Îslamê de li gor hindêk jêderên diyar û rê û rêbazan tene kifşekirin û nivîsandin. Jêderên siyera di bin banê Qur‘ana Pîroz, rîwayetên Îslamî û bermahiyan de pişqdar dibin li ser sê xalan (Şalul, 2019: 138). Xala yekem, li gor baweriya ayîna Îslamî Qur‘ana

Pîroz ji sedsala heftemîn ve hem ji layenê muhtewayê hem jî ji layenê fizîkî ve xwe parastiyê heta roja me. Qur'ana Pîroz di nava 23 salan de bi rengekê wehiya îlahî nazil bûye bi qazidiya Hz. Muhammed (sew). Li dû van zanyariyan bivê nevê zanyariyên giring bi rêka Qur'anê peyda dibin li dor Pêxemberî. Qur'ana Pîroz jêdereka sereke ye bo nivîsîna siyerê ku ew her çend kitêbeka ayînî be jî di heman demê de kitêbeka mêjûyî ye jî. Tê de zanyariyên jiyana ereban a berî Îslamê ya civakî, ekonomî, dînî û hizirî hene. Agehiyên di vî biwarî û şexsiyet û malbata Resûlî de, pêxemberiya wî, cengên wî, têkiliyên li gel muşrikan, sîfat û taybetmendiyên wî û agehiyên pitir hene (Öz, 2006: 37-40).

Xala duyem, ilm û tefsîrên têkildarî Qur'anê dikevin bin banê rîwayetên Îslamî û bo siyerê jêderên sereke ne. Her weha di biwarê bidestêxistina zanyariyan de hedîsan cihekê biqedr heyê ku jêdera giring a duyem e. Ji rojên hicretê heta roja me nivîsên hedîsan ên ewil û bermahî bûyîne jêder. Hadis ew cure ilm e ku gotin û kiryar û liv û tevger û sîfatên Pêxemberî diyar dike, wan vediguhêze û dike babeta xwe (Şalul, 2019: 147). Piştî Qur'anê jêderên herî pêbawer û qebûlkirî li ser Pêxemberî bêguman hedîs in bes çî caran nayên rêza Qur'anê di warê delîlbûnê de (Apak, 2020: 73). Peydakirina hindêk zanyariyan ku di jêderên mêjûyî de neyî, agehiyên li ser ereban di warê rabûn û rûniştin û rewşa civakî de, agehiyên li ser menqibeyên sehabîyan, diyarkirina binekoka hindêk kiryarên mêjûyî yê hiqûqî, rastkirina hindêk famkirinên li ser pêxemberî û gelekên dîtir bi xêra ilmê siyerê peyda dibin (Öz, 2006: 40-44).

Xala sêyem, wesîqe cihekê giring digire di vê babetê de ku li gel vê yekê nameyên taybet û fermî, metinên rêkeftinê, hejmara nifûsê, defterên mûçeyan, tapo, tayîn, senet, bac, zikat û fetwa û qeydên ilmî roleka mezin dilîzin di warê peydakirina jêderên siyerê de (Öz, 2006: 50-51). Her weha şî'r beriya Îslamê jî cihekê giring hebû di nav ereban de lewra bi rêka van şî'ran zanyariyên mezin têne tespîtkirin. Wek dûmahîk jêderên devkî yê wekî çîrok, efsane, destan, menqîbe û hwd hêmanên giring in di vê babetê de.

1.2. Siyer di Edebiyata Îslamî de

Bi boneya Qur'anê û qazidiya Îslamê û liv û tevger û şexsiyeta Pêxemberî ya bilind, bêguman jiyân û kesayetiya pêxemberî cihekê giring digire di nav bawermendên Îslamê de. Yek ji esasên baweriya Îslamî bêguman baweriya bi Hz. Muhammed (sew) Pêxemberî ye ku musulman bi kelîmeya şehadetê bawerî pê tînin. Ev yek nîşaneyê giringiya Pêxemberî ye di ayîna Îslamî de. Li dor vê çarçoveyê, di Qur'ana pîroz de bi dehan caran nîrxê wî hatiye derpêşkirin.¹

Her wekî li jorê jî berbas bûyî û hatî nîşandayîn jiyana pêxemberî cara yekem di edebiyata erebî de ji layê Ibn Îshaq ve bi navê *es-Sîretu'n-Nebewiyye* hatiye nivîsîn. Li gor zanyariyên li ber destan ev wekî siyera yekem e hem di mêjûya Îslamî de hem jî di mêjûya edebiyata erebî de (Eser, 2008: 267). Her weha di mêjûya edebiyata farisî de cara pêşîkê Cemaluddîn Ataullah bi navê *Rewzetu'l-Ehbab* siyer nivîsiye (Ertekin, 2022: 17). Di edebiyata tirkî de her çend siyerên wergêranê hatibine nivîsîn jî siyera tirkî ya telîfî cara yekem ji layenê Mustefa Darîrê Erzîromî ve bi navê *Sîretu'n-Nebî* di sala 1388ê zayînî de hatiye nivîsîn (Ak, 2019: 21). Li rûber van edebiyatan, siyerê di edebiyata kurdî de derengtir dest pê kiriye li gor daneyên hatîne bidestêxistin.

1 Kêlam 4/68; Heşr 7/59; Muhammed 33/47; Nîsa 69/4; Enbiya 107/21 û hwd.

1.3. Siyer di Edebiyata Kurdî de

Pêxemberê Xwedê wekî rêberê ji her layenî ve xîtabî musulmanan kiriye. Lewma jiyana Pêxemberî ji her layenê xwe ve hatiye heskirin û mînakgirtin. Bi her rengî heyî di perspektîfa xalên jiyana pêxemberî de *mewlîd*, *miracname*, *mucîzename*, *xezawetname*, *wefatname* û *siyername* hatine nivîsîn.

Nivîsandina jiyana pêxemberî anku siyer her çend teb‘en di nav ereban de dest pê kiribe jî di nav civak û edebiyatên Îslamî de jî belav bûye û gehîştîye qonaxên giring. Wate jê, nimûneyên siyeran li gel erebî û farisî û ûrdûyî û tirkî û hwd di nav kurdan de jî cihê xwe dîtîye bi dehan berheman.

Li gor zanyariyan di nav kurdan de cara pêşîkê ji layenê Mela Hesên Bateyî (1670-1750) ve li ser Pêxemberî bi navê *Mewlîdê* berhem hatiye nivîsîn ku eve jî cureyek e ji siyerê wekî li jor jî amaje pê hatî dayîn li ser babeta jidayikbûna Pêxemberî ye. Ev berhem bi afirandina ronahiyê û Hz. Ademî dest pê dike heta jidayikbûna Muhemmed Pêxemberî û hindêk rûdanên giring ên jiyana wî û zivirîna wî bo Mekkeyê. Her paşê siyer û miracnameya yekem ji layê Şêx Ebdurrehmanê Axtepî (1853-1910) ve bi navê *Rewdu’-n-Ne’îmê* di sala 1888an de hatiye encamdan. Hilye û mirac babetên sereke yên vê berhemê ne û li gel van babetan ne‘t, mersiye û munacaatê jî tê de hene. Ev berhem, ji 4513 beytan pêk tê û hema bêje hemî li ser Pêxemberî û hezjêkirina wî ne. Piştî van her du berheman gelek berhemên siyerê têne nivîsîn di nav kurdan de (Ertekin, 2022: 17). Muhtewaya siyerên kurdî taybet jiyana Pêxemberî ye bi rengekê kronolojîk, bes siyerên taybet li ser babeteka jiyana Pêxemberî rawestiyayîn jî hene, yên wekî wefatû‘r-Resûl, hicretû‘n-Nebî, ne‘t, hilye, exlaqu‘n-Nebî, miracname, xezawetname, şefa‘etname, çil hedîs û hwd. Li gel vê babetê wekî nimûneyeka tam mirov dikare siyera Şêx Tahirê Şoşî (1917-1962) ya bi navê *Gulzarê* destnîşan bike. Gulzara Şoşî mesnewiyeka dînî/tarîxî ye ku xwudanê firehtirîn qewareyeyê di vê mijarê de. Ev berhema menzûm ji 310 serenav û 603 rûpel û teqrîbî 14.000 beytan pêk hatiye. Li ser sîreta Pêxemberî û mijarên eleqedarî wî hatiye nivîsîn. Şairî ji destpêka Îslamiyetê heta sala pêncem a koçî bi rengekê hûrgilî nivîsiye. Adak, dide diyarkirin ku dîbaceya vê berhemê yek ji sê dîbaceyên herî giring tê dîtin di edebiyata kurdî de. Lê her çend qeware fireh û dirêj be jî ji ber ku şair di jiyekê ciwan de emrê Xwudê dike beşa xatimeyê jî di nav de qismek nehatiye nivîsîn (Adak, 2020: 1506-1512).

Li dû zanyariyan hem bi mensûr hem jî bi menzûm, bi rengên telîfkirî an jî wergêranî di edebiyata kurdî de di her çar diyalektên sereke (sorani, kurmancî, zazakî, hewramî) de, kêmtirîn dewrûberê 140 berhemên têkildarî jiyana Pêxemberî li ber destan e. Rêjeya siyeran li ser diyalektên kurdî weha ye: Bi giştî di sorani de 86 siyer hatine nivîsîn. Ji van 9 menzûm, 75 jî mensûr û 2 heb jî hem menzûm hem mensûr in. Her weha 49 telîfkirî ne û 37 jî wergêrandî ne. Bi tevahî di kurmancî de 50 siyer hatine nivîsîn. Ji van 13 menzûm, 37 jî mensûr in. Her weha 38 telîfkirî, 12 jî wergêrandî ne. Di kirmançkî/zazakî de hemû 3 siyer hatine nivîsîn. Ji van yek menzûm û 2 jî mensûr in. 2 lib telîfkirî û yek wergêrandî ye. Bi giştî di hewramî de 2 siyer hatine nivîsîn. Ji van yek menzûm e, yek mensûr û her du jî telîfkirî ne (Ertekin, 2022: 136).

Li dû van zanyariyan tête dîtin ku di babeta siyerê de 86 berhemên bi diyalekta sorani; 50 bi

kurmançî, 3 bi kirmançkî, 2 bi hewramî hene û bi tamamî dikine 140 berhemên siyerê di edebiyata kurdî de (*Jiyana Pîroz* ne tê de). Dîsa tête dîtîna ku di warê siyernameyan de soran pir pêş keftine; ber eksê vê bi hewramî û kirmançkî kêr berhem hatine nivîsîn. Her dîsa li dû van zan-yariyan tê dîtîna ku ji van 23 menzûm, 115 mensûr û 2 du lib jî hem menzûm hem mensûr in. Li gor van agehiyan xuya dibe ku mensûrnûsîna siyera di nav edebiyata kurdî de bihêztir e li gor menzûmnûsîna siyera.

Her di vî biwarî de pêdivî ye bête diyarkirin ku her çend 140 siyerên kurdî hatibine diyarkirin jî reng e zêdetir hebin û nehatibin dîtîna û tespîtkirin ku roj bo rojê nivîser û berhemên siyera di nav kurdan de zêdetir û berfirehtir dibin. Li dû vê yekê yek ji van nivîserên dûmahîkê jî Mela ‘Eladînê Kopî ye ku Ertekînî xwe negehandiyê wî û berhema wî *Jiyana Pîroz* û heta niha çî xebat li ser vê berhemê nehatîne kirin. Bi vê rêkê ev berhem bûye mijara vê xebatê. Mela ‘Eladînê Kopî *Jiyana Pîroz* bi rengekê menzûm, li ser şikil û şewaza jiyana Pêxemberî, kesayetîya wî, rûdanên wê demê, li dû çavkaniyên Qur’an û hedfs û çendek ji berhemên şairên dîtîr nivîsiye. Em dikarin vê siyera giranbûya jî li van siyera û edebiyata kurdî zêde bikin.

2. Kurtejiyana Mela ‘Eladînê Kopî

Mela ‘Eladînê Kopî di sala 1937an de li gundê Melamustefayî yê ku bi ser qezaya Kopê ve girêdayî, Xwedê daye. Navê babê wî Efdel, navê bapîrê wî Heyder e. Mela ‘Eladîn ji eşîra Memanî/Memanan a şaxa Badilî/Badilan e. ‘Eladîn hêj di wextê piçûkîniya xwe de, anku di heft saliya xwe de, dest bi xwendina Qur’ana Pîroz kiriye (Ertaş, 01/03/2023).

Di encama hevpeyvîn û tşkiliyan li gel Mela ‘Eladînî, der heqê jiyana wî de agehiyên giring ketin ber destan. Mela ‘Eladîn li def melayên cudawaz berhemên kurdî/Îslamî yê wekî *Mewlîd*, *Nûbihara Biçûkan*, *Riyadu’l-Bedî’e* xwendine. Mela ‘Eladîn kitêba *‘Izziyê heta Şerhu’l-Muxniyê* li nik feqiyê Mela Nîmetullah, Mela Reşîdî dixwîne; li ber destê Mela Nîmetulahî kitêba *Netaiçu’l-Efkar*; kitêba *Suyûtî* jî li ber destê Mela ‘Ebdullahê Cindî û Mela ‘Ebdurrehmanê Durre dixwîne. Hindek ji kitêba *Camîyê* li gundê Melhemiyê yê Gimgimê li nik Mela Muhemmed Sadiq, çendê dî jî li gundê Xoşgeliyê yê Gimgimê li nik Mela Muştâq dixwîne. Her wesa li def Mela ‘Ebdullahê Cindî û Mela Se’du’llahê Gewre jî xwendina xwe kiriye. Her di vî biwarî de hindek ji dersa kitêba *Mentiqê Husemkatî* li gundê Toraqa Milazgirê li def Mela Îsivê Qemê dixwîne û çenda dî jî li gundê Gulçîmenê li ba Mela Îbrahîmê Gulçîmenê (Exdad) dixwîne. Mela ‘Eladîn di sala 1964an de dizewice (Kopî, 2013: 10-11). Mela ‘Eladîn di sala 1964an de li ba Mela Îbrahîm kitêbên *We’de* û *Îstîfereyê* dixwîne. Paşê berê xwe dide Tendûreka Milazgirê û li def Mela Zahirê Tendûrekî dersa *‘Ilmê Munazereyê* bi tevî *Haşîyan* û *Şerhûl-Şemsiyyeyê* dibîne. Piştî wefata Mela Zahirî di Kanûna sala 1965an de Mela ‘Eladîn diçe gundê Dignûga Milazgirê li ber destê Seydayê Mela Sadiq kitêbên *Muxteser* û *Cemu’l-Cewami’ê* dixwîne û sala dîtîrê vedigere bo gundê xwe û di heman salê de dibe melayê diyanetê li gundê Xoşgeliyê ku paşê pazdeh salan li wî gundî melatîyê dike û dersê dide feqîyan. Paşê ji sala 1982an heta 1994an li gundê Rustengedûkê melatîyê dike (Aykaç, 2020: 310).

Mela ‘Eladîn bi salan li Elmanyayê di mizgeftêka fexrî de melatîyê dike û îcazeya xwe ya ilmî ji Mela Sadiq Ozturkî digire. Her paşê nêzikî panzdeh salan li welatên Ewrûpayê yê wekî

Norwêç, Hollanda, Frensa, Belçîkayê melatiya xwe berdewam dike û vedigere welêt. Niha Mela ‘Eladîn li Kopê dimîne û bi xwendin, wergêran û nivîsîna berhemên bi kurdî re mijûl e (Ertaş, 01/03/2023).

2.1. Berhemên Mela Eladînê Kopî

Mela ‘Eladîn di feqîtiya xwe de helbest nivîsîna ku di helbestên xwe de arûz jî bi kar aniye wekî şa‘îrek ji edebiyata klasîk. Şairî her çend birek helbest nivîsandibin jî di serdema destpêka melatiya xwe de hemî dirandine (Ertaş, 01.03.2023). Bi her rengê heyî, Mela ‘Eladîn çar berhemên bi kurdî nivîsîna ku ji van *Rezê Jiyane* di sala 2013an de hatiye çapkirin, bes her sêyên dî hêj jî nehatine neşîrkirinê. *Rezê Jiyane* û berhema berbas *Jiyana Pîroz* menzûm in; Her du berhemên dî jî mensûr in.

Ji van *Rezê Jiyane* di sala 2013an de ji weşanxaneya Nûbiharê hem bi tîpên erebî hem jî tîpên latînî çap bûye. Pişka latînî 200; ya erebî 190 rûpel in û xwedî ferhengok e (Kopî, 2013). Pişt re du keşkûlên wî yê neçapkirî yê mensûr hene ku ji wan a yekem *Tûrê Derwêş* e. Di vê berhemê de çîrok, qewlik û meseleyên cur bi cur hene ku wekî berhevkarîyê bêyî ku bigere hema çî bihîstîbe nivîsiye. Keşkûla dî jî hindêk ji wergêranên çîrok û hikayetên pirtûka *Nushetu’l-Mecalis* e. Dûmahîkê jî her wekî tete zanîn ev berhema *Jiyana Pîroz* e ku niha li ber destê me ye. Wek amaje pê hatî dayîn siyereka menzûm e li ser jiyana Pêxemberî.

3. Jiyana Pîroz

Di vê berhemê de 36 helbestên mesnewî û qesîdeyek û murebbe‘ek û muxemmesek hene ku bi tevahî jî 39 helbestan pêk hatiye. Mela ‘Eladînê Kopî ev berhem di demekê diyar de nenivîsiye, anku nivîsîna wê belavî maweyekê dirêj kiriye. Mela ‘Eladînê Kopî di nivîsîna vê siyerê de ji jêderên cuda sûd wergirtiye. Helbet nivîser di nivîsînên xwe de her çend pabendê çend jêderan jî bin di rastiya xwe de jêderên binhişî ên paşxaneya mirovî jî xwudanê kartêkirineka mezin in. Li dû gotinên Mela ‘Eladînî, wî bi daneheva xwe ya salane ev berhem nivîsiye, ne ku rasterast berhemek daniye ber xwe û jê îstifade kiriye (Ertaş, 05/04/2023). Li dû lêkolînan bes em dikarin çend jêderên sereke amaje pê bidin. Li gor zanyariyên li ber destan û dabînkirina Mela ‘Eladînî, bo nivîsîna vê berhemê sûd ji *Nehcul-Enam* a Mela Xelîlê Sêrtî, *Mewlûd* a Melayê Bateyî, *Nuru’l-Ebsar* a Mumîn b. Hesên Eş-Şablencî wergirtiye. Her weha di dawîya berhema xwe de amaje pê daye ku ji berhemê *Welediya* di ‘ilmê munazirê de, *Haşîye* ya kitêba Mewlana Camî wergirtiye û Şerhuş-Şemsê sûd wergirtiye. Her wesa reng e ji çendîn berheman tesîr girtibe (Bnr. Pêvek).

3.1. Jiyana Pîroz ji layenê Ruxsarî ve

Ev berhem di deftereka piçûk de bi desxeta Mela ‘Eladînî bi xwe hatiye nivîsîn. Destxet zelal e û bi rehetî tê xwendin. Teqrîbî mezinahiya wê A5 e. Xêzik li ser defterê hene. Beyt carinan li ser hev carinan jî li ber kêleka hev hatine nivîsîn. Di her rûpelekê de hejmara wê rûpelê heye. Şairî naveroka berhemê jî li gor hejmara rûpelan amade kiriye. Bi tevahî jî 39 helbestan pêk hatiye û 175 rûpel in. Ev helbest bi pîvana kîteyî hatine nivîsîn, bes li gor wezna arûzê nehatiye nivîsîn. Nusxeyeka eslî bi desxeta Mela ‘Eladînî heye ku li cem wî ye di kitêbxaneya wî de û her weha fotokopiyeka wê destxetê jî li ber destê me heye (Bnr. Pêvek).

Her wekî li jorê jî hatî amajedan, di vê berhemê de 39 helbest hene. Mela 'Eladînê Kopî ev berhema xwe bi teşeyê mesnewiyê nivîsiye. Her wekî ji mesnewiyan tête zanîne her beyt di nav xwe de xwudan serwa ye, wate jê "aa, bb, cc, dd...". Mela 'Eladîn di vê mesnewiyê de beş bi beş şî'r nivîsandine û her yek ji wan jî xwudanê serenavekê ye ku bikaranîna serenavan di mesnewiyan de kême.

Her li dû destxeta li ber destan di hundirê vê mesnewiyê de du qesîde jî hene. Mela 'Eladînê Kopî di bin sernavê qesîdeya yekem de weha nivîsiye:

"Diyarkirina beşekî ji sifetên Xudê 20 [beyt in], şandina pêxember 30 [beyt in], nazilkirin û peyalkirina kitaban 40 [beyt in], miraca Resûlullah sellem 50 [beyt in], ehemmiyeta Qur'anê 60 [beyt in], cehd û xîreta Resûlê Xudê ji bo neşra di dîne Îslamê."

Ji vê beyanê em bi ser pişkên naveroka vê qesîdeyê dihilbin ku ka pêkhate û pişkên qesîdeyê çî ne. Her weha hejmarên beytên wan pişkan jî daye diyarkirin. Di warê cureyî de ev qesîde dikare wek ne't bê senifandin. Di heman babetê de qasîdeyek di jî heye li dawiya nusxeyê bi navê *Qesîdeya Ez li Dû 'ilmê Digerim*. Mela 'Eladîn ev qesîde bi bendên muxemmes nivîsiye. Mirov dişê vê cureya qesîdeyê wekî qesîdeya hizirî bi nav bike. Her li gel van murebbe'ekê cihê xwe di nav berhema Mela 'Eladînê de girtiye ku bi vî rengî ye:

*Em hatin vê cihanê
Evî serayê xanê
Bin banê asimanê
Ji bona îmtîhanê (r. 167)*

Her weha muxemmesekê cihê xwe di nav berhema Mela 'Eladînê de girtiye ku bi vî rengî ye:

*Ez li dû 'ilmê digirim li hemî gund û qura
Lew ji bo wî terkand mi dayik û xûşk û bira
Tihî bîrsîtî mêhvan in ji mi ra her roj bira
Tîm dibêjim hûn bi xêr hatin li ser çav û sera
Hûn ji bo min xweştir in zêde ji nazê dilbera (r. 174)*

Mela 'Eladînê cih daye çend helbestan di dawiya berhemê de. Ji van, di çaran de mexlesa xwe bi kar aniye bi navê 'Eladîn:

*Ev 'Eladîn e li şemûgehê dizare bende ye
Wî qebûl ke xwe huzûrê lew di rê da mande ye (r. 163)*

Mela 'Eladîn di hindek cihan de wateya peyvan diyar kiriye. Lewra me jî wek jêrenot nîşan da. Bo nimûne:

*Civîyan Qureyşî li şewirgehê
Çikandine panêr li ber dergêhê (r. 108)*

Mela 'Eladîn hizirî kiriye ku peyva "panêr"ê neyê famkirin, ji ber hindê hewcehî dîtiye ku wê peyvê li jêra rûpelê rave bike. Bo mînak: "Panêr: Bekçî, zêrevan." Her weha gelek peyvên di jî me bi xwe wateya wan di jêrenotê de diyar kiriye li ser daxwaza Mela 'Eladîn bêyî ku di destxetê de hatibin nîşandan.

Helbestvanên edebiyata klasîk ên sedsala bîstem û bîst û yekem anku bi taybetî jî piştî serdema Osmanî û wê de, hem ji layenê şiklî ve hem jî layenê naverokî ve serî li hindek guherînan dane. Wate jê, ji layê rûxsarî ve kartêkirin û emilandina wezna arûzê kêmbes li rûberê vê yekê bikaranîna pîvana heceyî her dimîne. Mela ‘Eladînê jî di helbestên xwe yên vê berhemê de wezna arûze neamilandiye bi tinê berê xwe daye pîvana heceyî.

3.2. Jiyana Pîroz ji layenê naverokê ve

Helbestvanên klasîk exleb di nivîsandinên berhemên xwe de egera nivîsandinê dinivîsin. Her gav xwe dispêrin egerekê, ka ji bo çî nivîsandine, armanc û niyaza xwe diyar dikin. Berî Mela ‘Eladîn dest bi helbestên xwe bike, merema nivîsandina xwe anku sebebê telîfa vê berhemê bi rengekê mensûr weha nivîsandiye:

“Dema ez vê berhema ku bi i‘tibar naveroka xwe pîroz e erzê hizûra we dikim hem bextiyarî hem jî xecalet his dikim. Lewra peyv sezayê(layiq) wateyê nîne. Lê ez çî bikim, me edebiyata zimanê xwe nexwendiyê. Nola erdekî kort mirov ji nû ve rake, cot bike. Bêguman şel (Girêk, gumtil, koma axê) û kesek (Xweliya hişk) tê de çêdibin. Bi tamamî hil nabe.”

Mela ‘Eladîn wekî edetî berî dest bi kitêbê bike navê Xwedê hildaye li gel hindek wesfên wî: “Bismîllahîrrehmanîrrehîm bi navê Xwudayê keremkar û perwerdekar”. Her paşê di destpêka berhemê de anku beytên yekem ên kitêbê bi vî rengî ne:

*Sername namê Ellah
Bi wî pîroz e wellah*

*Pirtûk bi wî digîhje
Ne ew be xêv û gêj e*

*Bi polekî nahêje
Bêsûd e xêrnerêj e*

*Ne navê wî be name
Demî ye bédewam e (r. 5)*

Her wekî ji destpêka her du helbestan diyar e destpêk bi navê Xwedê ye û eger navê Xwedê nebe ew tiştê kêmbes û xav e. Berhem bes bi wî digehe û heger ew nebe çî xêr û feyda wê nîne, berhem nakemil û her kêmbes e. Bi vî rengî dilsoziya wî ya li ser zimên xuya dibe. Her weha meremeka wî ya din jî ew e ku Mela ‘Eladînê Kopî di sebebê telîfa xwe de diyar dike ku jiyana me gelek ji jiyana Pêxemberî ya pîroz dûr e qet nebe bi vî rengî anku bi nivîsîna jiyana wî xwe nêzîkî wî bike, rêça wî bizane û bide zanîn:

*Bi vî karê belkî bibim nêzê wî
Jiyana ji wî dûr jîyanek qewî (r. 18)*

Gelek ayetên li ser pêrewiya Pêxemberî hene di Qur’anê de. Ev ayetên bi vî rengî qedir û giringiya babetê nîşan dane û berê musulmanan li Pêxemberî zindî hêlayîne. Musulmanan xwes-

tine Îslamiyetê li gorî usûla wê bi hemû rukn û erk û esasên wê bijîn. Her li ser vê yekê şair di helbesteka xwe de weha gotiye:

*Resûl e ji Rebbê me Pêxember e
Li rêya wî ê ku neçe ebter e (r. 39)*

Yek ji egerên nivîsîna siyera jî eşq û şewqa mezin a li rûber Pêxemberî ye ku bi kiryarên xwe, reftarên xwe û miameleyên di her qadê de li gel hemû cure mirovan bûye egera hejêkirinek mezin li beranber wî, heta muşrikan jî. Li hember vê hejêkirinê gelek ji dildarên vê rêkê xwestine di jiyana xwe de vê heskirina xwe bi rengekê birêjin. Her wekî Mela 'Eladîn dibêje:

*Evîna wî ew reng di qelbê mi da
Bi cih kî tu gavê nebe jê cuda (r. 42)*

Yek ji egerên dîtir ên nivîsandina berheman di rêka ayînî de taybet li ser babetê, li ser Pêxemberî wezîfedîtina pîroziya vê yekê ye di seranserê mêjûya Îslamî de. Şair û aliman wekî xizmet-guzariyeka di rêka ayînî de vê yekê wekî ferz dibînin zor caran û bi vî rengî han dayîne berhemên weha bidin û wezîfeya xwe pêk bînin û dilê xwe rihet bikin. Li gor vê biwarê her wekî Mela 'Eladîn dibêje "deyndar in tev musulman":

*Ji bo Resûlê zîşan
Deyndar in tev musulman (r. 66)*

Her wekî di Mela 'Eladîn berî dest bi helbestên xwe bike beytek ji *Gulistana Se'diyê Şîrazî* girtiye û li gor xwe adapteyî kurdî kiriye:

*Xêred neqşe ji me şûn ve bimîne
Ji bo jinê dewamdarî ku nîne (r. 4)*

Xaleka giring e, ev ne siyereka tam e; siyer ji jidayikbûna Pêxemberî dest pê dike heta serdema Medîneyê yan jî Hicretê. Qedir û giringiya Medîneyê tê behskirin bes jiyana Pêxemberî ya wê serdemê û rûdanên wî demî nayêne behskirin û berhem li wê derê bi dûmahî hatiye. Li dû pirsra me, Mela 'Eladîne Kopî egera vê yekê weha bersivand:

"Ê min nekarî, min got bila yekê din nîviya din binvîse. Êdî rojekê bila alimek rabe binvîse. Kitêba "Celaleyn" jî isa hatiye nivîsîn. Alimekî hebû navê wî Celal biye, wexta tefsîra Qur'anê nivîsiye, di nîviyê de wefat kiriye, çûye rehma Xwedê. Îca telebekî wî, navê wî jî Celal biye, ra-biye nîviya din jî tamam kiriye. Îja navê kitêbê daniye Tefsîra Celaleyn. Celaleyn yanî du Celal." (Ertaş, 05.04.2023).

Bi vê diyardeyê em tê digehin ku ev berhem jî li bendê ye ku rojekê bête tamamkin. Li gel vê yekê Mela 'Eladîn di hindê helbestên xwe de li pişt helbestê zanyariyên wekî mêjûya nivîsîna wê helbestê anku roj, heyy, sal û cihê helbest lê nivîsandî rave kiriye. Her wesa Mela 'Eladîne Kopî carinan jêderên xwe jî nîşan dane. Me jî ev agehî di qismê jêrenotan da nîşan da. Bo nimûne Mela 'Eladîn piştî helbesta "Qesîdeya Ez li Dû 'Îlmê Digerim" der bareyê wê de ev zanyarî belav kirine:

"Min vê qesîdeyê di sala 1965 Mîladî de li Gundê Tendurekê yê girêdayî bi navçeya Milazgir-

dê ve nivîsand. Min wê demê li bal seydayê birêz Mela Zahir dixwend. Min “Weledî” ya di ‘ilmê munazirê de ye, “Haşîya” kitaba Mewlana Camî di gel “Şerhu’ş-Şems” xwend. Xudê ruhê wî şad bike rûyê wî spî bike. Amîn.”

Mela ‘Eladîn di berhema xwe de cih daye hindê qisse û şîyan û mucîzeyên pêxemberan, alim û pêşengên ayîna Îslamê, edebiyatvan û şair û çîrokên gelêrî yên kurdan û kesayetên dîrokî. Lê mesele û çîroka wan nehatiye vegotin; bi tinê navê wan derbaz bûye.

Weke din nivîsandina şî‘rên klasîk çawa ku pêdivî bi zanîneka mezin a ilmî û dînî heye her bi heman rengî pêdivî bi zimanekî bihêz jî heye. Li dor vê yekê exleb gencîneya şa‘irên klasîk gelek kûr û berfireh e. Şa‘ir gelek caran ji bo ravekirina peyamekê an jî nîşandana hêz û şîyaneweriya xwe ya peyvên an jî ji bo lêkanîna serwayan serî li peyvên zimanê xwe yên resen ên kevn didin. Her weha zor caran peyvên erebî, îranî, tirkî û hwd jî bi kar diînin. Şairî jî bi rengê siruştî ev tişt kiriye. Wek nimûne:

Erebî: MUYESSER, ILMU’L-YEQÎN, ‘EYNU’L-YEQÎN, YA EYYUHE’L-MUDDESÎR...

Farisî: MUJDE, TEN, WELÎ, SEDA, AZERDE...

Tirkî: GÊNÎŞ, KÎŞÎ, YARIŞ, BARAJ, YAN...

Her li dor vê babetê wekî tê zanîn kurdî xwudanê gelek zaravayan e û di bin banê van zaravayan de xwudanê gelek devokan e. Şubhetê gelek helbestvanên klasîk ên kurdî Mela ‘Eladînê Kopî jî ji zarava û devokên cuda yên kurdî îstifade kiriye. Di vê çarçoveyê de ji ber ku Mela ‘Eladîn ji Serhedê ye bivê nevê devoka serhedî xwediyê giraniyeka mezin e di vê berhemê de. Her wesa devoka colemêrgê/bahdînî ku di edebiyata kurdî ya klasîk de xwudanê rabirdûyeka xurt e, cihê kartêkirina xwe di vê berhemê dîsa daye xuyakirin. Li gel van peyvên soranî, botanî û mêrdînî jî xuya dibin. Her wek:

Soranî: MINDAL, NIYE, KOH, BILÊ, KAT...

Serhedî: PÊÇÎ, ÇEWT, MOZEQIRTAN, QEHFE, MERIV, BIVE...

Bahdînî: BIRSÎ, WÊRÊ, SOTIN, KEFTIN, AMAN, DIKIT...

Botanî: TOV, HEVALA WÎ BÎ, XÎZ...

Mêrdînî: WILÔ, MÊZE, VEKETIN...

Her zêdetir, bi rengê giştî kronolojî xuya dibe di nav şî‘rên Mela ‘Eladînî de. Lê belê ev kronolojî li cihekê xirab bûye ku Mela ‘Eladîn berî behskirina jidayikbûna pêxemberî şî‘rek terxan kiriye bo danasîna kesayetiya pêxemberî ku eve jî wek mentiqî kronolojîyê xerab dike.

Her weha Mela ‘Eladînê bi tinê behsa jiyana Pêxemberî nekiriye di heman demê de şî‘r ji bo sehabî û şopgerên wî jî veqetandine. Bi taybetî çend şî‘r terxan kirine li ser sehabeyên wekî Hz. Bilal, Hz. ‘Emmar, Hz. Hemze, Hz. ‘Umer kurê Xettab û her weha yek ji şopgerên Pêxemberî yên sedsala bîstem Bedî‘uzzaman Seîdê Kurdî. Di heman biwarî de şî‘reka fabl a bi navê “Gur û Şivan” jî tê de derbaz dibe ku gur tê de diaxive. Reng e peyama wê yekê dide ku hemî alem Pêxemberî dinasin û îtaeta wî dikin.

Her weha di helbestên Mela ‘Eladînî de pend û şîret zêde derdikevin pêş. Ji van *De hişyar be, Nefsê lê, Ji xew rabe, Heyat îmtihan e û Ez li dû ‘ilmê digirim* di eslê xwe de şî‘rên pendname ne. Pêşçav e ku şîretên wî exleb li ser olê ne di vê berhemê de. Li gel vê yekê şî‘ra *Nefsê lê* Mela ‘Eladînî bi rengê qesîdeyê nivîsiye.

Mela 'Eladînê Kopî di helbesteka xwe de Pêxember ji layenê şikil û şemalî ve teswîr kiriye. Li gor teswîra wî Pêxember yekê paqij û rûzelal û girover û di bejneka normal de ye. Çavêt wî reş, rengê wî ismer, biriyên wî kevan bûn. Bijangên wî dirêj, difna wî pîjîn dengê wî zîz bû. Ser û rihên wî reş bi tevahî dozdeh tayên spî lê hebûn:

*Digot ew yekî rûzelal û binûr
Şemala rûyê wî xwuya bû ji dûr*

Serê wî girover ne gir bû ne hûr
Wucûda wî normal ne jar ne sitûr

Ne reş bû sipî sorekê esmerî
Ewî çavbelek bûn kevan bû birî

*Bijangê wî hişk û dirêj û temîz
Ewî difnê pîjîn bû dengê wî zîz*

*Rihê wî siyah bû sitûyê wî zîv
Eniya wî gênîş zelaltir ji hîv*

*Muyên wî ne gungilî ne ta bi ta
Ser û rih bi gîştî sipî nozde ta (r. 128)*

Li gor lidûçûnên me em di wê hizirê de ne ku her wekî Mela 'Eladîn berhema *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî xwendiyê, maye di bin tesîra wê de di hindek waran de. Di çend cihan de îqîbas hatiye kirin an jî tesîr jê hatiye wergirtin. Bo nimûne behskirina şikl û şemalê Pêxemberî bi heman rengî di berhema Mela Xelîlê Sêrtî de bi vî rengî derbaz dibe:

*"Li wî qametek mu'tedil bû letîf
Ne kurt û dirêj û ne zexm û zeîf*

*Ne reş bû, sipî-sorekî esmerî
Mudewwer bû wech û rihên enwerî*

*Ewî çav û burhê mukehhel hebûn
Ji deh tayan şeyba wî neh zêde bûn*

*Bi roj û şev, hem li pêş û li paş
Wekî yek didî, haşe înkâr haş!" (Kaya, 1988: 11)*

Encam

Wekî serencam, tête dîtî ku Mela 'Eladînê Kopî zimanhez û peyrewekê mezin ê kurdî ye ku di berhemên wî de ev yek eşkera ye. Mela 'Eladînê Kopî yek ji şa'irên vê dawiyê yê edebiyata kurdî ye. Mela 'Eladîn li ber destê gelek melayên xwudanme'lûmat tehsîla xwe kiriye, eve jî bûye

egera ilmekê bilind di jiyana wî de ku îro berhemana bide. Çend berhemên Mela ‘Eladînê Kopî yên çapkîrî û neçapkîrî hene ku yek ji wan jî mijara vê gotarê bû.

Ev berhem siyereka menzûm e bi navê *Jiyana Pîroz*. Wek ji navê siyerê jî têtê nasîn li ser jiyana pêxemberî hatiye nivîsîn. Li gel Pêxemberî cih daye xanima wî hindêk sehabî û aliman jî. Ji xeynî Pêxemberî perçeyên piçûk jî jiyana kesayetên di jî hene. Diyardeya mezin ew e ku Mela ‘Eladînê heta serdema Medîneyê nivîsiye. Wate jê, jidayikbûna Resûlî heta serdema Mekkeyê nivîsiye; li rûber vê yekê serdema Medîneyê nenivîsiye anku berhemeka netemamkirî ye. Mela ‘Eladînê daye diyarkirin ku bila kesekê di yê zana rabe û ji cihê mayî dest pê bike berhemê temam bike wekî berhema *Tefsîra Celaleyn*. Her wekî hatî nîşandayîn Mela ‘Eladînê Kopî nivîsandina vê berhemê bi du sebebên girê daye. Ya pêşîkê ku di destpêkê de bi rengekê mensûr nivîsiye, me kurdan edebiyata xwe nexwendiyê, lewma edebiyata me bêxwedî maye mîna erdekê kort û nehil-kirî. Merema wî ya duyem jî xwenêzikkirina Resûlê Xwedê ye bi nivîsîna berhemeka bi vî rengî.

Şairî di vê berhema xwe de cih daye 39 helbestan. Ji van 36 mesnewî ne, yek qesîde ye, yek murebe’ û yek muxemmes e. Hêjayî gotinê ye ku Mela ‘Eladîn ji bo peyvên kêmnas û dijar jêrenot bi kar aniye. Zanyariyên nivîsîna mejûyî yên helbestan diyar kiriye yên wekî roj û heyv û sal û cihê helbest lê nivîsî. Mirov bi giştî dikare bêje kronolojiyek di berhemê de xuya dibe.

Her wekî berhema wî *Rezê Jiyane* di vê berhemê de jî pend û şîret xwe didin der. Her çiqas şairî behs nekiribe jî navê rûdan û kesayetên giring ên Îslamî û kurdî tê de derbaz dibin. Li gel vê yekê hikayetek bi rengê fablê tê de heye ku berhemê dewlemend dike. Weke din yek ji xalên giring ew e ku şairî qismek veqetandiye bo şekil û şemalê Pêxemberî.


Mela ‘Eladîn sereray peyvên erebî, farisî û tirkî zimanekê sivik, zelal û fesîh bi kar aniye. Şair gelek ji zimanê xwe hes kiriye û xwestiye bi zimanê xwe feydeyekê bigehine edebiyata xwe. Her weha bikaranîna peyvên ji diyalekt û devokên kurdî yên cuda, nîşaneya hêza qelesa wî û helbestvaniya sedsala bîstem ya edebiyata kurdî ya klasîk e. Mela ‘Eladîn her çend di berhema xwe *Rezê Jiyane* de wezna arûzê bi kar anîbe jî di vê berhema xwe de bi tinê wezna kîteyî bi kar aniye. Mela ‘Eladînê Kopî bi navê *‘Eladîn* mexlesa xwe di çar helbestên dûmahîkê de bi kar aniye. Ji van diyardeyan tê xuyanê ku Mela ‘Eladîn rasterast taybetmendiyên şa‘irên sedsala bîstem ên edebiyata kurdî ya klasîk dide.


Bi xêra vê xebatê berhemeka nû di edebiyata kurdî ya klasîk de cihê xwe girt. Di biwarê dînî de di nav berhemên siyerên menzûm de berhemeka nû di lîteratura kurdî de zêde bû. Li gel vê siyerê hejmarê siyerên kurdî yên tespîtkirî bûne sed û çil û yek.

Çavkanî


- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2020, Aralık). *Gulzara Şêx Tahirê Şoşî: Mesnewîyeke Xweser a Edebîyata Kurdî ya Klasîk û Taybetiyên Wê yên Avahîya Derekî*. e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, 12(4), 1506-1534.
- Ak, M. (2019). *Şair ve Peygamber - Navt Geleneğinde Hz. Peygamber İmgesi*. Stenbol: Weşanên Ketebe.
- Apak, A. (2020). *Hadis-Siyer İlişkisi ve Hadisin Siyere Kaynaklığı Üzerine Değerlendirmeler*. Siyer Araştırmaları(7), 63-74.
- Aykaç, Y. (2020). *Mela ‘Eladîne Kopî û Berhema Wî ya “Dîwan-Rezê Jiyane”*. Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 111-122.
- Aykaç, Y. (2023). *Mecme’a Xezelatêd Şu’erayêd Kurmancan ji Koleksiyona Aleksandre Jaba*. Wan: Peywend.
- Bişaroğlu, S. (2022). *Cengnameyeke Hezretî Elî: “Gezwetu Huneyn” a Mela Yûnisê Alîkî*. Mardîn: Zanîngeha Mardin Artuklu.
- Ertaş, H. (01.03.2023 û 04.05.2023) Mulaqat bi Mela ‘Eladîne Kopî re. (Bi rêya telefonê).
- Ertekin, M. Z. (2022). *Kürtçe Siyer Yazıcılığı*. Stenbol: Siyer Akademi.
- Eser, M. (2008). *Eseri Günümüze Ulaşan İlk Müellifi İbn İshak’ın Güvenilirliği*. İstem(13), 261-280.
- Fayda, M. (2009). *Siyer ve Meğazi*. TDV İslam Ansiklopedisi, 37, 319-324.
- Kaya, Z. (1988). *Mela Xelîlê Sêrtî Nehcu’l-Enam*. Stockholm: Weşanên Kurdistan.
- M. Huseyn Êsî & M. Se’îd Girdarî & M. Muhemmed Bêrkevanî. (2014). *Wergera Maneya Qur’anê Pîroz Ser Zimanê Kurdî* (Cilt 4). Stenbol: Şura Yayınları.
- Mela ‘Eladîne Kopî. (2013). *Rezê Jiyane*. Stenbol: Nûbihar.
- Mela ‘Eladîne Kopî. (bê dîrok). *Jiyana Pîroz*. Destnivîs. Ji kitêbxaneya taybet a Mela ‘Eladîne Kopî.
- Öz, Ş. (2006). *İlk Siyer Kaynakları ve Müellifler*. Enqere: Zanîngeha Enqereyê Entitûya Zanîstên Civakî.
- Özdemir, M. (2007). *Siyer Yazıcılığı Üzerine*. Mîlel ve Nihal İnanç Kultur ve Mitoloji Dergisi, 4(3), 129-162.
- Sönmez, N. (2018). *Tehlîla Nehcu’l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî*. Bingol Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 4(7), 67-85.
- Şalul, K. (2019). *Siyer Usûlü*. Stenbol: Weşanên Ensar.
- Yaman, A. (2009). *Siyer*. TDV İslam Ansiklopedisi, 37, 316-319.
- Yeniterzi, E. (2015). *Türk Edebiyatında Na’îlar (Antoloji)* (Cilt 2). Enqere: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- Yıldız, A. (2021). *Qewlê Hespê Reş*. Wan: Peywend.

Pêvek





Destpêka "Jiyana Piroz" bi destnivîsa Mela 'Eladinê Kopî.





Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 7

e-ISSN 2717-8315

DOI: 10.55118/kurdiyat.1284923

Rûpel/Sayfa Page: 27-43



Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Geliş Tarihi/Received: 18.04.2023
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/:
05.06.2023
Nurettin Ertekin, Dr., Hakkari Üniversitesi.
nurettin.ertekin@hotmail.com
ORCID: 0000-0003-2744-0447

Atf: Ertekin. N. (2023). "Hêmaya Dîrokê di
Helbesta Tîrêj de", Kurdiyât, 7, 27-43.
Citation: Ertekin. N. (2023). "Historical
Elements in Tîrêj Poetry", Kurdiyât, 7, 27-43

HÊMAYA DÎROKÊ DI HELBESTA TÎRÊJ DE

Nurettin ERTEKİN

Kurte

Wêje, rewîşt, sinc, wicdan û hizra hevpar ya civakê bi hêza hunerê derdixe holê. Dîrok, rabirdû û serpêhatiyên civakê tîne ziman. Bi sedema her du zanist bi civakê re têkildar in, bivê nevê têkiliyek bi hev re ava kirine. Edebiyat û bi taybetî jî helbest ji bo zindî hiştina hafîzeyê dîrokî û civakî weke amûrek hatiye bikaranîn. Tîrêj, yek ji wan helbestvanan e ku di helbestên xwe de giringî daye dîrokê. Di vê xebatê de em ê li ser têkiliya di navbera helbest û dîrokê de rawestî û di helbestên Tîrêj de rengvedana dîrokê vekolînin. Di encamê de em ê bibînin ku Tîrêj bi helbestên mijardîrok bi teswîra rûdanên dîrokî bi serpêhatî û maddeya tarîxê xwestîye dîrokê ragihîne.

Peyvên Sereke: Wêjeya kurdî, Tîrêj, Helbest, Dîrok, Têkiliya wêje û dîrokê.

Tîrêj Şiirinde Tarihsel İmgeler

Özet

Edebiyat, toplumun ahlak ve vicdan gibi ortak duygu ve düşüncelerini sanat yolu ile dile getirir. Tarih, toplumun geçmişini ve toplumun başına gelen olayları konu edinir. Edebiyat ve tarih sosyal ve beşeri birer bilim dalı olmaları hasebiyle aralarında güçlü bir ilişki bulunmaktadır. Edebiyat ve özellikle şiir, tarihi ve toplumsal hafızayı canlı tutmak için bir araç olarak kullanmıştır. Kürt edebiyatının önde gelen şairlerinden Tîrêj, şiirlerinde tarihi fazlaca konu edinen şairlerinden birisidir. Bu çalışmada tarih ve edebiyat ilişkisine değinilecek ve Tîrêj'in şiirlerinde tarihin nasıl yer aldığı irdelenecektir. Sonuç olarak Tîrêj'in konusu tarih olan şiirleri ile tarihi olayları tasvir eden şiirleri ile dastanımsı şiirleri ve tarih maddesi ile tarih ve tarihi olayları aktarmak istediği görülecektir.

Anahtar Kelimeler: Kürt Edebiyatı, Tîrêj, Şiir, Tarih, Şiir ve tarih ilişkisi.

Historical Images in Tîrêj Poetry

Abstract

Literature is an artistic expression of common emotions and ideas of the society, such as morality and conscience, through art. History is the narrative of the past events in a society. There is a strong correlation between literature and history since they are both humanities. Literature and especially the history of poetry have been used as a tool to keep the social memory alive. One of the leading poets in Kurdish literature, Tîrêj employed several historical themes in his poetry. The present study aimed to discuss the correlation between history and literature and the historical content in Tîrêj's poetry. Thus, it aimed to demonstrate that poetry plays a key role in the vitality of social memory, employs history for this purpose, and Tîrêj constructed his poetry based on this correlation.

Keywords: Kurdish literature, Tîrêj, Poetry, Historical elements, Correlation between poetry and history.

Destpêk

Hemû zanist, pir an hindik bi zanistên din re têkildar in. Wek hemû zanistan wêjeyê jî bi hin zanistan re têkilî ava kiriye. Wêje, bi taybet bi zanistên civakî yên wekî; erdnîgarî, felsefe, civaknasî, derûnnasî û dîrokê re peywendîdar e (Yıldız, 2017: 119). Ji van zanistan têkiliyeye gelek bihêz di navbera metnên edebî û dîrokî de heye. Ji ber vê têkiliyê dibe metnekî dîrokî di heman demê de metnekî edebî be û metnekî edebî jî bibe metnekî dîrokî. Wek mînak *Tarîxa Beyheqî*, herçend bi navê xwe berhemeke dîrokî be, di heman demê de berhemeke edebî ye jî (Bethaî, 1381: 173). Têkiliya wêje û dîrokê bi du awayan xwe dide xuyakirin. Yek, ew metnên edebî ku wek belgeyeyeke dîrokî îro li bendê şîroveyê ne. Duyem, ew metnên edebî yên mijara wan raborî ye û ji teref kesên dema me ve tîrê nivîsîn (Günyüz, 2010: 67). Helbestek, metneke edebî ye û di heman demê de belgeyek resen e ji bo dîroka dema xwe û berîya xwe.

Tîrêj, yek ji wan helbestvanên edebiyata kurdî ye ku di helbestên xwe de zêde cih daye hêmaya dîrokê. Em dikarin bi asanî bibêjin ku Tîrêj helbestên xwe bi hêmanên dîrokê dagirtîye. Kesek dikare dîwanên Tîrêj weke berhemên dîrokî jî bihesibîne û ji wan sûd werbigire.

Di warê têkiliya di navbera wêje û dîrokê de di edebîya kurdî de kêr xebat tîrê ber çavan. Xebata herî berbiçav bi navê *Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn de* ya Ibrahîm Ibrahîm e (Ibrahîm, 2018). Her weha di malperên medya civakî de du nivîsên kurt hatin dîtin. Yek ji teref Kamran Simo Hedili bi navê *Wêje û Dîrokê ye*, (Hedili, 2016) ya duyem jî ji teref Lokman Polat hatiye nivîsîn û sernavê nivîsê *Edebiyat û Dîrok* e (Polat, 2019). Vê dawiyê jî bi navê *Şahnameya Kurdan Civîna Nemiran* berhemeke nû ya Mela Ehmedê Palo (2022: 37-55) derket ku di pêşgotina wê de amadekarên wê kitêbê behsa têkiliya dîrok, edebiyat û mîtolojiyê kirine. Hem di der barê Tîrêj de û hem di der barê têkilîya wêje û dîrokê di helbestên Tîrêj de tunebûna xebatan bûye sedema vê lêkolînê. Di vê lêkolînê der barê jiyana, berhem û poetîkaya helbestên Tîrêj de agahî dê tîrê dayîn û rengvedana dîrokê di helbestên Tîrêj de tê nirxandin.

Ev xebat ji destpêkek, çar beş û encamê pêk tê. Di beşa yekem de peywendîya di navbera wêje û dîrokê de hatiye nirxandin.¹ Di beşa duyem de li ser kurtejiyana Tîrêj, berhem û poetîka helbestên wî hatiye sekinîn. Di beşa sêyem de dîrok di helbestên Tîrêj de û di beşa çarem de dabeşkirina dîrokê di helbestên Tîrêj de hatiye nirxandin. Di encamê de hate dîtin ku Tîrêj ji bo dîrok û rûdanên dîrokî ragihîne ji çend şeweyên ciyawaz sûd wergirtiye.

1. Wêje û Dîrok

Li gorî raborîya dîroka berheman, peywendîya di navbera wêje û dîrokê de bi du awayan tîrê dîtin ku yek jê, wêje di berhemên pexşan û menzûm yên dîrokî de; ya duyem, dîrok di berhemên wêjeyî de ye.

1.1. Wêje di Berhemên Dîrokî de

Di demên berê de têkiliya dîroknasan û rêvebirên dewletan gelek xurt bûye. Ev têkilî weke patronajê hatiye binavkirin. Dîroknasan bi destûra wan, jiyana siltan, hikumdar, mîr, padîşah û

1 Wêje û bi taybetî helbest di ragihandina dîrokê de ji bo avakirina hafizeya civakî û bi avakirina hafizeyek civakî ragihandina hizrên neteweperwerî roleke mezin daye ser milên xwe. Me di vê xebatê de xwest ku em bizanibin Tîrêj bi çi şeweyê dîrok di helbesta xwe de bi cih kiriye. Ji ber vê em ê nekevin nava mijara hafizeya civakî û hizrên neteweperwerîyê.

hwd. şerên wan û agahiyên dema wan ji xwe re kirine mijar. Bi sedema ku di bin bandora patronajê de mane jiyana gel di wan berhemana de xuya nabe. Bi vê sedemê berhemên bi vî rengî ji bo famkirina dîroka gelan û agahiyên der barê rewşa civakî, çandî, aborî û siyasî bi tena serê xwe nabin çavkaniyên sereke, pêdivî bi hin berhemên din jî hene ku dîroka gelan bi rastî bê famkirin. Di pergala patronajê de nivîskaran çend peywir bi hev re pêk dianîn. Ji bo pêkanîna van peywiran pêdivîya wan bi gelek zanistan hebû ku yek ji wan zanistan jî wêje bû. Bi vê sedemê çî dema ku dîrokna dîroka dema xwe dinivîsand ji hemû hêza xwe ya edebî sîd werdigirtin (Amûzîşî, 1396: 97). Berhemên wan dibûn terkîba dîrok û wêjeyê, ango berhemên xwe yên dîrokî bi wêjevanî dianîn holê. Nivîskaran di van berhemana de ji ayetên Qur'ana Pîroz, ji hedîsên Cenabê Peyamber, helbest, hîkaye û biwêjan sîd werdigirtin û berhemên xwe bi wan dixemilandin. Ji ber hindê berhemên ku bi vî rengî hatine nivîsîn hem ji bo dîrokna û hem ji bo wêjenasan giring in. Di edebiyata farsî de wergera *Tarîxa Teberî*, *Tarîxa Beyheqî*, *Tarîxa Cihanguşa* mînakên berhemên bi vî rengî ne (Munferd, 1372: 25). Di edebiyata kurdî de berhemên dîrokî ku bi vê şewazê hatibin nivîsîn li gorî çavkaniyên berdest nînin.²

Nivîskarên dîrokê çawa ku bi pexşan berhem nivîsandine, hin caran berhemên xwe bi nezm jî anîne holê. Bi sedema ku berhemên menzûm hîn zêdetir tî jiberkirin, di hişê mirovan de mûsikiyekê dihêlin, di nav gel de bêtir tî pejrandin. Di heman demê de helbestvan ji bo hêza xwe ya helbestvanîyê derbixwe holê bi nezm berhemên dîrokî nivîsandine (Amûzîşî, 1396: 98). Ev kevneşopî di wêjeya gelek gelan de tê dîtin. *Şehnameya Firdewsî* (w. 411/1020) di edebiyata farîsan de mînak e ji bo vê cureyê. Ji farîsan bêtir Moxolîyan ji vê cureyê hez kirine. Bi taybet di dema hukûmetên Tîmûrî, Qecerî û Sefewîyan de ev cure berhemên dîrokî gelek di rewacê de bûne. *Zerfername* ya Mustewfî (w.740/1340), *Tîmûrname* ya Hatîfê Camî (w. 927/1521), *Şehnameê Sadiqî* ya Sadiq Biyek Efsar (945-1018) û *Şehînsahname* ya Fetih'elî Xan Seba (w. 1238/1823) çend mînakên vê cureyê ne (Perîsa&Tarî, 1396: 50). Mîmkun e her du berhemên Homeros; *Ilyada* ve *Odyseia* di vê kategoriyê de bîr xandin.

Di edebiyata kurdî de li gorî jêderên berdest *Dîwana Xelîlî* yekem berhema serbixwe û menzûm e ku tarîxa kurdan kiriye mijara xwe (Xelîlî, Destxet). Divê bê zanîn ku ev berhem ne kevn e, di serdema me de hatiye nivîsandin û berhemeke kurt e. Di edebiyata kurdî de *Qewlê Newala Sîsebanê* (Demir, 2012), *Borê Qer* (Yıldız, 2015), *Kela Dimdimê* (Celîl, 2001), *Zembîlfroş*, *Şêxê Sen'an*, *Bersîsê 'Abid* (Sadînî, 2000) dikarin weke mînakên berhemên bi vî cureyê bîr hesabandin.³

Hin berhem her çend rasterast ne berhemên dîrokî bin jî, bi naveroka xwe hin agahiyên dîrokî didin destê xwîneran. Di van berhemana de rewşa gel a siyasî û civakî, hizr û helwesta serokê dewletê derdikeve holê. Bi taybet berhemên bi *Siyasetname* û *Pendname* hatine binavkirin ev cure berhem in. *Siyasetname* ya Nîzâmu'l-Mulkê Tûsî (w. 485/1092) û *Qabûsname* ya Keykawûs b. Îskender (w. 480/1087) mînak in ji bo vê rewşê (Perîsa&Tarî, 1396: 51).

2 Em dikarin behsa van berhemana bikin: *Şerefname* (Bedlîsî, 1998), *Siyerû'l-Ekrad* ku di derbarê kurdên Baban û Erdelanê de ye bi zîmanê farsî ye (el-Babanî, 2019), *Dîroka Nijada Şêrwan* ku di derbarê mîrên Şêrwanê de ye bi zîmanê 'erebî ye (Budaq, 2004).

3 *Mîrnameya Hekarîyan* ku di derbarê mîrên Hekarîyan de hatiye nivîsîn nezm be jî bi farsî ye. Ji ber vê me weke berhema yekem nehesiband (Yazıcı, 2022).

Di edebiyata kurdî de berhemên serbixwe ji cûreyên siyasetnameyan nayên dîtin li gorî jêderan. Lê di van salên dawî de cûreyên pendnameyan derdikevin holê. *Şîretname* ya Zeynel Abidîne Arîkele mînak e ji bo pendnameyan (Arîkele, 2016). Belkî em dikarin *Guldan* û *Lalezar* a Mela Huznî Hezîn ji cûreyê pendnameyan bihesibînin (Ertekin, 2016: 66).

1.2. Dîrok di Berhemên Edebî de

Helbest, ji bo dîrokê û dîroknasan çavkaniyeke giring e. Divê dema dîroknasek li ser dîroka gel bixebite helbestên di wê demê de hatine nivîsîn di ber çavan re derbaz bike. Lewra, helbest bi hemû teşeyên xwe; - bes em dikarin xezelan ji nav derxin- mesnewî, qesîde, çarîn û bend çavkanî ne bo rewşa siyasî, civakî, aborî ya dema xwe. Bi taybetî qesîdeyên ku pesnên sultan, mîr, beg û paşayan tînin ziman, mersîyeyên li ser kesayetên bêtir giring in. Lê divê bê gotin, qesîde ne ji bo pesnên sultan tenê hatine gotin, qesîdeyên ku rewşa civakê rave dikin jî ne kêman in. Qesîdeya Ewheduddîn Enwerê Ebiyûrdî (w.585/1189) ya bi navê *Nameê Ehlê Xorasan* di tarîxa edebiyata farisan de gelek bi navûdeng e (Amûzişî, 1396: 101). Di edebiyata kurdî de jî, di dîwanên helbestvanan de şopên dîrokê xuya dikin. Helbestvanên kurd jî di helbestên xwe de rewşa civakê anîne ziman. Di dîwana Mela 'Eladîne Kopî, Mela 'Elî 'İlmî, Seyid 'Eliyê Findikî, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj de şopa dîrokê û rewşa civakê bi asanî tê dîtin.

Ji cûreyên edebî *nesebname* jî jêder in ji bo dîrokê. *Nesebname*, der barê malbatekê de an der barê kesekî ku bi regekî di dîrokê de cihekî taybetî ji xwe re veqatandiye tîne nivîsandin (Amûzişî, 1396: 107). Di rûdanên dîrokî de rola giring li ser milê mirovan e. Ji ber hindî mirovek çawa di guherandina dîrokê de cihekî mezin digire, her weha ji bo naskirina wî kesî pêdivîya dîrokê bi naskirina binemala wî kesî jî heye. *Nesebname*, ji bo vê pêdiviyê hatine nivîsandin. Di edebiyata kurdî de bi taybetî, di mewlûdan de beşek hatiye terxankirin ji bo binemala Cenabê Peyamber. Di vê beşê de binemala Cenabê Peyamber heta bîst û yek bavan hatiye nivîsandin (Bateyî, 2015: 11-12). Her weha wek berhemek serbixwe ji teref Mela Suleymanê Torî, *Dara Malbata Pêxemberan û Ehlê Beyta Nebî* (Torî, 2018) berhemek hatiye nivîsandin. Di warê kesan de jî Mela Husnî Hezîn li ser binemala xwe berhemek serbixwe nivîsiye. Her çend ku berhema Mela Huznî Hezîn di vê serdemê de be jî di çarçoveya mijara de me giringiya wê heye di dîroka edebiyata kurdî de.

Jiyanname, cûreyek ji berhemên edebî ye ku di wan de jiyana hin kesên dîrokî tîne nivîsîn. Di edebiyata kurdî de bi taybet hin helbestvanan wekî Cegerxwîn (Ibrahîm, 2016: 1) û Feqe Reşîd (Gemi, 2018: 130) di berhemên xwe de jiyana xwe nivîsandine.

Recmiyye, bi taybet li ser rûdana Kerbelayê û pakrewaniya Hezretî Huseyn hatine nivîsîn û di edebiyatê de wek cûreyek edebî cih dane wê. Di edebiyata kurdî de Şêx 'Ebdurrehman Aqtepi hem di berhema xwe *Rewdu'n-Ne'im* ê de (Aqtepi, 2016, 279-286) û hem di dîwana xwe de *recmiyye* nivîsiye (Aqtepi, 2002: 32-33).

2. Kurtejiyana Tîrêj

Tîrêj, di sala 1923yan de li gundê Nicîmê yê girêdayî bajarê Heskê hatiye dunyayê. Navê wî Nayif e. Navê bavê wî Heso, navê dayika wî Besê ye. Ji eşîra Bûblanan e. Di şeş saliya wî de, bavê wî koçî gundê Sêmitikê dîke û li vir bi cih û war dibin (Kaya, 1991: 84). Tîrêj li wê

derê li cem Mela Birahîmê Golî, dest bi xwendina Qur'anê dike û çend kitêbên dînî dixwîne. Di medreseyan de xwendina xwe didomîne û di dema xwendina medreseyê de dest bi nivîsînê dike. Ew, di sala 1937an de li bajarê Amûdê dest bi dibistanê dike. Pênc salan li dibistanê dixwîne. Lê ji ber mercên aborî xwendina xwe nedomandiye. Li Amûdê, têkiliyê bi helbestvanên mezin yên weke Cegerxwîn, Qedrî Can û Hesên Hişyar re datîne (Şero & Silêman, Bê dîrok: 94). Bi wan re xebatên niştimanperwerî dike û wek gelek ronakbîrên wê demê, Seydayê Tîrêj jî, di nava civata Xoybûnê de cihê xwe digire. Li gel nivîsandina helbest û çîrokan têkoşîneke ramiyarî jî dimeşîne. Ji sala 1948an heta 1952yan di partiya Komunîst ya Sûrîyê de kar dike (Lêkolîn, 2014: 5). Di sala 1952an de bi destê parastina dewleta Sûrî tê girtin û dîwanek jî helbestên wî yên nebelavbûyî tê talankirin. Piştî ku Tîrêj ji zindanê derdikeve demek pir dirêj di nav erebên Cibûran de xwe diparêze. Di sala 1973an de vedigere bajarê Heskê û li wir bi cih û war dibe. Seydayê Tîrêj jî sala 1973an ve li bajarê Heskê jiyaye heta roja 23ê Adara 2002an ku koça dawî kirîye (Zengî, 2004: 5).

Tîrêj li pey xwe pênc berhem hiştine. *Dîwana Xelat, Dîwana Zozan, Dîwana Cûdî, Serpê-hatîyên Kurdan* (1-2) û *Mewlûda Kurmancî* (Zengî, 2004: 14).

2.1 Poetîkaya Tîrêj

Tîrêj, poetîkaya helbestên xwe li ser avakirina hizreke dîrokî ava kiriye. Li ser rewşa civakê helbest honandîye, ji ber te' de û zulma li civakê hatiye kirin xwestiye gelî bi dîrokê hişyar bike. Wek ku ew dibêje her tim di nav gel de jiyaye û bi gel re rabûye û rûniştiye. Di şîna û şahiyana de her li kêleka gel bû ye. Bingeha helbesta xwe ji jiyana gel stendiye. Di hevpeyvînekê de ku bi wî re hatiye kirin, ew weha dibêje:

“Ez di nav civatên wan de rabûme. Ez bi rabûn û rûniştina wan re bûm. Ez bi dahol, zirne, kêf û eşqa wan re bûm. Ev ji min re bûn ‘ilm. Ev ‘ilmê min ji welatê min hatiye.... Ji ber ku ez di xweşî û şîna wan de bi wan re bûm. Min ji wê çaxê ve tiştê bidîta yan jî bibihîsta ji xwe re dinivîsand” (Kaya, 1991: 84-85).

Ji ber hindê helbesta xwe xistiye xizmeta gelê xwe. Her xwestiye xizmetekê ji milletê xwe re bike heta ku rih di bedena wî de hebe. Di helbesta xwe de vê daxwaza xwe weha tîne ziman.

Da ez di xebata milletê xwe d' herme gorê
Ma kê weke Tîrêj can di vê rê de reha kir? (T 351-3)⁴

Li gor fikr û ramanên Tîrêj, armanca sereke ji honandina helbestê xizmeta gel e. Ronahiya helbestê, bedewiya helbestê ew e ku pesnê welat tê de hebe. Di heman demê de helbest li gor hizra Tîrêj divê bîrewariyekê derxe holê û hişê mirovan bi vê bîrewariyê dagire. Helbet ev fikr û ramanên Tîrêj li dor tevgera sîyasî ya wê demê derketîye holê. Sînordarkirina naveroka helbestê tenê bi pesnê welat tengkirina edebîyatê ye ku tenê ji bo serdemekê belkî derbazdar be.

Ma rûmeta şî'rê çi ye?
Ned xizmeta millet de bî

4 Me hemû minakên helbestan ji berhema *Dîwan (Xelat-Zozan-Cûdî)* wergirtin. Hejmarên li dû malikan wek (T 55-10); hejmara yekem rûpelên berhemê nişan dide. Hejmara duwem jî hejmara malikan nişan dide. Eger helbest ji malikan pêk hatibe hejmara malikan, ji çarînan pêk hatibe hejmara çarînan û ji sê misrayan pêk hatibe, “muselles” be, hejmara musellesan nişan dide.

Ronahiya şî'rê çiyê?
Pesnê welat ku tê ne bî (T 334-1)

Tîrêj, di malikên jorîn de hizrên xwe yên der barê naveroka helbestê anîne ziman. Lê ev naveroka helbestê divê ji edebiyetê, ji şî'riyetê ne xalî be. Tîrêj, şî'riyet û edebiyetê weke cewher dînasîne.

Çi b'kim ji wê şî'ra rijî?
Danagre sewda û mejî
Derdê dil û can nakuji
Çaxê ko cewher tê nebî (T 334-2)

Li gor Tîrêj ji bo avakirina hafîza û bîrewariya civakê dîrok gelek giring e. Her gel û neteweyek li ser koka xwe didome, ku li gor hizra Tîrêj ev kok dîrok e. Ji ber hindê di helbestên xwe de her dîrok xistiye ber çavan. Bi vî rengî xwestiye hafîze û bîrewariyeke civakî li ser dîrokê ava bike. Di dawîya helbesteke xwe de vê mebesta xwe weha tîne ziman.

Ji dîroka welat ewî çend rûpel
Ji bona millet daye xwuyanîn (T 67-170)

3. Dîrok di Helbestên Tîrêj de

Rengvedanên dîrokê di şî'rên Tîrêj de bi çend awayan cih digirin. Hin helbest hatine terxankirin li ser kurtedîroka kurdan. Di hin helbestan de bi hunera telmîhê (bîranîn/tîlnîşan) dîrok hatiye amajekirin. Tîrêj, serpêhatî jî wek amrazekî bi kar aniye ji bo rengvedana dîrokê. Rasterast nivîsandina dîrokên hin rûdanan an salên wefata hin kesan di helbestên Tîrêj de tîne dîtîn. Di helbesteke Tîrêj de bi hesabgeriyê em digihêjin dîroka rûdanê. Ev her du xalên dawî ji taybetmendiyên edebiyata klasîk in ku di edebiyata klasîk de bi *maddeya tarîxê*⁵ tê nasîn.

Tîrêj, ji bo kurtedîroka kurdan du helbest nivîsîne. Tîrêj, di helbesta xwe ya bi navê *Tu Ji Tarîxê Bipirse* (T 481-1, 22) de kurtedîroka gelê kurd aniye ziman. Helbest ji 22 malikan pêk tê. Helbest, zêde neketiye nav gengaşîya dîrokê, bes navê hin dewlet û lehengan aniye ziman. Cih û warên ku kurd tê de jiyane destnîşan kiriye. Em dikarin bibêjin Tîrêj di vê helbestê de di bin bandora Cegerxwînî de maye. Lewra helbesteke Cegerxwîn bi navê "Kîme Ez" kurtedîroka kurdan tîne ziman (Cegerxwîn, 1992: 72). Di vê helbesta Cegerxwînî de dîroka serdema me xuya nabe, lê di helbesta Tîrêj de em dîroka serdema me jî dibînin.

Di helbesta bi navê *Şerefxan im* (T 309-1, 9) de her çend dîroka kevn hebe jî bi pîranî dîroka nûjen û hêmanên dîroka nûjen dide berçavan. Lazim e bê gotin kesayet û deverên di van helbestan de derbaz dibin bi hunera telmîhê cih girtine. Telmîh (bîranîn/tîlnîşan), hunereke ciwankariyê ye ku destnîşankirina rûdanekê yan kesayetekî dîrokî yan ayetek ji Qur'ana Pîroz an hedîseke Cenabê Peyamber e. (Şemîsa, 1375: 7) Hemû kesayet û navên deveran, bi sedema rola wan a dîrokî

5 Maddeya tarîxê ji wê helbestê ra tê gotin ku helbestvan di helbesta xwe de derbarê rûdanên balkêş û mijarên giring de dîrokê binivîse. Weke jîdayîkbûn û mirina kesayetên mezin, destpêka hukumdarîya siltan, wezîr, mîr û began, avakirina mizgeft, kax, pîr û karwanserayan, nivîsandina berhemana (Fesayî, 1380: 310) Divê mirov bibêje ku mimkun e ku maddeya tarîxê weke qit'e yan ruba'iyê helbesteke serbixwe be û dibe di dawîya helbestekê de cih bigire. Di helbestên Tîrêj de di dawîya helbestan de maddeya tarîxê cih girtiye.

hatine bîranîn. Her weha ew kesên bi vê hunera edebî hatine bîranîn lehengên rûdanên dîrokî ne û dever jî her wisa cih û warên rûdanên dîrokî ne.

Tîrêj, di hin helbestên xwe de rûdanên dîrokî teswîr dike. Helbesta bi navê *Cenga Selîbî* (T 324-1, 43) rûdana xaçperestan û Sultan Selaheddîn anîye ziman. Navê serokleşkerê xaçperestan, perîşanî û bêkêrbûna leşkerên Misriyan, alîkarîxwestina Selaheddînî ji Tûran Şah, wefata Selaheddînî, stratejiyên şerî, dîlbûniya serokleşkerê xaçperestan di malikên helbestê de tê dîtin. Tiştê balkêş, Tîrêj di helbestê de navê Selaheddîn bi *Salihê Eyyûbî* guhaztiye. Pêkan e ku ev jî ber zerûreta helbestê be.

Helbesta bi navê *Şîna Ser Şagirdê Amûdê* (T 122-1,25 li ser rûdaneke dişewat e. Ji malikên helbestê em têdigihêjin ku xwendekarên temen biçûk li bajarê Amûdê di sînemayê de bi agir, bi şewitandinê canê xwe ji dest dane. Di helbesta bi navê *Şîna Şehîdên Qeledizê* (T 126-1, 46) komkujîya xwendekarên zanîngeha Qeledizê û wêrankirana Qeledizê anîye ziman. Di helbesta bi navê *Helepçe* jî komkujîya Helepçeyê (T 355-1, 36) bi vê şêwazê hatiye honandin.

Di dîwana Tîrêj de sê *Serpêhatî* û *Geştnameyek* cih digire. Serpêhatiya yekem *Serpêhatiya Ciwan û Kejê* ye (T 15-1, 423). Ev serpêhatî bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. Mesnewiyêke dirêj e, ji 423 malikan pêk hatiye. Di vê mesnewiyê de evîna Ciwanê Amedî û Kejê bi lehengên dîroka kurdan û erdnîgariya kurdan hatiye honandin. *Serpêhatiya Sîpan û Perwîn* (T 229-1, 197) bi 197 malikan, serpêhatiya *Siyamed û Xecê* (T 390-1, 178) bi 178 malikan, serpêhatiya *Gerek li Kurdistanê* (T 53-1, 170) bi 170 malikan di dîwanê de bi heman mebestê, ji bo bîranîna lehengên dîroka kurdan cihê xwe girtine.

Tîrêj, di helbesteke xwe de dîrok veşartîye, xwestîye ku em hinekî bifikirin û dîrokê diyar bikin. Di helbesta bi navê *Şîna Rewşen Bedirxan* de Tîrêj weha dibêje:

Çi mêvanek bi temtêl e ji çîl salî we hev nedye

Memo û Zîn ghiştin hev di gorê de bi şêranî (T 524-6)

Ji malika jor diyar e ku Rewşen Bedirxan, piştî Celadet Bedirxan bi çîl salî wefat dike. Dema em bizanibin ku Celadet Bedirxan di sala 1951ê de wefat kiriye em çîl salî li ser vê dîrokê zêde bikin em ê fam bikin ku rewşen Bedirxan di sala 1991ê wefat kiriye.

4. Dabeşkirina Dîrokê di helbestên Tîrêj de

Em dikarin dîrokê bi sê serdeman dabeş bikin di helbestên Tîrêj de. Yek, dîroka kevn, dîroka beriya serdema Îslamê; duyem, dîroka serdema Îslamê; sêyem, dîroka nûjen, ji sedsala 19an û heta dema helbestvanî ye.

4.1 Dîroka Kevn

Mebest ji dîroka kevn, dîroka beriya Îslamê ye û hinek ji mîtolojîyê ye. Ew, ji afirandina gerdûnê dest pê dike heta destpêka Îslamê didome. Em dikarin vê dîrokê wek du beşan dabeş bikin; dîroka êlî, ku dîroka gelan, eşîran, neteweyan di xwe de digire û dîroka olî. Her du beş jî di helbestên Tîrêj de tên dîtin.

Di dîroka kevn ya êlî de; bi taybet navên dewletên kurdan û serokên wan dewletan tîna bibî-ranîn. Hin navên gernas û mêrxasên kurdan ku dîrok û çanda kurdan veguherandine û navên hin kesên dijminantiya kurdan kirine, dewletên wan ji holê rakirine yan bandoreke mezin li rewşa wan kirine jî tîna dîtin. Cih û warên ku kurd tê de jiyane, navên hin deveran jî di helbestan de bi dîrokê ve hatiye girêdan û hatine ziman.

4.1.1 Med

Tîrêj navê dewleta Med bi çend forman dibêje; Med, Medya, Medî, Mîdî.

Me got: Ey Amed, paytextê kurdan!

Ka *Mediyêd* mêr, ka dewleta wan? (T 55-10)

Welatê kovî û şêran

Welatê xêr û hem bêran

Welatê gol û avgêran

Cihê *Medya* û *Mîtana* (T 118-2)

Tu ji tarîxê bibirse ew dizane kî ne em

Em ji piştî qehreman in *Keyxesrewî Mîdî* me (T 481-1)

4.1.2 . Mîtan

Welatê gol û avgêran

Cihê *Medya* û *Mîtana* (T 118-2)

4.1.3 . Aşûr, Babîl, Hamûrabî, Kildanî

Hember *Aşûr* li *Babîl* paytextê dewletê

Destgîrê *Hemûrabî* şahê *Kildanî* me ez (T 481-2)

4.1.4 . Kawa û Dehaq

Tîrêj, wek hunera tezaad/dijberiyê du lehengên li dijî hev di heman malik yan çarînan de bi bîr tîne. Bi vî rengî hem lehengên kurdan dide nasîn û hem dijminên wan dide nasîn.

Manendê *Kawa* yê mezin

Îro bi çakûçê hesin

Dil perçe û par kir ji min

Ez wek *Dehaq* mam bê îlac (T 158-4)

Di heman demê de, di çarîna mînak de ji bo efsaneya *Kawa* û *Dehaq* em wêneyên rûdanê jî dibînin. «Çakûçê hesin» û «bêîlac» du bîranînên rûdanê ne. Di malika jêr de em têdigihjin ku *Kawa*, *Dehaq* kuştîye.

Kurê *Kawa* yê hesinkar serbilind û qehreman

Mêrkujê Dehhaqê zalim millete Arî ne em (T 481-5)

4.1.5 Rustem-Efrasiyab

Rengê *Rustem* hate meydanê bi şûr û gurz û rem
Dil ji ber tenha şikestî, wek şahê *Efrasiyab* (T 156-2)

Demek şer kirin, xwîn meşî rengê zab
Wekî cenga *Ristem* û *Efrasiyab* (T 17-11)

Di malikên jorîn de helbestvan bi xwînêr dide famkirin ku şerek di navbera Rustem û Efrasiyab de çê bûye (Bnr. Aykaç, 2022: 236-242).

4.1.6 Îskender- Dara

Îskender berî daye *Dara* bi kîn
Digel nîne camê digel dûrebîn (T 35-7)

Di malikên jêrîn de hin taybetiyên Dara hatine ziman. Bi van malikan em têdîgihjin ku Dara, kesekî mîrxas bûye, gelek leşkerên wî hebûne, li gelek deveran (helbestvan dibêje heft welat) hukum kiriye, lê paşê ji teref Îskender ve welatê Dara hatiye wêrankirin.

Piştî em gerîn li kaviî û wara
Paşê me gote: ma kanî *Dara*?
Ku ferman dikir li *heft welatan*
Gelo ma ka ew *ziyayê mara*
Ka ew qehreman, ka ew Keyûser?
Kanî ew sera, ew *kom û leşker*?
Salyan jêr dihat ji milkê Aşûr
Ji şahê Tûran, ji nik Îskender
Kanî ew heyam ew çax û dewran?
Heyf û mixabin, ji wan kes neman (T 55-2, 6)

Di dîroka kevn ya olî de hin kesayetên olî, bi taybetî peyamber û kesên li hember peyambaran rabûne û rûdanên olî tînin. Her weha, navên deverên ku rûdan li wir derbazbûne jî di malikan de cihê xwe girtine.

4.1.7 Suleyman Pêxember û Unsûrên li dor Wî

Hudhud, navê balindeyekî ye ku bi kurdî wek Silêmanê Dunikul, Dîksilêman tê naskirin. Hudhud, di rûdana navbera Hezretî Suleyman û Belqîzê de bi ragihandina peyaman cihekî taybet digire. Tirêj, di malikên ku em ê mînak bidin, her çend ku navê Suleyman Peyamber neanîbe zimên jî bi lehengên xwe dide famkirin ku rûdan di dema wî de derbaz bûye. Ev rûdan di Qur'ana Pîroz de di sûreya Naml (23) de derbaz dibe.

Ciwan gote ehlen gelek merheba
Kê *Hudhud* çi anî ji min r' te ji *Seba* (T 34-1)

Bigir mifte çerxa bîsata ji ba
Ziyaret ke *Belqîz* li şehrê *Seba* (T 34-3)

Belqîz î li ser textê *Seba* tu bi emr û ferman
Pertewa dil û can
Asef bi xwe me ku navê *Xweda* ez ku bixwînim
Tev bircê te bînim (T 174-6,7)

4.1.8 Îbrahîm Pêxember û Unsûrên li dor Wî

Helbestvan di malikên jêrîn de hestên xwe yê aşiqane bi kesayet û cihên dîrokî xemilandîye. Di malikan de kesayetên ku derbaz dibin ji têkilîyeke dîrokî bêtir bi taybetmendîyên xwe cih digirin. Her çend di navbera Azer û Îbrahîm/Birhîm de têkilîyek xizmî hebe jî, taybetmendîyên wan bêtir aşkere ye. Helbestvan, yara xwe ji layê xweşikahîyê dişibîne latên ku Azer dergevanîya wan dike; xwe dişibîne Birahîm ku bi mêrxasî latên pûtxaneyê şikandîye û canê xwe xistîye xetereyê. Homan û Nemrûd jî bi zilm û sitemkarîyê tèn nasîn.

Pêş û qublegaha aşiqan î ey perî tû
Latê *Azer* î tû
Dergeha li ber pûtxaneyê ez dê şikînim
Te bi kotek derînim
Birhîmê zeman im ez li der xakê *Rehayê*
Can û dil tebayê
Sed *Homan* û *Nemrûd* dê bi qurban bigerînim
Te ji dest wan derînim (T 174-2, 3, 4, 5)

4.1.9 Nûh-Tofana Nûh-Keştiya Nûh

Hezretî Nûh, bi avakirina keştiyê, tofanê û temendirêjîya xwe di dîrokê de cih digire. Keştiya Hezretî Nûh remz û nişana rehabûnîyê û tofan jî sembola karesat û nehametan e. Di malikên jêrîn de tofana Hezretî Nûh wekî karesateke mezin hatîye teswîr kirin.

Çi fertona serî *Nûh* e
Ji derya Hind ku lê rabû
Di nîva bager û pêlan
Di wê avê de ew geştîm (T 347-3)

4.1.10 ‘Îsa-Mûsa-Çiyayê Tûr

Nekir dûm bi *Îsa* re zatê ji nûr
Nekir dûm bi *Mûsa* re pêxwasê *Tûr* (T 38-1)

Tîrêj, di malika jorîn de rûdana ku Hezretî Mûsa sola xwe ji nigê xwe deraniye û pêxwas çûye ser çiyayê Tûrê bi bir tîne. Ev rûdan di Qur’ana Pîroz de di sûreya Taha de derbaz dibe.

4.2 Dîroka Îslamê

Di dîroka serdema Îslamê de bi taybet dewleta Eyûbiyan û Sultanê gernas Selahaddîn derdike-

ve pêş. Her weha Heccacê zalim jî bi zilm û sîtemkariya xwe di malikan de cih digire. Wan kesên bi zilm û sitem hukumdariyê dikin hatine şibandin bi Heccacê Zalim. Dîsa di dîroka serdema Îslamê de rûdana trajîk a Kerbelayê jî bi hemû alîyên xwe di helbestan de bi cih bûye.

4.2.1 Heccacê Zalim

Heccac (661-714) yek ji walîyê Emewîya ne. Bi zilm û zordariyê tê nasîn. Di malikên Tirêjê de remz û nişana desthilatdarên sîtemkar e.

Li ser textê *Hucac* hûn dikne ferman
Ne ol û dîn, neyarêd tuxmê însan (T 129-3)

4.2.2 Kerbela-Huseyn

Rûdana Kerbalayê di dîroka Îslamê de cihekî taybet digire. Li ser vê rûdanê, bi taybet li deverên weke Îranê û herêmeke Îraqê edebîyatek ava bûye. Kerbela û Hezretî Huseyn temsîla mez-lûmiyetî ne ji ber vê yekê ew kesên ku zilm li wan hatiye kirin bi şehîdê Kerbalayê, Hezretî Huseyn têne şibandin.

Belê ara we kevn e, ne ji neha ye
Ji dewra wan şehîdên *Kerbela* ye
We zarokên *Huseynê Haşimî Zad*
Hemî kuştin li gel wê ava Mûrad (T 129-5,6)

4.2.3 Selaheddîn-Eyyûbî

Selaheddînê Eyyûbî yan Selaheddînê Kurdî hem di dîroka kurdan de û hem di dîroka alema Îslamê de cihekî mezin wergirtîye. Ew, bajarê Qudsê ji destê xaçperestan reha dike û dewleta Eyyûbîyan ava dike. Bi van layên xwe weke qehreman û gernasekî kurd di helbestan de sembola mêr û mêrxasîyê ye.

Dewleta *Siltan Selaheddîn* paytextê Misr û Şam
Leşkerê azadiyê şûnwarê *Eyyûbî* ne em (T 481-7)

Selaheddîn serî rake ji gorê
Ji mizgefta Emewya xweş binêre (T 357-1)

Selaheddînê kurdî me
Li textê Misrê sultan im (T 309-2)

4.3 Dîroka nûjen

Di vê lêkolînê de me dîroka nûjen ji sedsala 19an û heta roja me bi sînor kir. Di vê beşê de rûdanên dîrokî ên ji sedsala 19an û vir de ew ê bîna nîşandayîn. Di dîroka nûjen de bi piranî ser-hildanên kurd di helbestên Tirêjê de cih digirin. Komkujiya Helepçe û şewata sinemaya ‘Amûdê û hin rûdanên din jî di helbestan de tîn dîtin. Peymanên navneteweyî, ku bandoreke giring daniye ser dîroka kurdan, wek Sykes-Picot jî hatine bîranîn. Rûdan û kesayetên dîrokî ku peywendiyên wan bi dîroka kurdan re tunin, lê di dîroka dunyayê de an di ya hin gelan de cihekî taybet ji xwe

re wergirtine, wekî Fidel Castro, hilweşandina dîwarê Berlinê, cenga di navbera Iraq û Îranê de, Şoreşa Îranê, Ernesto Che Guevara, Cemîleya Cezayirî jî hatine bibîrxistin. Ji ber ku Tîrêj gelek rûdan anîne ziman em ê ji wan hinekan wek mînak dest nîşan bikin.

4.3.1 Şêx 'Ubeydullahê Nehrî

Şêx 'Ubeydullahê Nehrî, bi serhildana sala 1880yê tê nasîn. Ji ber vê weke gernasekî di malikên helbestvanan de cih girtîye. Di malikên Tîrêj de bi heman serhildanê hatîye bîranîn.

Ebdullê Nehrî dema ku şêst hezar leşker civand
Kurdê Zagros im bi xwe tev leşkerê *Nehrî* ne em (T 481-9)

4.3.2 Mîr Bedirxanê Cizîrî

Mîr Bedirxanê Cizîrî, weke ku ji bernavkên wî tê famkirin mîrek ji mîrên Cizîra Botan e. Li hember Osmanî serî hildide û li hember wan têdikoşe. Dewleta Osmanîyan, malbata Bedirxaniyan sirgûnî Stenbol û Girîdê dike. Malbata Bedirxaniyan ji bo ziman û edebîyata kurdî xizmetên bêhempa dikin. Ji ber vê xizmeta Bedirxaniyan, Tîrêj, hemû xwendekaran weke leşkerê Bedirxaniyan dinasîne.

Mîr Bedirxanê Cezîrî hakimê Burca Belek
Xwendekarê dewletê pêkve sîpahê wî ne em (T 481-10)

4.3.3 Şêx Se'id

Li gel muderris, mutesewif, mufessîr û muheddîstiya xwe serokê serhildana sala 1925an e. Piştî têkçûna serhildanê li Amedê tê bidardakirin. Hem weke lehengekî serhildanê û hem jî weke mezlûmekî bisêdarvekirî tê bîranîn.

Berê te ger li Amed bî
Tu xweş deynî qulingê min
Lê kêla *Şêx Se'idê kurd*
Bidî ber deng û fixana (T 119-1)

4.3.4 Avakirin û Hilweşandina Dîwarê Berlînê

Piştî Herba Duyemîn ya Cîhanê Elmanya dibe du perçe. Bajarê Berlînê di navbera her du perçeyan de; Elmanyaya rojava û Elmanyaya rojhilat, parve dibe. Ji bo ku welatî derbazî rojava û rojhilatê nebin dîwarek di navbera her du perçeyan de tê avakirin. Avakirina dîwarê Berlînê remza perçebûna neteweyan û hilweşîna dîwar jî sembola yekîtîya neteweyan e.

Weke ku tê zanîn Berlîn bajarekî Elman e.
Bine *dîwarê Berlîn Alman* pê bû du perçe
Wa îro ew bi xurtî *ji bin ve dadixînin* (T 295-2)

4.3.5 Peymana Sykes-Picot

Peymana Sykes-Picot, peymanî ye ku di 16ê gulana sala 1916an de di navbera Împaratoriya Brîtanya û Fransayê de ji bo parvekirina erdnîgarîya Rojhilata Navîn ya dewleta Osmanîyan hatîye imzekirin. Paşê dewleta Rûsî jî beşdarî vê peymanê bûye (Metintaş, 2017:

42). Tîrêj vê peymanê rexne dike û dixwaze ku sînoren bi vê peymanê hatine danîn ji holê werin rakirin.

Sozmana Saykis Bîko li Kurdistan çend sînor
Danîn divê em rakin xwe j bin destan derînin (T 295-4)

4.3.6 Cemile Buhayrad (Djamila Bouhired)

Cemîle Buhayrad, sembola şoreşa azadiya Cezayîrê ye. Leşkerên Fransayê wê êxsir dikin. Berî ku were bidarvekirin ji teref leşkerên Fransa duçarî tecawiz û îşkenceyan dibe (Laurent, 2004: 117). Tîrêj, Cemîle Buhayrad weke rol model hildibijêre.

Wek *Cemîla Bûheyred*, serbilinda Cezayir
Fîrensa ew seraser dane ber dax û şewat (T 100-6)

4.3.7 Şoreşa Îranê

Şoreşa Îranê di sala 1979 de pêk hatîye. Bi vê şoreşê desthilata Şahî ketîye destê serokên olî (Cülük, 2018: 90-93). Tîrêj, şoreşa Îranê weke mînak hildibijêre ji bo desthilatên zordest.

Tiştê çê bû li *Îran* ma te nedî ne bihîst
Gelo nayê bîra te ew şah in *şahê bin gor*
Ketî bin çerxa tarîx, lê wergerî dem û dor T (88-9, 10)

4.3.8 Fidel Castro û Şoreşa Kuba

Şoreşa Kubayê bi rêxistina 26ê Tîrmehê destpêdike û di 1ê Kanûna Paşî ya sala 1959an de rejîma Fulgencio Batista bi dawî dibe û ji teref Fidel Castro hikumeteke nuh ava dibe (Koca, 2020: 43-66). Tîrêj, serokê vê şoreşê weke leheng dinasîne.

Şoreşa Kastro li Kûba serbilind û qehreman
Şoreşa li Nîkaragwa ya bi nav û pir bi deng (T 293-5)

Encam

Tîrêj yek ji wan helbestvanan e ku xwestiye di helbestên xwe de dîrok û rûdanên dîrokî ragihîne. Piraniya helbestên xwe li ser vê poetîkayê ava kiriye. Dîroka gelê xwe, cih û warên ku kurd lê jiyane, kesayetên mezin ên dîroka kurdan tevî hinek dijminên wan di helbestên wî de cih girtine.

Dîroka gel ya beriya serdema Îslamê, dîroka serdema Îslamê û dîroka nûjen, geh bi hunera telmîhê, geh rasterast, geh bi teswîrkirina rûdanên dîrokî, geh bi rêya serpêhatiyên di helbestên Tîrêj de reng vedane.

Bi taybetî di hin helbestên wî de dîroka nûjen, dîroka hin rûdanên civakî û siyasî bi roj û meh û salan cih girtiye. Wekî komkujiya Helepçe û şewata sînemaya ‘Amûdê. Her weha di helbestên zêmar/mersiyeyan de li ser mirina kesayetên hatine nivîsandin jî dîroka mirina kesayetên rasterast hatine nivîsandin.

Wek ku Tîrêj di helbestên xwe de aniye ziman, sedema cihgirtina dîrokê di helbestên wî de ji bo avakirina pirekê di navbera nîfşên nû û yên berê de ye. Her weha Tîrêj, ji bo rûdanên dîrokî neyên jibîrkirin û kartêkirînekê li ser hişê gel bike helbest weke amrazekê bikar anîye.

Çavkanî

- Amûzişî, S. P. (1396). *‘Ulûmê Funûn û Edebî*. Tehran: Şirketê Çap û Neşrê Kîtaphayê Dersî.
- Aqtepe, Ş. ‘E. (2002). *Dîwana Rûhî*. Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Aqtepe, Ş. ‘E. (2016). *Rewdu’n-Ne’îm*. Diyarbakır: Seyda Yayınları.
- Arîkele, Z. A. (2016). *Şîretname*. Diyarbakır: Aram.
- Aykaç, Y. (2022). “Şah û Pahlewanên Mîtolojîk di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”. *Mîtos û Edebiyat Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de*. (Ed. Shahab Vali & Kenan Subaşî). Stenbol: Nûbihar.
- Bateyî, M. H. (2015). *Mewlûda Nebî*. Diyarbakır: Dini Neşriyat Kitabevi.
- Bedlîsî, Ş. (1998). *Şerefname -Kürd Tarihi- Türkçeye Çeviren: M.Emin Bozarlan*. İstanbul: Deng.
- Bethaî, S. H. (1381). Şi’r û neqşê an der camî’e. *Danişgedê Edebiyat û ‘Ulûmê însanî, Dewre 52, Şomare 162, Tehran, 161-172*.
- Budaq, S. K. (2004). *Dîroka Nijada Şêrwan (Dîroka Mîrekên Şêrwanê)*. İstanbul: Enstituya Kurdî Ya Stenbolê.
- Cülük, A. (2018). İran İslam Devrimi ve Ulemanın Zaferi. *Güvenlik Çalışmaları Dergisi , 20 (1), 87-103*.
- Cegerxwîn. (1992). *Kîme Ez*. İstanbul: Deng.
- Celîl, O. (2001). *Kürt Kahramanlık Destanı, Dımdım, Rusçadan Çeviren, İbrahim Kale*. İstanbul: Avesta.
- Demir, A. (2012). *Qewlê Newala Sîsebanê*. İstanbul: Nûbihar.
- Durre, A. (2002). *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jiyana Wî*. İstanbul: Keskesor.
- el-babanî, A. b. (2019). *Siyer’ul Ekrad, Bâban ve Erdelan Kürtleri Tarihi (1523-1870), Hazırlayan: Veysel Başçı & Eral Ceylan*. İstanbul: Peywend.
- Ertekin, M. Z. (2016). Analîzek Li Ser Guldana Hezîn Di Çarçoveya Şîretnameyên Kurdî De. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi , 2 (3), 62-86*.
- Fesayî, M. R. (1380). *Enwa’ê Şi’rê Farsî*. Şîraz: Nuwêd.
- Günyüz, M. (2010). Tarih-Edebiyat İlişkisi. *Somuncu Baba Aylık İlim Kültür ve Edebiyat Dergisi, Yıl 17, sayı 118, Ağustos, 66-67*.
- Gemi, A. (2018). Çend Agahî Derheq Jiyana Feqe Reşîd û Sirru-l Mehşera Wî de. *Nûbihar Akademî, Jimar 9, Sal 5, 127-145*.

- Hedili, K. S. (2016, 12 12). *Çandname*. Çandname: <https://candname.com/weje-u-dirok/>
- Ibrahîm, I. (2016). *Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn De*. Mardîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind.
- Ibrahîm, I. (2018). *Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn*. Stockholm, Swêd: Apec Tryck & Förlag AB.
- Kaya, Ş. (1991). Hevpeyvînek Bi Seyfayê Tîrêj Re. *Berhem, Kovara Lêkolînên Civakî û Çandî-Gulan, Îlon, Hejmar 11-12*, 84-86.
- Koca, M. (2020). Küba Devrimi ve Devrimin Türk Basınına Yansıması: Milliyet Gazetesi Örneği. *Birey ve Toplum Sosyal Bilimler Dergisi*, 10 (1), 43-66.
- Laurent, M. (2004). Aşk ve Aşkın Buluştuğu ve Ayrıştığı Yer: NizârKabbâni ve Cemal Süreya'nın Şiirinde Sevgili ve Mesaj. *Doğu Batı*, 26, 111-124.
- Lêkolîn. (2014). Ji Bo Bîranîna Seydayê Tîrêj- Seydayê Tîrêj Di Çend Rûpelan De (Kurtejiyan û Dem). *Pênûsa Nû, Hejmar 22, Sibat.*, 5-6.
- Metintaş, M. Y. (2017). Sykes-Picot Antlaşmasından 1960 Kıbrıs Cumhuriyeti'ne Kadar İngiltere ve Fransa'nın Kıbrıs Politikaları. *Türk Dünyası Uygulama ve Araştırma Merkezi Yakın Tarih Dergisi*, 1 (1), 42-56.
- Munferd, M. F. (1372). Peywendê Tarîx û Edebîyat. *Gîhanê Ferhengî*, , *Salê Dehom, Şomare 7*, 24-28.
- Palo, Mela E. (2022). *Şahnameya Kurdan Civîna Nemiran*. (Amd. M. Yıldırımçakar, V. Başçı, Y. Aykaç, R. Palo). Stenbol: Nûbihar.
- Perîsa&Tarî, S. Q. (1396). Peywendê Tarîx ba Edebîyat Der Mitûnê Tarîxîyê Zeban û Edebîyatê farsî. *Mecelleê Tarîxê Edebîyat, Şomare 81/3*, 49-77.
- Polat, L. (2019, 08 01). *Çandname*. Çandname: <https://candname.com/edebiyat-u-dirok/> adresinden alındı
- Sadîmî, M. (2000). *Feqiyê teyran û helbestên Wî*. İstanbul: Nûbihar.
- Soğukömeroğulları, M. (2010). Fuat Şükrü Dilbilen'in şiirlerinde toplumsal hafıza. *Karadeniz Araştırmaları, Yıl: 2010 Cilt: 7 Sayı: 27*, 149-177.
- Şemîsa, S. (1375). *Ferhengê Telmîhat (îşaratê Esatîrî, Dastanî, Tarîxî, Mezhebî Der Edebîyatê Farsî)*. Tehran: Mîtra.
- Şero & Silêman, H. I. (Bê Dîrok). *Wêjeya Kurdî Amadeyî-3: Tîrêj*. Bê Cih: Komiteya Ragihandinê Li Herêma Cizîrê.
- Tîrêj. (2014). *Dîwan (Xelat-Zozan-Cûdî)*. Stenbol: Peywend.
- Torî, M. S. (2018). *Dara Malbata Pêxemberan û Ehlê Beyta Nebî*. İstanbul: Nûbihar.

Xelîlî, X. (Destxet). *Dîwana Xelîlî*. Arşîwa Taybet ya Nurettin Ertekin.

Yıldız, A. (2015). *Qewlê Hespê Reş (Metn û Lêkolîn)*. Mardîn: Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yê li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Yıldız, A. (2017). *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî -1-*. Van: Lorya.

Yazıcı, T. (2011). Târîh-î Beyhak,. *TDV İslam Ansiklopedisi, C 40* (s. 74-75). içinde İstanbul.

Yazıcı, T. (2022). *Mîrnameya Hekarîyan, Wergera Ji Farisî: M. Xalid Sadîni*. Van: Peywend.

Zengî, D. (2004). *Panorama Veşartin, Şînî û Bîranîna Çilrojîya Koçkirina Seydayê Tîrêj*. Libnan-Beyrût: Çapxaneya Amîral.



Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 7

e-ISSN 2717-8315

DOI: 10.55118/kurdiyat.1228042

Rüpel/Sayfa Page: 45-58



Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Geliş Tarihi/Received: 01.01.2023
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/:
10.06.2023
Awat Wali, Lecturer, Department of Arabic
Language, University of Halabja.
awat.wali@uoh.edu.iq
Orcid: 0000-0001-5442-1810

Atrf: Wali. A. (2023). "Ehmed Muxtar Caf wekû
Şa'îrêkî Roşinbîr û Çîroknûsêkî Rîformixwaz",
Kurdiyat, 7, 45-58.
Citation: Wali. A. (2023). "Ahmad Mukhtar Jaff
as an Intellectual Poet and a Reformist Story
Writer", Kurdiyat, 7, 45-58.

ئەحمەدموختار جاف وەکوو شاعیرێکی رۆشنبیر و چیرۆکنووسێکی ریفۆرمخواز

ئاوات حسن والی

Awat Hassan WALI

پوخته

ئەحمەدموختار جاف، کە سەردەمی ژبانی دەکەوتە کۆتایی قوناغی شیعری کلاسیکی لەئەدەبی کوردیدا و سەرەتای سەرھەڵدانی نوێیونەوی شیعری کوردی، بەرھەمە ئەدەبییەکانی چارەسەری دیاردە کۆمەڵایەتی و سیاسی و ئابوورییەکانی کۆمەڵگای لە ھەناویدا ھەلگرتوو و نووسەر زۆر شارەزایانە بە (شیعەر، چیرۆک) وەک دەروونناس و کۆمەڵناس و سیاسەتمەدار و عاشق، دەست دەخاتە سەر بڕینە جیاوازیەکانی کۆمەڵگاکە و چارەسەرەکەشیان بۆ دیاریدەکات، بەبێ ئەوەی ھیچ کام لەو پەیامە فەلسەفی و دەروونی و کۆمەڵایەتی و سیاسی و ئابووری... لەبەھای ھونەری بەرھەمە ئەدەبییەکانی کەم بکەنەو، بەڵکو لەبەرزترین ناستی ھونەریدان و بەشارەزاییکی تەواوی ھونەرییە بەرھەمەکانی پێشکەشکردوو. ئەم توێژینەویە، لەچوار تەمەردا باسی پەیامەجیاوازیەکانی بەرھەمە ئەدەبییەکانی ئەحمەدموختار کراوە، کە ھەریەک لەو پەیامانە لە رۆژگاری ئەمڕۆدا بابەت و زانستێکی سەربەخۆن، بەلام ئەحمەدموختار لەبەر ھەمە شیعرییەکانی و بەرھەمی رۆمان (مەسەلە و یژدان) بەوردی و شارەزاییانە ئەو چەمکانە روونکردۆتەو. لەتەمەری یەکەمدا باسی ئەو ژیری و بیرمەندی و دانایییە ئەحمەدموختار دەکەین، کە لەبەر ھەمەکانیدا ئاراستە ئەوەکانی کۆمەڵگای کوردی کردوو. ھەروەھا لە تەمەری دووەمدا باسی لایەنی نەتەوی و سیاسەتمەداری نووسەرمان کردوو و بەنموونە بەرھەمەکانی روونمانکردوو ئەوە. لەتەمەری سێیەمدا بەنموونە بەرھەمەکانی نووسەر، ئەومان روونکردوو ئەوە، کە ئەحمەد موختار ناستی رۆشنبیری سەبارەت بە بابەتە دەروونی و کۆمەڵناسییەکانی کۆمەڵگا چەند بەرزبوو و چۆن ھەندێک جار وەک توێژەری کۆمەڵایەتی و دەروونی دەرکەوتوو. لەکۆتا تەمەردا باسی قۆڵبوونەوی نووسەر لەبابەتی عەشق و خوشەویستی و عارفیدا دەکەین.

وشەسەرەکییەکان: ئەحمەدموختار جاف، رۆشنبیر، چیرۆکنوس، پەیامی شیعری، ریفۆرم.

Ahmad Mukhtar Jaff as an Intellectual Poet and a Reformist Story Writer

Abstract

Although Ahmed Muhtar Caf lived a short life, he left a distinctive and valuable literary legacy to the Kurdish nation. The author, who produces works that point to the social, political and economic problems of the society, handles literature very skillfully in these contexts. The philosophical, psychological, economic and sociological content of his works does not diminish the value of his literary work, on the contrary, it enriches his works thematically and makes them interesting. Our research discusses the different content messages of Ahmed Muhtar's literature at four focal points; In today's life, each of these messages is an independent science and subject, but Ahmed Muhtar has used these terms gracefully and skillfully in his poems and novel. In the first focus, we are talking about this mind and wisdom directed by Ahmed Muhtar to the people of Kurdish society. In the second focus, we talked about his nationalism and political aspects with examples from his literary studies. In the third focus, we tried to understand and explain how Ahmed Muhtar was highly educated in psychosocial issues and how he appeared from time to time as a psychologist or sociologist with examples from his writings. Finally, we talked about his extensive interest and contacts in romanticism and mysticism.

Keywords: Ahmed Mukhtar Jaff, Intellectual poet, Storyteller, Poetic message, Reform.

Bir Entelektüel Şair ve Reformist Öykü Yazarı Olarak Ahmed Muhtar Caf

Özet

Ahmed Muhtar Caf kısa bir hayat yaşamasına rağmen Kürt milletine farklı ve değerli bir edebiyat mirasını bıraktı. Toplumun sosyal, siyasi ve ekonomik sorunlarını imleyen eserler veren yazar, edebiyatı bu bağlamlarda çok ustaca ele alır. Eserlerinin felsefi, psikolojik, ekonomik ve sosyolojik içerikli olması onun edebiyat eserinin değerini azaltmaz, aksine eserlerini tematik olarak zenginleştirir ve ilginç kılar. Araştırmamız, Ahmed Muhtar'ın edebiyatının farklı içerik mesajlarını dört odak noktasında tartışmaktadır; günümüz yaşamında bu mesajların her biri bağımsız bir bilim ve araştırma konusudur, ancak Ahmed Muhtar şiirlerinde ve romanında bu terimleri incelikle ve ustalıkla kullanmıştır. Birinci odak noktasında Ahmed Muhtar'ın Kürt toplumunun insanlarına yönelttiği bu akıl ve bilgelikten bahsettik. İkinci odakta, edebiyat çalışmalarından örneklerle onun milliyetçiliğini ve siyasi yönlerini ele aldık. Üçüncü odak noktasında, yazılarından örneklerle Ahmed Muhtar'ın psikososyal meseleler noktasında yüksek eğitilmiş olduğunu ve zaman zaman bir psikolog veya sosyolog olarak nasıl görüldüğünü anlamaya çalıştık. Son olarak da onun romantizm ve mistisizme olan geniş ilgisi ve temaslarını inceledik.

Anahtar Kelimeler: Ahmet Muhtar Caf, Entelektüel şair, Öykü Yazarı, Poetik mesaj, Reform.

پێشەکی

رۆشنبیر، لەسادهترین ناساندنی دا دەوتریت: کەسێکە لەهەموو شتێک شارەزایی ھەبێت و لەبابەتییکی دیاریکراویشدا قوڵبووبێتەوێ شەرەزایی تەواری ھەبێت. ئەگەر چاویک بەدیوانی شاعیرانی کورد و بەتایبەتی شاعیرانی قوناعی کلاسیکدا، کە بەردی بناغەیی ئەدەبی کوردییان داناو بەخشین و لیکۆلینەوی ورد لە بەرھەمی ئەو شاعیرانەدا بکەیت، ئەوا دەتوانیت رێسا و دەستوری ژبانی گشتیی کۆمەڵگا لە واتای بەرھەمەکانەو دابریژریت و چارەسەری زۆربەیی بابەتە کۆمەڵایەتی و سیاسی و ئەخلاق و ئاینییەکان بدۆزیتەو، چونکە زانست و زانیاری ئەوان تەنها لەواری رستە ریکخستن و وشە خستەپال یەکا نەبوو، بەڵکوو بەھۆی دەقەشیرەییەکانیانەو کۆمەڵیک پەیمانی جیاوازیان گەیانندوو بە چینیەکانی کۆمەڵگا، بەی ئەوێ ئەو مەبەستانە ھێچ کاریگەرییەکی خراپیان کردبێتە سەر ئاستی ھونەری بەرھەمەکان، بەلام ئەوێ جیگەیی ھەلوێستەلەسەرکردن و گرنگپێدانە ئەوێ، کە ھەتا ئێستا لەگەڵ ئەوێ سالاھە چەندین توێژینەوی ئەدەبی نەجامدەدریت، بەلام ھەک پێویست کار لەسەر پەیمانی جیاوازیەکانی شاعیری کلاسیکی کوردی لەئاستییکی قولدا نەکرەو و دەست بۆ لایەنە شارەوانەکان کەمتر براو، لەکاتیکیدا بایەخ دەدریت بە ھەندیک لایەنی بەرھەمی نەتەوێکانی تر، کە ئەگەر ئەو ھەول و ماندووبوونە لەگەڵ بەرھەمی شاعیرانی کوردا بدریت، ئەوا بەدائینی ئەوێ گەنجینەییەکی گەورە و بەزخیی بواری ئەدەب و ھونەرمان بۆ دروستدەبێت، کە ھەموو کەسەستییەکی پێویستی چالاکییە ئەدەبی و کۆمەڵایەتیەکان لەخۆدەگریت.

ھۆکاری ھەلبژاردنی ناوێشانی ئەم توێژینەوێمان ئەوێ، کە کۆمەڵیک پەیمانی گرنگ و دانایی و ژیری لەبەرھەمی ئەحمەدموختار جافدا ھەیە، کە نەک بۆ سەردەمی شاعیر، بەڵکوو بۆ سەردەمی ئەمروێش لەرووی پەرودەیی و سیاسی و نیشتمانی پەرودەیی و دانایی و ئاینی... پەیمانی گرنگ و پێویستن.

بۆ شیکاریکردنی دەقەکانی ئەحمەدموختار و بەئەنجامگەیانندی توێژینەوێمان، رێبازی (شیکاری و سەفیی)مان بەکار ھێناو. پیکھانەیی توێژینەوێمان کە شەمان لەچار تەمردا باسی پەیمانی جیاوازیەکانی بەرھەمی ئەدەبیەکانی ئەحمەدموختار کراو، کە ھەر یەک لەو پەیمانە لە رۆژگاری ئەمروێدا بابەت و زانستییکی سەر بەخۆن، بەلام ئەحمەدموختار لەبەرھەمی شاعیریەکانی و بەرھەمی رۆمان (مەسەلەیی وێژدان) بەوردی و شارەزاییانە ئەو چەمکانەیی رۆونکردۆتەو. لەتەمەری یەکەمدا باسی ئەو ژیری و بیرمەندی و داناییەیی ئەحمەدموختار دەکەین، کە لەبەرھەمی ئەوێ ئاراستەیی نەوێکانی کۆمەڵگای کوردی کردوو. ھەر و ھا لە تەمەری دووھەمدا باسی لایەنی نەتەویی و سیاسەتمەداری نوسەرمان کردوو و بەنمۆنەیی بەرھەمیەکانی رۆونمان کردوو. لەتەمەری سێھەمدا بەنمۆنەیی بەرھەمی نوسەر، ئەوێمان رۆونکردوو. ئەوێمان ئەحمەدموختار ئاستی رۆشنبیری سەبارەت بە بابەتە دەروونی و کۆمەڵناسییەکانی کۆمەڵگا چەند بەرزبوو و چۆن ھەندیک جار ھەک توێژەری کۆمەڵایەتی و دەروونی دەرکەوتوو! لەکوێتا تەمردا باسی قوڵبوونەوێ نوسەر دەکەین لەبابەتی عەشق و خۆشەویستی و عارفیدا.

پێشینیەیی توێژینەوێ:

ئەحمەدموختار بەھۆی سەردەمی ژبانی و قوناعە ئەدەبیەکی و کاریگەریی شێو و ناوێکی بەرھەمی ئەدەبیەکانی و ناوبانگ و پێگەیی ئەدەبی و رامیاری بنەماڵەکی لەچەندین بۆنە و تۆماری میژووی و ئەدەبی ناوی تۆمار کراو و نامازە بەبەرھەمی کراو، بەلام ھەک توێژینەوێ زانستی:

مامۆستا سەردار گەردی لە ژمارە (۵) ی گۆقاری زانکۆی سلیمانی لەسالی (۲۰۰۲)، توێژینەوێیەکی بۆ کردوو. بەناوێشانی: لیکچواندن و رۆلی لەدروستکردنی وینەیی ھونەری لەشیرەکانی (ئەحمەدموختار بەگی جاف) دا. لە ئەم توێژینەوێماندا توێژەر باسی ھونەری رۆونبێژی (لیکچواندن و جۆرەکانی لیکچواندن) و دروستکردنی وینەیی ھونەری دەکات لە دەقە شاعیریەکانی شاعیردا.

مامۆستا سەعد فاروق، لەسالی ۱۱۰۲ نامەى ماستەرەكەى چاپكردووه، بەناونیشانی: بنیاتی هونەری لەشعیری ئەحمەد موختار بەگی جافدا، كە هەر لەناونیشانهكەیدا دیاره نوسەر لەبارەى بنیاتی هونەری شیعەرەكانهوه لێكۆڵینهروەكەى ئەنجامداوه.

و هزارةتى رۆشنبیری حكومەتى هەریمی كوردستان - عێراق، بەرپووبەر ایەتى رۆشنبیری هەلەبجە، ۱۲-۳۱/۸/۲۲، دیداری تایبەت بە شاعیر ئەحمەدموختار جاف، ئەنجامداوه و دواتر بابەتەكانی دیدارەكە لە كۆتییەكدا لەچاپداوه. هەروەها لە (۶۱۰۲/۲/۴) دیداری دووهمی ئەحمەدموختار ئەنجامدرا، بەلام بابەتەكانی دیداری دووهم چاپنەكران و بلاونەكرانەوه.

دكتور هێمن كەرىم، نامەى ماستەرەكەى، كە لەسالی (۰۲۰۲) بەشێوهى كۆتیب چاپكراوه، بەناونیشانی: (پروونبیزی لە شیعیری ئەحمەد موختار جافدا) یە، هەروەها دوو توێژینهوهى تریشى هەیه، كە یەكەمیان بەناونیشانی: لێكدانهوهى هێماكانی چاو و پەيوهستهكانی لەشعیری حافظ و ئەحمەد موختار جافدا (لێكۆڵینهوهیهكى بەراوردكاریهه)، كە لەدووهمین كۆنفرانسی هاوبهشی ئیودولەتی توێژینهوهى زمان و وێژەى كوردی و فارسی (زمان ناسی و بووتیقا)، ۹-۹۱۰۲/۶/۰۱، زانكۆی كوردستان سنه پینشكەشكراوه. دووهمیان بەناونیشانی: دركەو خواستن، خستنه رووی و اتا شاراوەكانی دەق بە نمونه دهقه شیعریهكانی ئەحمەد موختار جاف، لەژماره ۵ ی گۆفاری كورینامەى ئیونەتەوهی، لە نۆفەمبەری ۱۲۰۲ بلاوكرانەوه.

كاروان عوسمان خەیات (رێبین)، كۆبەر هەمى ئەحمەد موختار جاف، لەسالی ۹۱۰۲ بلاوكردۆتەوه.

ئەو نوسین و توێژینهوانەى پینشتر لەبارەى ئەحمەدموختار جاف، یان بەر هەمە ئەدەبیبهكانبهوه بلاوكرانەتەوه، زۆررەبەیان لەرووی میژوووبهوه هەولێ ساغكردنهوه و لێكدانهوهى بەر هەمەكانیان كردووه و توێژینهوهكانیش یان تەنها لەبارەى بنیاتی هونەری و پروونبیزی لەدهقه شیعریهكانی شاعیردا كراون، یان لایەنێكى دیاریكراو لە بەر هەمەكاندا، بۆنمونه: سیاسەت، نیشتمان پەرودەری، خۆشەویستی...، یان لێكدانهوه بۆ دەقیكى دیاریكراوى شاعیر كراوه.

ئەم توێژینهوهى ئێمە وەك لە درێژەى توێژینهوهكەدا رووندەبیتەوه، كاریكى تەواو جیاوازه لەو كارانەى پینشتر. ئەم توێژینهوهیه بەشێوهیهكى بابەتیانه لەبارەى پەيامی ژیری و دانایی و پەرودەهیی، ... ناوەرۆكى بەر هەمەكانهوهیه و بۆ هەریهكە لەو بابەتانهى نامازەى بۆكراوه لەتوێژینهوهكەدا، نمونه هینراوتەوه و لێكدانهوه بۆ دەقهكان كراوه. هەروەها بنهمای چاكسازى كۆمه‌لایهتی و نابوووری و ئاینی، كە ئەحمەد موختار لەبەر هەمەكانیدا روونیکردووتەوه، لەم توێژینهوهیەدا شیکردنهوهیان بۆ كراوه و روونكرانەتەوه.

بەشى یهكەم: پەيامی رۆشنبیری و پەرودەهیی لە شیعەرەكانی ئەحمەدموختار جاف دا

ئەو سەردەمەى ئەحمەدموختاری تێدا ژیاوه، سەد سالی پینش ئیستایه، وە لەو سەردەمشدا و لەناو پینشانی گەلهكەماندا باوترین پیناسەى رۆشنبیر كە هەتا ئەمڕۆش بلاوه، ئەوهیه كە دەوتریت: رۆشنبیر كەسێكە لە هەموو شتێك (بابەتێك) زیانیاری هەبیت و لەیهكێك لەبوارەكاندا زۆر قوولبووبیتەوه. لەژێر رۆشنایی ئەو ناساندنەى رۆشنبیر دەتوانین بڵین: ئەم نوسەرمان بەتەواوی مانا كەسێكى رۆشنبیربووه، چونكە لەزۆر بهی لایەنهكانی ژبانی كۆمه‌لایهتی و ئاینی و سیاسیی و نابوووری و دەروونی و هونەری (شعیر، چیرۆك) ... شارەزاییهكى زۆرباشی هەبووه، ئەو شارەزاییهشی لەبەر هەمە ئەدەبیبهكانبهوه، كە ئەمە یهكێكە لەو خالانهى ئەحمەدموختار لەزۆر بهی شاعیرانی سەردەمیی خۆی جیادهكاتەوه و دەيكات بە نوسەریكى تایبەت. ئەمە بهواتای ئەوه نییه، كە شاعیرانی تری نەتەوهكەمان رۆشنبیر نەبون، یان لە ئاستی ئەوان كەمبەهینهوه، بەلكوو كاری ئێمە توێژینهوهى زانستیه و پینوسته لەسەر بنهمای زانستی یان شیکاری بابەتیانه بریار دەین، لەم لایەنەشەوه شاعیرانی تری نەتەوهكەمان لە بەر هەمەكانیاندا چەندین نامازیان بۆكردوون كە چەندە شارەزان لە زانسته جیاوازهكان، كە هەندێك شاعیر هینده لایهتیک یان بواریك زاله بەسەر بەر هەمەكانیدا، ئەو لایەنه بووه

هۆشیارکردنەوه و گەشەکردنی کۆمەڵگا بەگشتی هەبێ.

عادەتی ئەم چەرخە وایە، ئەهلی دڵ غەمگین ئەکا
ئەبلە وادایم لەعەیش و شادمانی و عیززەتا
دوژمنە چەرخێ فەلەک بۆ پیاوی ساحیب عەقڵ و هوش
شاهەمیشە ماتە، پیاوێ مەیلی جێی فەرزین ئەکا
ئەهلی عیرفان و کەمال ئیستاکە زاری و شین ئەکا
رووی کەرەم دايم لەهەرزمو شیت و بئێ تەمکین ئەکا

دیوان: ۸۵

بەشێوەیەکێ گشتی، دەتوانین چەند بیرێک - بنەمایەکێ فیکری دایار بیکەین، کە شاعیر لەرێگەیی باسکردنی سروشتیی ژیان و گۆرانی دەوری رۆژگار موه ناماژ میان بۆدەکات:

۱-۱ / سروشتیی ژیان وەک هەموو کارێکی تر یاسایەکی تابیەتی بەخۆی هەبێ و بەپێی ئەو یاسایە کاردەکات و هیچ هەست و سۆز و دڵنەرمییەکێ نییە لەدەر موهی یاسا و رێکار مەکانی خۆیی و دۆستی بەردەوامی کەس نییە، بەلام لەگەڵ ئەو کەسانەدا زۆرترین پەيوەندی هەبێ، کە بەدڵ و بەگیاڵ شونیی دەکەون. بۆنەمۆنە لەهەر سەردەمێکدا بێت و لەهەر شوێنێکدا بێت، دیاردەکانی گەر دوون و هۆکار مەکان سەرکەوتن بە کەسانی بەهێز و لێزان دەبەخشن، بەبێ ئەوهی هەلسەنگاندن بۆ لایەنی باشی و دڵسۆزی و راستگۆیی و... بکەن، واتە لایەنی لاواز هەر چەندە باش و دڵسۆز و بەبەز مەیش بێت، ئەوا لەبەرامبەر بەهێزدا هەلی سەرکەوتنی نییە. بە شێوەیەکێ تریش سەیر بکەین، دەبینین کۆشک و تەلار و مأل و سامان لای ئەوانە کۆدەبنەوه، کە بەردەوام بەشون بەدەستەینانییەوه و زۆربەیی ژیاینی خۆیان بۆ تەرخان کردووه، نەک لای کەسانی رۆشنبیر و زانا، کە زیاتر بایەخ بە شتەکانی ناخی مرۆف دەدن و نامانجیان چەسپاندنی ئەو بنەمایانە، کە ژیاینی کۆمەڵگا بەر موه باشتر دەبەن، وە چێژێکی دەروونی زۆر لەکار مەکی خۆیان دەبینن، بۆیە ئەگەر بەسادەیی سەیری رووکاری شتەکان بکەین ئەوا ناهاوسەنگییەکێ زۆر لەدابەشبوونی دەستکەوتی مادیددا دەبینین لەئێوان تاکە جیاوازی مەکانی کۆمەڵگایی مرۆفایەتیدا، ئەویش لەبەر ئەو هۆکارانەیه کە باسکران.

سەر مای ئەو نەمۆنە شیعریانە، کە ناماژەمان بۆکردن، ئەحمەدموختار لەو چەند دێرەیی خوار موهشدا ناماژەیی فیکری دەربریوه:

زەمانە چونکە خۆی ئەسڵەن بەقای بۆ کەس نی یە تاسەر
لەموزعی چەرخێ دونهەر موه مەبە عاجز تو ئەی (ئەحمەد)
تەماشاکەن هەمیشە بۆ کەسانی بیوهەفا چاکە
کەچەند رۆژێ لەبۆ ئەشخاسی سێلەو بئێ حەیاچاکە

دیوان: ۱۲۴

یان دەلێت:

شیری نەر ئیستە ئەسیری دەسی رێوی حیزە
ملی کەر پەر لەزەر و زیوه، ئەسپی نەژدی
ئیشی ئەم چەرخە تەماشاکە، چ کەچ رەفتارە
لەرولاواز و لەجەر کەوتوو وازامارە
*** **

بەجاری ئەم رۆ جاهییل غالبە، عاقڵ بووه مەغلوب رەفیقان سانیشانم دەن قورئێ تا بێم و بیپێوم دیوان: ۸۶

۱-۲ / بنەمایەکیتر دەردەبریت، ئەویش ئەوهیه، کە کار و کردەوهی خراب هەرگیز تاسەر بەختەومری و خوشگۆزەرانی بۆ مرۆف دەستەبەر ناکەن، بەپێچەوانەوه کاری باشە و چاکەکردن ئەگەر بەردەوامی پێیدریت، درەنگیش بێت نامانجی خۆیی بەدەست دەهێنیت و خاوەنەکەیی کارێگەر بیهکانی دەبینیت، هەر بەهەمان شێوه هەموو شتەر استەکان، ئەگەر بەخیرای نەگەن بەنامانج و بەر هەمی راستەمۆخۆیان نەبیت، ئەوه مانای وا نییە کە بنەمایەکی نادروستیان هەبێ. بەواتایەکیتریش پیاوی نازا و چاوەنەترس، لەرووداویکدا، یان لەشوێنێکدا بەفێلیک شەستی پێهینن، بەهێچ شێوهیەک واتای ئەوه ناگەیهنیت، کە هەلی دووبارەیی بۆ هەستانەوه و سەرکەوتن لەبەر دەستدا نەبیت.

بۆنەمۆنە (ئەحمەدموختار) باسی ئەوه دەکات کە چۆن (زۆراب) بەنارەوا بوو بە بەرپرسی باجکۆکردنەوه و چەندە بە

نادادپەرەری و سەتەم و زۆرداری مافی خەلکی زەوتەمکرد، بەلام سەرەنجام دزی و گەندەلبیەکانی ئاشکرا کران و لەکارەمەکی دوور خرایەوه، هەر وەها باسی ئەوه دەمکات کە زۆراب ئەفەندی رۆژیک دەرواته دەرمووه و سەیری ئەو دەروادەشتە دەمکات، کە پۆل خەلک دانیشتون و بەقافا و پینکەنین و قسەیی خۆش و رابواردنەوه خەریکی مەشروبخواردن، بەلام لەبەر ئەوهی کارەمەیان لە بنەرەتدا هەلەیه، هەر ئەومەندی بەسە کە مەست و سەرخۆش بین و ناگایان لەرەفتارەکانی خۆیان نەمێنیت، ئیتر خۆشی و پینکەنییان دەبیت بەشەر و دەکەونه ویزەیی بەکتری و سەر و دەست و قاچی بەکتری دەشکێنن و برینداری دەمەن (ئەحمەدموختار، ۲۰۱۰: ۳۷-۴۲).

هەر وەها بۆ بەنەجامگەیانندی کارە راست و باشەکانەوه، نابیت رێگای نادروست و نارەوا بەکاربەینریت، مەروڤە چاکەخواز و دڵسۆزەکانیش نابیت بەهیچ بیانوویەک بۆ سەرکەوتنی کارەکانیان دەست لەگەڵ کەسانی خراب و خیانەتکاردا تێکەڵبکەن، چونکە ئەوه وەک ئەو قسەیی لێدیت، کە لە باوباپیرانمانەوه بەردەوام پێیان وتوینەتەوه کە: (هاورپێتە مەروڤی چاک وەک دانیشتن لەدوورەکانی بۆنەرۆش وایە، کە ئەگەر سودیشی بۆت نەبیت، ئەوا بۆنی خۆش دیت بەسەرتدا و ئاسودەیت. هاورپێتە کەسانی خرابیش وەک ئەوه وایە کە لەپەنای ئاسنەگەرێکدا بێت، کە لەهەموو کاتێکدا ئەگەری هەیە پڕیشکێکی ناگراوی بە جەکانت بکەوت).

مەمەن باوەر ئەو رەفیقان گەر رەقیب لوتفی لەحەفتان بێ

چلۆن چاکەیی لەدەست دێ شەخسی پێس و سۆفەلە عادی دیوان: ۱۷۳

*** **

نزیکیی پیاوی ئەحمەق باعیسی فەوتانی ئینسانە هەتا عومرم بێ قەت من رەقیقی پیاوی کەر ناکەم

کەمەن بائیل بەخیرم خێلقەتەن (ئەحمەد) بەخۆریی وەکو ئینسانی جاھیل مەیلی فیتنەو شۆرو شەر ناکەم دیوان: ۹۲

*** **

ئەو نەفام چۆن شیر ئەسیری پەنجەیی رێوی ئەبێ شایەزات دیوہ تا ئەمڕۆ بەچنگی بوومەوه دیوان: ۱۵۷

۱-۳/ بنەمایەکیتری فەلسەفی، کەشاعیر نامازەیی بۆ کردووه لەبەر هەمەکانیدا ئەویە، کە هیچ کاریک بەی هەولدا و ماندووبوون بەرەمی نابیت و هەموو کارە گەرەکان و کاری باشە بە کۆمەڵیک کۆسپ و نارەحەتی دەورەداران. کەسێک بێهۆیت سەرکەوتن بەدەستبەینیت، پێویستە هەر لەسەرەتادا رەچاوی ئەو ناخۆشی و ماندووبوونە بکات و خۆی نامادە بکات بۆ زالبوون بەسەریاندا، چونکە رێگەیی هیچ کاریکی مەزن بەفەرشێ سۆر نەرازووتەوه و گیانی لەخۆبۆردوویی و هەولێ بەردەوامیی دەوت، هەندیک جاریش هەیه، کە هەندیک کەس بۆیان رێک دەکەوت و لەسەر هەول و ماندووبوونی کەسانی تر دەخۆن و دادەنیشن و هیچ قەدری هەولەکانیشیان ناگرن:

گەر لەدەس جەوری رەقیبان من بنالم حەق نییە چونکە مەعلومە کەگۆل بوو، دائیما خاری هەیه دیوان: ۱۵۳

*** **

هەرچەندە لاشەکان وەک پەینی بەسام کەوتبوون لەژێر لقی گۆلاندە

کەچی گۆلانی بێ هۆش و نەفام تەر و تازەبوون لەسەر چالاندە دیوان: ۱۸۳

کۆمەڵیک خەلک بەردەوام نەجامدانی کارەگەرەکانیان دەکەوتە سەرشان، یان لەرووی هەستکردن بە بەرپرسبارپێتییەوه خۆیان دەبخەنە ئەستویی خۆیان، ئەوانە بە پلەیی یەکەم زانیان و رۆشنبیران و خۆیندەواران و دواتر شۆرشگیران، چونکە ئەوان پێش هەموو کەس هەست بە مەترسیەکان و پێداویستیەکانی کۆمەڵگا دەکەن، بۆیە ئەرکەکە دەخەنە ئەستوی خۆیان. پوختەیی ئەم بۆچوونەش دەتوانین لەگەڵدەگۆی ئیوان زۆراب و دەرویشەکەدا هەست پینکەین، بەتایبەت کاتیک، کە دەرویشەکە دەلێت: «ئایا مندالێکی نەفام کە لەلەیی لەگەڵدەبیت؟ شتیکی خراب بکات یا دەستی خۆی بسوتین، خۆی مەسئولە یا لەلەمە؟ تەبەیی ئەگەر بیزانیایە ناگەر دەست ئەسوتین، دەستی خۆی نەتەکرد بەناگەردا! کەوا بوو کابرای لەلە مەسئولە» (ئەحمەدموختار، ۲۰۱۰: ۴۳).

بەشێوەیەکی گشتیی دەتوانین بڵین: ئەگەر تێرمانیکی ورد بکەیت لەسەر بنەمای فەلسەفی و ژیری بەرھەمەکانی ئەحمەدموختار دا، ئەوا چەندین بنەمامان دەستدەکەوێت، کە دەتوانرێت بۆ ھۆشیار کردنەوی کۆمەڵگا و چاککردنی کاروبارەکانی ژیاینی رۆژانەیی خەلک و پەرور دەکردنی ئەو مەکانمان دەوری کاریگەر بگێرن.

۲-۱ / ئەحمەد موختار نەتەو دەست و سیاسەتمەدار: یەکێک لەو بابەتانەیی کە ھەوینی گەلێک بەرھەمی ئەدەبی و ھونەری کوردی بوو، بابەتی نیشتمانی و نەتەواپەتییە، چونکە کورد سەرەرای ئەو نەتەویەکی گەورەیی خاوەن زمان و خاکی خۆیەتی، بەلام بەدریژایی سەردەمەجیاوازمەکان لەلایەن دەوڵەتە زلھێزەکانی دەورەبەرە دەستدریژی کراوەتە سەر خاکیەکی و مافی ئەو میان پێرھوانەبێنێو، کە خاوەن کێنانیکی سیاسی سەر بەخۆ بێت، ئەو ھەش و ایکردووە رۆلەکانی کورد بەر دەوام سەنگەری بەرگری دروستبکەن بۆ پارێزگاریکردن لەخۆیان و خاکیەکیان. شاعیران و نوسەرانی کوردیش بەشێک لە بەرپرسانی ئەو بەرگریکردنە و ھاندانی خەلک بۆ رووبەر و بوونەوی دوژمنان دەکەوێتە ئەستۆیان، بۆیە ئەوانیش لەرێگەیی بەرھەمە ئەدەبیەکانیانەو پەیمانی تاپەتی خۆیانمان گەیااندووە. سەبارەت بە (ئەحمەدموختار)یش، «ئەحمەد موختار نیشتمانی پەرورەیک بوو، بەراستی کوردایەتی کردووە. عەقڵی ھیناوەتە ناو دڵ و دەرونی، بەشێکی زۆر لەشێعری تەرخانراوە بۆ مەسەلەیی رزگاری کورد و کوردستان. سۆزی دەرونی ناوھەیی تیکەل بەھیوا و نامانجی سیاسی و کۆمەڵایەتی کردووە» (مارف خەزەندەر، ۲۰۱۰: ۴۸۰)، بابەتی نەتەواپەتیی و نیشتمانی لای شاعیرانی تری کوردی لە پێش ئەحمەدموختار و دوای ئەویش دەبێت، بەلام ھەر یەکەیان بەپێی کەسایەتی و سەردەمەکیان گەرنگی تاپەتی خۆیانمان ھەیە. «راستە بابەتی نیشتمانی پەرورە دەمێک بوو لە چەند دێرێکی خانی و چەند قەسیدەیی حاجی قادری کۆبییدا خۆی نواندبوو، بەلام ئەحمەد موختار یەکێکە لەو شاعیرانەیی لەپاش جەنگی یەکەمی جیھان بناغەیی شێعری نیشتمانی پەرورە و سیاسی کوردیان دامەزراند و شێعری کوردیان لەمەیدانی سەرژمێردا بەرھەم دەکرد کە زۆر بەی بۆ نیشتمانی و نیشتمانی پەرورە تەرخان بکەن» (عەزەدین مستەفا، ۱۹۸۶: ۳۳).

ئەحمەدموختار لە بابەتی نەتەواپەتیی و نیشتمانی، تەنھا ھاوارناکات و دەردەدڵ دەرنابێت، بەلکو ھەندێکجار ھۆکاری بارو دۆخە سیاسییەکان دەخاتەر و، ھەندێکجاریش نەخەشەریگای تیکۆشان و رزگار بوون دەکێشێت، ھەر و ھا سەرکۆنەیی کەسانی خراب و بێوفا و بێباک بەرامبەر بە خاکی و نەتەوی خۆیان دەکات و لەبەر امبەردا ھەست و بیرکردنەوی خۆی دەردەبێت بەر امبەر پەرسە نیشتمانی و نەتەویەکیان. «نیشتمانی لەمێشکی شاعیر بەپانتایی ھەموو و لاتی کوردەوارییە و شاعیر مەجنوناسا نیشتمانی لەیلا سەفتی خۆی خۆش نەوێت» (وەزارەتی رۆشنبیری و لاوان، ۲۰۱۳: ۷۰). ئەگەر سەیری ناوھێرۆکی بەرھەمەکانی بکەین، ئەوا بۆمان دەردەکەوێت، کە ئەحمەد موختار ناسیۆنالیزمێکی راستەقینەییە و نەتەو و نیشتمانی خۆی لە ھەموو شتێک زیاتر خۆش دەوێت، تا ئەو رادەیی کە ھەک رابەرێکی نەتەوی لەخەمی ھەموو نەتەو مەپیدا بێت خۆی دەنوێنێت.

لەو چەند خالەیی خوار مەودا بەشێوەیەکی گشتی رۆلی کەسایەتی سیاسی و نەتەواپەتی ئەحمەدموختار بەپێی ناوھێرۆکی بەرھەمەکانی دەخەینەر و:

۱-۲ / خۆشەویستی نەتەو و نیشتمانی: بەسەر کردنیکی خێرای شێعەرەکانی شاعیر، ئەو ھەمان بۆدەر دەکەوێت، کە شاعیر تا چ ئاستێک ھۆگری نەتەو و نیشتمانی خۆی بوو و خۆشەویستی بۆ نیشتمانیەکی لە چ ئاستێکدا و چۆن بەھا دەدات بە ھەموو ئەو شتەکان کە مۆرکیکی نەتەو مەکی خۆیی پێوھە، زۆر جاریش ناوی ناھەزان و خۆفرۆشەکان بەشێوەی سوک دەھێنێت. بۆنمونە: لەدەر بڕینی خۆشەویستی خۆی بۆ نیشتمانیەکی و بایەخی شتەتایەتیەکانیدا دەلێت:

ئەگەر بێنیمەسەر خوودەیی و مەکو دنگ	دلم کون کون ببی و مەک ناوی بێژنگ
چلۆن ئەیدم بەخورمای قاچ و قول رووت	قەدی بەرزێ چنار و گوێز و ھارژنگ
***	***

لایە توخوا نامەوئ دیجلە و فورات و نیلی تو من بە فرمیسک نیستەکە تەشکیلی سەد سیروان ئەکەم
جەژنی قوربان سالی جاری خەلکی قوربانی ئەکەم بۆ و مەتەن من رۆژی سەدجار رۆحی خۆم قوربان ئەکەم
دیوان: ۸۸

*** **

رۆڵەمدوونیم بزانی شێوەنی کوردانمە بێت و تەحلیلی بکەن دیجلەش قنڤاوی وانمە دیوان» ۷۰۱

لەزۆر شوێندا، لەبەر امبەر شارستانیەت و دەسەلات و کلتوری دەولەتە زەهێزەکانی ناوچەکە، بەگرنگی و بایەخەوه باسی شتەتایبەتیەکانی نیشتمان و نەتەو مەکی دەکات، بەر ادەبەک تەنانەت شانازی بە تایبەتەندیەکانی نەتەو مەکی ستملێکراو و بێ قەوارە سیاسی دەکات و ئامادەنێبە بۆ هیچ پاساوێک و لەبەر هیچ بیانوویەک دژی خاک و نەتەو مەکی خۆی بوستیتێه، یان وازبەهێنیت لە پشٹیوانیکردنیان.

۲-۲-۱ / ئەحمەدموختار وەک سیاسەتەمدارێک: وەک باسمانکرد شاعیر تەنها خۆشەویستی خۆی بۆ نیشتمان و نەتەو مەکی دەرنابریت و بیلایبێتێه و وەسفی بکات، بەلکو وەک سیاسەتەمدارێک لەو کات و شوێنەکی کەپنویست بێت ڕەخنە لەهەلوێست و بارو دۆخیشیان دەگریت. ئەحمەدموختار لەژبانی تاییبەتی خۆشیدا، چ وەک قائیمقامی هەلەبجە، یان وەک یاریدەدری حاکمی سیاسی و ئەندام لە ئەنجومەنی نوێنەری عێراق (عەبدولکەریم حەمید، ۲۰۰۰: ۴۴)، ئەوانە هەمووی کاری سیاسی بوون کە کردوونی، بەلام ئێمە لەم لێکۆڵینەویدا خۆمان لەباسکردنی ژبانی تاییبەتی لادەدەین و خۆیندەوێهێکی بابەتیانە بۆ دەقەکانی دەکەین، چونکە ئەو بابەتیکی سەر بەخۆیە و دایدەنێن بۆ ئەو لێکۆڵەرێکیتر بەوردی ئەو بابەتە باسبکات، کە لەچاپکردنی کۆبەر هەمی ئەحمەد موختار جافدا (کاروان عوسمان، ۲۰۱۹)، تارا دەبێکی زۆر زۆریە لایەنجیاوازەکانی ژبانی تاییبەتی ڕوونکراوەتەوه

بۆنمونه لەو دێره شیعراوە خوار مەودا باسی بارو دۆخی نیشتمان و نەتەو مەکی دەکات:

بێکەس و بێ پشٹیوانن ڕینگەمان دووره وەرن حەیفە ئێوه وائەسیری دەستی چەند قەومی کەرن

بۆچی نازانی لەتوخمی کاو مەیی ئاسنگەرن هەلبێکەن کوردی ئەم ئیداره لایەرن دیوان: ۶۰۱

*** **

وەتەن فەرمووی بەخەندە ناز مەوه هەر وەک پەری و امە ئەما حەیفی کەچەند سألە ئەسیری پەنجەیی دیوم

هەمیسان پێی وتم ئەوسا، مەکانی شەخسی عاقل بووم فەقەت چیبکەم ئەمە چەند مودەتە بێ ساحیب و خێوم دیوان: ۶۸

ڕەخنە سیاسییەکانی شاعیر تەنها لەچوارچۆیەکی نەتەو مەکی کەناوە، بەلکو ڕەخنەکان ئاراستەیی سیاسەتی دەورو بەر و نیو دەولەتیش دەکات، کە ئەوانە هەموو قسە و باسبکیان لەبارە نازادی و مافی مەزۆقەرە، درۆبەکی گەورە بۆ دەستەکەوتی تاییبەتی و بەرژ مەندی خۆیان بەکار دەهێنن، ئەگەر وائەبێت، بۆچی باروخی کورد و کوردستان بەو شێو مە دەبین بەدەست داگیرکاران و زۆردارانەوه، کەچی هیچ هەلوێستێکی ئەوتویان نییە!؟

ئێسی و یجدان و عەدالەت بێ مەسەمایە و درۆ بۆ سیاسەت ئەم قسە کەوتۆتە سەر لێوانەوه

راستە گەر ئێسی عەدالەت بۆچی مەنالی کورد و ئێل و سەرگەردان بسورینۆ بەسەر کێوانەوه

دیوان ۱۳۴

*** **

خوینی چاوی کوردەکانە بۆ وەتەن شێوەن ئەکەن بۆیه وائێلاو و سوورن تانجەرۆ و سیروانەکەیی

وەعەدەیی دابوو کەدخۆشکا سەر اسەر قەومی کورد حەیفی کرد وازوو شکاندی وەعەدوو پەیمانەکەیی

دیوان: ۱۷۱

۲-۳ / ئەحمەدموختاری نەتەو پەرس (ناسیۆنالیزم): شاعیر هەندی کجارجار لەخۆشویستن و وەسفرکردنی نیشتمان زیاتر دەردەچیت و وەک کەسێکی نەتەو پەرس خۆی نمایش دەکات، کە ئامادەیه لەپێناو سەر بەستی و بەرژ مەندی نەتەو مەکید، واز لەهەموو پلە و دەستکەوتێکی تاییبەتی بەهێنیت و بەگەیی هەموو ناخۆشییەک بگریت. لەژبانی تاییبەتی خۆشیدا بەکر دەوه ئەو مەسەلماندوو، کاتیک ژبانی خۆش و خوشگوزەرائی ئێوان خێزانەکەیی، کە لەو پەری ریز و دەسەلات و ناو داریدا بوون لەناوچەکەدا واز لێدەهێنیت و ژبانی ئەشکەموت

هەڵدەبژێریت لەگەڵ شۆرشەکی شێخ مەحمود دژی رژیمی دەسلەتداری ئەوسەر دەمه (عزەدین مستەفا، ۱۹۸۶: ۲۱)، ئەم هەست و سۆزە شاعیر لەهەندیک لە شیعەرەکانیدا دەبینریت:

من که کوردم حمز به (بهرزی خاکی) کوردستان ئەکەم ئارەزووی دەوری تەرەققی حاکمی بابان ئەکەم

ناوەجاغە ئەو کەسە خزمەت بکا بۆ غەیری خۆی تابهردن شەرته من هەر بەندەیی خۆمان ئەکەم دیوان: ۸۸

*** **

مەز هەب و دینی لەقەبرا لێی بپرسن وائەلێت خاکی کوردستانە ئەحمەد مەز هەب و ئیمانەکی دیوان: ۱۷۲

*** **

داخی کوردی فەخرە ئیستە بۆ دلی من کافی یه بۆچ مەگەر شینتم خەیاڵی روتبه و فەرمان ئەکەم

کوردم و بۆ کوردی (ئەحمەد) سەعی ئەکەم تابهردن زوو ئەکەم دیوان: ۸۸

یهکێک لە جوانترین شیعەرە نەتەواوەتی و نیشتمانییەکانی شاعیر، ئەو دەقە شیعەرییەکیە (۱۹) دێرە و باسی زۆر لایەنی نەتەوایی دەکات و لەشێوهی خولیا و خۆزگەشدا گەشەکردنی داهاووی دەخاتە روو (عزەدین مستەفا، ۱۹۸۶: ۱۳۴-۱۳۵).

بەشی دووهم: بنه‌مای چاکسازی کۆمه‌لایه‌تی و ئابووری له به‌ره‌می ئه‌ده‌بی ئەحمەدموختاردا

۲-۱ / ئەحمەدموختاری دەرووناس و کۆمه‌لایه‌تی: بابەتی کۆمه‌لایه‌تی بەدریژایی هەموو قوناغەکانی گەشەکردنی ئەدەب بەگشتیی و شیعەر بەتایبەتی کەرستەیه‌کی گەرم بوو بۆ نوسەرانی و شاعیرانی. «شیعەری کۆمه‌لایه‌تی ئەو شیعەرە، کە تێیدا شاعیر بەپێی توانا کۆمه‌لایه‌تی کێشە و گرتی ناو کۆمه‌ل دەست نیشان دەکات، پەنگە هەندێ جار هەموو بەدات چارەسەر یەکێ بۆ بدۆزێتەوه» (سەعد فاروق، ۲۰۱۱: ۷۰)، بابەتە کۆمه‌لایه‌تیەکان بە رادەیه‌کی زۆر لەشیعەرەکانی ئەحمەدموختاردا دەبینریت، بەلام ئەوەی ئێمه‌ لەم لێکۆڵینەوەیدا دەمانەوت بێخەینەر، قوڵبوونەوه‌یه‌ لەبابەتەکان و خستەروویانە وەک کاری توێژەرێکی کۆمه‌لایه‌تی، ئەمەش بەدەر لەئەوه‌ی کە لەچەندین دێری شیعەردا لەسەر ئەو پێرەوه‌ کاریکردووه. پێمانە چاکیار وەکە (مەسەلە و یزدان) بەتێکراییی دەستنیشانکردن و شیکردنەوه‌ی گرتەکۆمه‌لایه‌تیەکانی ئەو سەر دەمه‌یه، کە هەندیک لەو گرتانە هەتا ئەمڕۆش لە ناو کۆمه‌لگای کوردستان و هەندیک لەکۆمه‌لگایکانی تردا بەر دەوامیان هەیه، لێرەدا چەند نمونه‌یه‌ک لەو چوار چۆنه‌یه‌دا دەخەینەر، کەتێیاندا بێرکردنەوه‌ی ئەحمەدموختار ئەوەندە قوڵە، کە لەسنوری زانیاری و کاری توێژەری کۆمه‌لایه‌تی‌دا، ئەک شاعیرێک کە تەنها ئامانجی پێشکەشکردنی بەره‌می ئه‌ده‌بی بیت.

بۆ زیاتر روونکردنەوه‌ی ئەم بابەتە له به‌ره‌مه‌کاندا، لەو خالانە‌ی خوار موه‌دا بەپێی جۆری بابەتە کۆمه‌لایه‌تیەکان، نمونه‌ی بێویست دەهێنینه‌وه:

۲-۱ / باسکردن و ناساندنی کەسایه‌تییه‌ لاواز و هەلپەرستەکانی ناو کۆمه‌لگە: هەمیشە مەروڤی هەلپەرست و دەروون نزم لەناو کۆمه‌لگەدا خاوەن کەسایه‌تییه‌کی سوک و متمانه‌ پێنه‌کراون، ئەحمەدموختاریش کاتێک باسی ئەو جۆره‌ کەسانە‌ی کۆلگە‌کە‌ی دەکات، جاری و هەیه‌ ده‌گاتە ناستی جینیو پێدان و هەجووکردنیان،

چونکہ باش دەزانی زبانی ئەوانە تەنھا بۆ کەسایەتی و ناوبانگی خۆیان نییە، بەڵکو چ بەهۆی خیانەتکردنیان بێت لەبەر امبەر دەستکەوتی تاییەتی، یان بەهۆی کاریگەری رەفتارەکانیانەو بێت، ئەوا کاریگەری لەسەر کۆی گشتیی کۆمەڵگا دروستدەکەن، واتە ئەو جۆرەکەسانە هیچ باریک لەکۆلی خەلک سوک ناکەن و خۆشیان دەبن بە کۆسپ لەبەر دەم خۆشگوزەرانە خەلک و ئامانجە نیشتمانی و نەتەوہییەکاندا:

ئەوہی بۆ پارە لایداوہ لەمەسلەک بەجێ دانیشتنی چل مێخ و سەد سنگ

وتم بەو حیزە: ئەمرو رۆژی تۆیە بخۆ، دانێ بەمەیل لنگ لەسەر لنگ دیوان: ٧٤

*** **

بیت و دەسم بەدات لەدەسی پیاوی ناومجاخ حەوجار بەناووقور دەس و پەنجەم گلاوئەکەم دیوان: ٩٠

*** **

لەدنیارە رفیقی پیاوی کەر ھەرگیز مەکە (ئەحمەد) لەدەست ئینسانی جاھیل تاقیامەت پیربەیی راکە دیوان: ١٢٥

٢-١-٢ / ناماژ مەکردن بۆ بابەتی گەندەلی: ئەحمەدموختار وەک تویژەریک، بەتاییەتی لە (مەسەلە ی وێژدان) دا بەشێوەیەکی زۆر ورد شێوازەکانی گەندەلی روونکردووەتەو، لەھەندیک شوێنیشدا چارەسەری بۆ دەردەکۆمەلایەتیەکان دیاریکردووە، بۆنمونە: کاتییک باسی گەندەلی کار بەدەستانی حکومەت دەکات لەنیش و کارەکانیاندا، کە تاج رادەیک خەلکیان چەوساندووەتەو و کاروباری خەلکیان پشتگوێ خستوو لەپیناوی دەستکەوتی تاییەتی خۆیان، بەلام کاتییک چاودیزی حکومەت دێت بۆ ناگاداری و وردبینکردن لە نیش و کارەکانیاندا، لەوکاتەدا بۆ ھەلخەڵەتاندنی چاودیزەکە ھەندیک لەنیش و کارە خراپەکانی خۆیان پینەدەکەن. کاتییک چاودیزەکە ھات: (ئەوسا کۆلانەکان پربوون لەپیی، لەتەرەف بەلەدیھە بەدەر مەجەبەیک پاکرانەوہ. دائیرە ی ئیمە کەدەفتەر و ئەساسنیکمان نەبوو، شتیکمان دروستکرد، سندوق کەخالی بوو ھەمووی درابوو بەقەرەز، پارمان بەقەرەز ھینا و خستمانە ناوی، لیباسمان کە ھەموو پیس و چلکەن بوو، لیباسی جوانمان کردە بەرمان، ئەوسا کە قەسە ی خۆشمان جینیو و شەق بوو لەگەڵ ئەھالی، ئەمجا کەوتینە میھرەبانی و زبان شیرینی) (ئەحمەدموختار، ٢٠١٠: ٤٦)، دەبینین چۆن بەوردی و واقعیی باسی ھەموو گۆرانکارییەکان دەکات، کە وەک خۆی دەوری ھەموو کاراکتەری ناو چیرۆکەکە ی بەواقعیی بینین، بەو شێوہیە خۆیندەوہی بۆ لایەنە کۆمەلایەتی و دەروونییەکان کردوہ.

نوسەر چ لە بەرھەمە شیعرییەکانیدا بێت، چ لە چیرۆکەکەیدا، ھەندیکجار شیکردنەوہی دەروونی بۆ کەسەکان و بابەتەکانیش دەکات و واقعیی شتەکان دەخاتەروو، بۆنمونە کاتییک باسی چاوپیکەوتنی ئیوان زۆراب ئەفەندی و دەرویشیک دەکات، کە دەرویشەکە لەخۆیندەوہی خۆیەوہ بۆ دەسەلات و سامانی زۆراب، باسی ئازاری وێژدان و ناارامی زۆراب دەکات، چونکە ھەرچەندە مأل و سامانی زۆر بێت، ئەوا کاتییک سەیری دەکات ھەموو ئەو ستەمانە ی بێردەکەوتنەوہ، کە لەخەلکی ھەژاری کردوہ بۆ دەستکەوتنی ئەو مأل و سامانە (ھەمان: ٤٤).

٢-١-٣ / تیروانینە ئابوورییەکان (وەک ئابووریناسیک): لەچەندین شوێنی گێرانەوہی چیرۆکی (مەسەلە ی وێژدان) دا، نوسەر شیکردنەوہی جیاواز بۆ لایەنی ئابووریی دەکات و ھەندیکجار وەک ئابووریناسیک باروودۆخەکە رووندەکاتەوہ و باسی بنەمای گەرنگی ئابووری دەکات، بۆنمونە: کاتییک باسی ژبانی ئەو دوکاندارە دەکات، کە سەرەتا زۆراب کاری لەلادەکرد، چۆن ژنی دوکاندارەکە لەخەرجکردنی پارەدا زیادەروہی دەکرد و مێردەکەشی لەبەر ئەوہی فریای ئەو خەرجیانە نەدەکەوت، بۆیە ناچار لەکرین و فرۆشتندا غەشی لەخەلک دەکرد (ھەمان: ١٨)، دەبینین نوسەر باسی لایەنیکی ئابووری دەکات، کە ئەویش کورتھێناتی بوودجە، خەرجی زیاترە لە دەستکەوت.

ھەر و ھا باسی زیادکردنی قازانج و گەشەکردنی ئابووری و بونیادنانی پیشەسازی دەکات، ئەو ھوش کاتییک لە بەزمانی زۆرابەوہ پشینیاری دروستکردنی کارگە ی جگەرە دەکات بۆ خاوەن کارەکە ی و ئەوہی بۆ رووندەکاتەوہ، کە دەستکەوتی ماددی زیاددەکات و ئەو بەروبوومە ی کە خەلکەکە دەپیننەبەر ھەم لەبری ئەوہی بیفرۆشن بەکەسانێتر و بیری ت لە شوینیتر بخریتەپیشەسازییەوہ، دەتوانن خۆیان سودی لیبینن و لەگەرگەدا ببخەنە بواری پیشەسازییەوہ (ھەمان: ٢٦).

ھەر و ھا نوسەر زۆر بەوردی و جوانی باسی ھەلسوکەوت و لایەنی دەروونی بازەرگان دەکات لەکاتی مامەلە ی

عەشقیکی مەجازیی بێت. شاعیر باسی حالەتی عاشقیی راستەقینە دەکات، بێماکانی عەشقیکی دەخاتەر و، کە چینی و چۆنی؟ بۆ نمونە لەدێرێکدا دەلێت:

گەدایی و سۆالکەری بەر مالمەکی، دەسم کەوێ رۆژی خۆنەیکا کەمەن بیدەم بەتەخت و تاجی سۆلتانی دیوان: ۱۷۶
شاعیر نامازە بۆ بێماکی گەرنگی عەشق دەکات، کە ئەویش رەزەمانەندی و نزیکییە لە مەعشوقە، کە بەلای عاشقی راستەقینە ئەو لە هەموو شتێک گەرنگترە و بەهیچ دەستکەوتێکتر بەر اوارد ناکرێت، چونکە ئەو ئەسودەیی و ئارامی بەگیان و دەروونی مەعشوق (تەحسین حەمەزەب، ۲۰۰۷: ۲۵)، هەر لەسەر هەمان بێما، کە هیچ ئێش و نازار و ناخۆشییەکی هێندە دووری مەعشوق سەخت نییە، و بەیچەوانەشەو ئەگەر مەعشوق نامادەبێت، ئەو هەموو نازار و نارەحەتیەکان ئاسانتر و سوکتر دەبن و خیراتر تێدەپەرن. شاعیر دەلێت:

نەخۆشی خۆشترە لای من لەساغی و سیحەت ئەی جانا

ئەگەر بەک هەفتە جاری بێی بپرسی چۆنە ئەحوالت دیوان: ۶۵

شاعیر تەنها بەبەسکردنی بێماکانی عەشقی راستەقینە ئەو ئەستاو، بەلکو بە وردی پێناسەیی کەسی عاشق دەکات و شیکردنەو بۆ هەست و سۆز و بیروباوەری دەکات لەبەر مەبەس مەعشوقەکەیدا. وەک ئەو دوو نمونەیی خوارەو:

رەسمی عاشق واز لەرۆح هینانە بۆ دلداری خۆی روروشم گەر من لەریتا تەری رۆح و سەر نەکەم

بێت و بۆم دەس دا تەماشای پەرچەم و روخساری تو شینم ئەر تەری و نەوشە و لالەیی ئەحمەر نەکەم دیوان: ۸۵

*** **

مردن و سووتان و قوربانی و زەیفەیی (ئەحمەد) تەری سەرکردن لە عەشقا چاومەکم کاری منە دیوان: ۱۵۸

نەجام

بەر هەمی ئەدەبی ئەحمەدموختار جاف، تێکرا بانگی هۆشیاری کۆمەڵگایە و ئاراستەکردنە بەر مو بێما بالاکانی پیشکەوتن و پەروردە تاکەکان لەسەر چاکەخوازی و خوشەویستی نیشتمان. شیعەرەکانی ئەحمەدموختار جاف پێر لەبێنەمای فەلسەفی و دانایی و بەرچاوری، کە دەتوانرێت بکڕین بە بێنەمای پەروردەیی بۆ کۆمەڵگا و نەوێ ئیستا و داهاووش.

ئەحمەدموختار جاف بەواتای وشە کەسیکی رۆشنبیربوو و لە زۆربەیی زانستەباوەکانی سەردەمی خۆیدا شارەزایی زۆرباشی هەبوو و شارەزایییەکی لە بەر هەمەکانیدا رەنگیداو ئەتەو. بەر هەمەکانی تۆماریکی میژوویی نین، بەلکو کاتییک خۆینەر دەیانخویننەو، و هەستەدەکات لەرۆژگاری ئەمڕۆدا نوسراون و باسی دەردە کۆمەڵایەتی و سیاسی،،، رۆژگاری ئەمڕۆ دەکات و چارەسەریان بۆ دادەنێت.

لە چیرۆکی (مەسەلەیی و یزدان)دا، ئەحمەدموختار جاف بەروونی داوای شۆرشیی هۆشیار بوونەو و چاکسازی کۆمەڵایەتی و سیاسی و ئابووری لە مێللەتەکی دەکات. ئەحمەدموختار، رۆداووە کۆمەڵایەتی و جۆلەیی کەسایەتیەکانی ناو چیرۆکەکی بەشیوێهەکی دارشتوو، کە وەک تۆیژەریکی کۆمەڵایەتی و دەروونناسیک، شارازایانە رۆداووەکانی گێڕاوتەو.

سەرچاوهكان

- ئەحمەد بەگی و سمان پاشا دیوانی ئەحمەد موختار جاف، نامادەکردن و بەراوردکردن و لیکدانەوه و پێشەکی بۆنووسینی د. عیزەدین مستەفا رەسوڵ، چاپخانەی الادیب، بەغدا، ۱۹۸۶.
- ئەحمەد موختار جاف، مەسەلەی وێژدان، چاپی ستیەم، چاپخانەی ئاراس، هەولێر، ۲۰۱۰.
- تەحسین حەمەزەب، دڵ و چاو، چاپی یەكەم، چاپخانەی یاد، ۲۰۰۷.
- رەفیع حیلەمی، شیعەر و ئەدەبیاتی کوردی، چاپی دووهم، چاپخانەی ئاراس، هەولێر، ۲۰۱۰.
- سەعد فاروق شێخ بزینی (مامۆستا)، بنیاتی هونەری لەشیعەری ئەحمەد موختار بەگی جافدا، چاپی یەكەم، چاپخانەی رۆشنبیر، هەولێر، ۲۰۱۱.
- عەلەددین سەججادی، میژووی ئەدەبی کوردی، چاپی یەكەم، انتشارات کردستان، سنه ۱۳۹۱.
- عەبدولکەریم حەمید عەبدوالکەریم، ئەحمەد موختار بەگی جاف-شاعیر و مەزەن- دەزگای چاپ و پەخشێ سەردەم، سلێمانی، ۲۰۰۰.
- کاروان عوسمان خەیات، کۆبەرەمی ئەحمەد موختار جاف، چاپی یەكەم، ئینتشاراتی کردستان، سنه ۲۰۱۹.
- مارف خەزەندەر (دکتۆر)، میژووی ئەدەبی کوردی- بەرگی پینجەم، چاپی دووهم، چاپخانەی ئاراس، هەولێر، ۲۰۱۰.
- هێمن کریم (دکتۆر)، رۆونبێژی لەشیعەرەکانی ئەحمەد موختار جافدا، چاپی یەكەم، چاپخانەی رێدار، ۲۰۲۱.
- هێمن کەریم، لیکدانەوهی هێماکانی چاو و پەبووستەکانی لەشیعەری حەفەز و ئەحمەد موختار جافدا (لیکۆلێنەوهیەکی بەراوردکارییە)، دووهمین کۆنفرانسی هابەشی نیودەهۆلێتی تووژینەوهی زمان و وێژە کوردی و فارسی (زمان ناسی و بووتیقا)، ۹-۲۰۱۹/۶/۱۰، زانکۆی کردستان سنه.
- و مزارەتی رۆشنبیری و لاوان، دیداری تاییەت بە شاعیر ئەحمەد موختار جاف، (6)نوسەر، چاپی یەكەم، چاپخانەی کاردۆ، سلێمانی، ۲۰۱۳.

گۆفارهكان:

گۆفاری زانکۆی سلێمانی، ژمارە (۵)، سالی ۱۰۰۲.

govara kurdinameye ya navnetewei، ژمارە ۵، تۆفەمبەری ۱۲۰۲.

سایتی گۆفاری کۆچ، <https://govarikoch.com/>، ۲۲۰۲/۰۱/۹۱.



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 7

e-ISSN 2717-8315

DOI: 10.55118/kurdiyat.1296638

Rûpel/Sayfa Page: 59-73



Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Geliş Tarihi/Received:13.05.2023
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted:
10.06.2023
Tahsin İbrahim Doski, Araştırmacı Yazar, MEB
Duhok.
tahsin.doski92@gmail.com
Orcid: 0009-0000-3052-8349

Atrf: Doski. T. İ. (2023). "Mela 'Ebdirrehîmê Westanî
û Şerha Wî li ser Dîwana Melayê Cizîrî", Kurdiyât,
7, 59-73.

Citation: Doski. T. İ. (2023). "Mullah 'Abd al-Rahim
Wastanî and his Sharh on the Mullah Ahmad al-
Jazeri's Dîwan", Kurdiyât, 7, 59-73.

MELA 'EBDIRREHÎMÊ WESTANÎ Û ŞERHA WÎ LI SER DÎWANA MELAYÊ CİZÎRÎ

Tahsin İbrahim DOSKÎ

Kurte

Dîwana Melayê Cizîrî yek ji şaheserên edebiyata kurdî ya klasîk e û di medreseyan de hatiye xwendin. Ji ber vê yekê gelek alim û edîben kurdan li ser *Dîwana* Melayê Cizîrî şerh nivîsine. Yek ji wan şerhan jî ya Mela 'Ebdirrehîm (1894-1956) ye ku ew jî Westana Wanê tê dinyayê. Şerha Mela 'Ebdirrehîmê Westanî heta roja îro wek destnivîs veşartî maye û di alema zanistî de nehatiye niyasîn. Westanî şerha xwe bi sê zimanan an ku bi erebî, fârisî û tirkîya osmanî nivîsiye û di şerhê de gelek haşîye û tarîx danîne. Mijara vê nivîsarê nasandina Mela 'Ebdirrehîmê Westanî û şerha wî ya li ser *Dîwana* Melayê Cizîrî ye. Em hêvî dikin ku bi vê nivîsarê şerha Westanî dê di lîteratura edebiyata kurdî ya klasîk de zêde bibe.

Peyvên Sereke: Şerha metnan, Melayê Cizîrî, Dîwana Melayê Cizîrî, Mela 'Ebdirrehîmê Westanî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî.

Molla Abdurrahim-i Vestanî ve Molla Ahmed-i Cizîrî Divanî Şerhi

Özet

Molla Ahmed-i Cizîrî'nin *Divan*'ı, klasik Kürt edebiyatının başyapıtlarından biridir ve klasik Kürt medreselerinde okutulmuştur. Bu nedenle birçok Kürt alim ve edip, Molla Ahmed-i Cizîrî'nin *Divan*'ını şerh etmişlerdir. Bu şerhlerden biri de Van'ın Gevaş ilçesinden olan Molla Abdurrahim-i Vestanî (1894-1956) şerhidir. Molla Abdurrahim-i Vestanî'nin yazmış olduğu şerh bugüne kadar elyazması olarak saklı kalmış ve bilim dünyasında tanınmamıştır. Vestanî kitabını Arapça, Farsça ve Osmanlı Türkçesi olmak üzere üç dilde yazmış ve şerhinde çokça haşiyeler ve çeşitli tarihler kaydetmiştir. Bu yazının konusu Molla Abdurrahim-i Vestanî ve onun Molla Ahmed-i Cizîrî *Divan*'ına yazmış olduğu şerhin tanıtılmasıdır. Umarız ki bu makaleyle sözkonusu şerhin Klasik Kürt Edebiyatı literatürüne eklenmesine ve tanınmasına katkıda bulunuruz.

Anahtar Kelimeler: Metin şerhi, Molla Ahmed-i Cizîrî, Molla Ahmed-i Cizîrî Divanı, Molla Abdurrahim-i Vestanî, Ahmed-i Cizîrî Divanı şerhi.

Mullah ‘Abd al-Rahim Wastanî and his Sharh on the Mullah Ahmad al-Jazeri’s Dîwan

Abstract

Mullah Ahmad Jazeri’s *Dîwan* is one of the masterpieces of classical Kurdish literature and was taught in classical Kurdish madrasas. For this reason, many Kurdish scholars and litterateurs have written many *sharhs* on Mullah Ahmad Jazeri’s *Dîwan*. One of these *sharhs* is that of Mullah ‘Abd al-Rahim Wastanî (1894-1956) from the Wastan/Gevaş district of Van. The *sharh* written by Mullah ‘Abd al-Rahim has remained hidden as a manuscript until today and has not been recognised in the scientific world. Wastanî wrote his book in three languages, Arabic, Persian and Ottoman Turkish, and recorded many notes and dates in it. The subject of this article is to introduce Mullah ‘Abd al-Rahim Wastanî and his *sharh* on the Mullah Ahmad Jazeri’s *Dîwan*. We hope that this article will contribute to the inclusion and recognition of this *sharh* in the literature of Classical Kurdish Literature.

Keywords: Literary sharh, Mullah Ahmad Jazeri, Mullah Ahmad Jazeri’s *Dîwan*, Mullah ‘Abd al-Rahim Wastanî, Sharh on the Jazeri’s *Dîwan*.

Destpêk

Mela 'Ebdirrehîmê kurê 'Ebdirrehmanê Westanî (1894-1956) yek ji wan zana û edîb û şa'irên kurd e yên jîyê xwe di xizmeta edebîyata kurdî da borandîn û berhemeka hêja pêşkêşî rewşenbîrîya kurdî kirî. Belê ji ber mana berhema wî di nav berperên tozgirtî yên destnivîsan û neçapbûna wan heta evro jî ev edîb û zanayê me wekî hêjayîya xwe nehatîye nîyasîn. Di vê nivîsîna xwe da me divêt wî bi kurtî bideyne nîyasîn û çendekê li dor yek ji hêjatîrîn karên wî yên edebî biaxivîn ew jî şerh û te'liqatên wî ne li ser *Dîwana Melayê Cizîrî*.

Wekî tete zanîn Melayê Cizîrî serkêşê alaya şî'ra kurdî ye û dîwana wî navdartîrîn dîwan û berhema edebî ye bi zimanê kurdî hatîye nivîsîn û nêzik e bibêjîn, şa'irekê klasîkê kurmanc nîne piştî Cizîrî hatibe û *Dîwana Cizîrî* kar lê nekiribe. Her ji ber vê çendê bûye her di kevn da û hêsta li ser demê Cizîrî bi xwe pitir ji şa'irekî kar bo hindê kirîye ku derbirîne ji î'caba xwe bi şî'rên Cizîrî bi rêka texmîskirina hindê ji wan şî'ran biket û piştî Cizîrî jî gelek zana û edîban hizir di hindê da kirin ku hindê şî'rên Cizîrî yan jî *Dîwana* wî hemîyê şerh bikin û alozîyên wê li ber xwandevanan vekin, da ew pitir xweşîyê pê bibin û tamê jê wergirin. Li dû zanînen heta evro gehîştîne me, em dişên bibêjîn, hizra şerhkirina şî'rên Melayê Cizîrî cara êkê bo hindê zanayên devera Badînan (li dûmahîya sedsala 18ê û destpêka sedsala 19ê zayîni) dizivire.¹ Li vêrê bi tinê dê îşareteka kurt bidim navên hindê ji wan zanayan:

1. Çend Şerhên Dîwana Melayê Cizîrî

Heta roja îro gelek şerh li ser *Dîwana Melayê Cizîrî* hatine nivîsîn. Hinek ji wan bes li ser çend xezel û qesîdeyên wî hatine nivîsîn û hinek ji wan jî bi temamî li ser *Dîwana* wî hatine nivîsîn. Li jêrê em ê behsa çend şerhên sereke bikin.

1.1. Mela Cercîsê kurê Mela Mihemedê Erbîlî

Ew ê li bajêrê Erbîlê hatîye ser dinyayê û li wêrê mezin bûyî û feqîyatî li nik gelek seydayan kirî heta dûmahîyê îcaza melatîyê li bajêrê Bexdayê ji Mela Sibxetullahê Heyderî wergirtî. Vî zanayî bo demekê li bajêrê Erbîlê melatî kir, paşê li sala 1180yî mişextî qeşa Mûsilê kir û li wêrê bû mela û ders dane feqîyan, paşî zivirî Erbîlê û piştî demekê dubare zivirî Mûsilê û vê carê dîroknivîsê mûsilê yê navdar Mihemed Emînê 'Umerî ders li nik wî xwandin û bo demekê qeşa bajêrê Akreyê kir û li wêrê karê melatî û dersdanê kir piştî mirina zanayê Mûsilê yê mezin Şêx Mûsayê hedadî li sala 1186an mezinê Mûsilê Suleymanê Celîlî ew daxwaz kir û li şûna Şêxê Hedadî deyna û bo demekê ew xutbexwîn û seyda bû li medreseya Mihemed Paşayê Celîlî li Mûsilê her wesa wî melatî li mizgefta Zewrayê jî kiribû. Li sala 1161an çûbû Hecê û li sala 1026/1791ê li Mûsilê çûbû ber dilovanîya Xudê. Li sala 1185ê Mişextî demê ew li Akreyê wî kitêbek bi navê *el-Rîsâlete'l-Fethîye* bi zimanê farisî bo hakimê Akreyê Fethullah Paşayî nivîsî tê da şerha xezeleka Melayê Cizîrî kir ewa li despêkê dibêje:

Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûs

Lê ne bê faîde azarî nedet xarê hudûs

1 Ji bo listeka berfireh bnr. Adak, A., Acar, H. û Aykaç, Y. (2017), "Bibliyografyaya Melayê Cizîrî", *Mukaddime*, cilt 8, jimar 3, Hejmara Taybet - Melayê Cizîrî, r. 180.

Divêt em vê jî diyar bikin, hindî me zanî -heta vê gavê- eve yekemîn zana ye şî‘reka Melayê Cizîrî şerh kirî.

1.2. Mela Yehya kurê Xalidê Baleteyî yê Mizîrî

Zanayê mezin ê devera Badîna û seydayê zanayên ‘Îraqê hemî ew ê nav û dengên wî ji hindê belavtir ku hewceyî bi hindê hebe em wî bideyne nîyasîn. Li sala 1222/1808ê û li ser daxwaza Zubeyr Paşayê kurê Îsma‘îl Paşayê Mîrê Amêdîyê, wî şî‘ra Melayê Cizîrî “Muxbeçeyên Mey-firoş” bi farisî şerh kirîye.

1.3. Mela Salihê kurê Mela Cibraîlê kurê ‘Usmanê kurê Husênê kurê Xasê Siracîyê Akreyî

Jîyana wî bi berfirehî me nezanîye, belê ji hindêk destnivîsan tete zanîn ku ewî li bajêrê Mûsilê û Akreyê xwandina xwe wergirtîye. Wî du şî‘rên Melayê Cizîrî bi zimanê farisî şerh kirîne. Yek şî‘ra “Tu sehergeh were bazarê hudûs” û ya di “Sirrê wehdet ji ezel girtîye hetta bi ebed”. Wî ew li serdema mîrê Amêdîyê Zubeyr Paşayê kurê Îsma‘îl Paşayê kurê Behram Paşayî nivîsîne li sala 1227/1812ê.

1.4. Seyîd Ehmedê Gelîrmanî

Jîyanî wî jî me bi berfirehî nezanîye. Wî jî şî‘ra Melayê Cizîrî “Ismê te ye mektûb” bi farisî şerh kirîye û wekî ji gotina wî diyar dibe wî ev şerhe li ser daxwaza Şêx Nûreddînê Birîfkî danaye. Her weha tete gotin ku Şêx Nûreddîn Xezûrê wî bû.

1.5. Şerha Şî‘ra “Bi husna ehsenu’t-teqwîm”

Ev şerhe bi zimanê ‘erebî ye, belê mixabin xwudanê wê nehatîye nîyasîn, belê ew jî her li naverasta sedsala 13ê mişextî (nîveka yekê ji sedsala 19ê) bû. Piştî vê desteka zanayan li dû agehdariyên me li nîveka yekê ji sedsala biştê zayînî hizira şirovekirina Dîwana Melayê Cizîrî li nik hindêk zanayên devera Cizîra Botan peydabû û di dîroka edebîyata kurdî da ji tiştên aşkera ye ku Mela ‘Ebdisselamê Cizîrî (1878-1952) û Mela Ehmedê Zivingî (1893-1971) ji wan zanayên Botanî bûn yê her yekê şerheka hêja bi zimanê ‘erebî *Dîwana* Melayê Cizîrî danayî. Ji ber ku her du şerhên wan di çapkirî ne ew yê hatîne nîyasîn, lew hewce naket em behsê wan bikin. Belkî yek ji zanayên hevçax bo wan û tîkelî di gel wan heyî û wekî wan (û berî wan jî) xem ji şerhkirina *Dîwana* Melayê Cizîrî xwarî û heta niha nehatîne nîyasîn Mela ‘Ebdirrehîmê Westanî ye, ew ê şerha wî mixabin heta evro jî di nav destnivîsa xwe da veşartî mayî.

2. Kurtejiyana Mela ‘Ebdirrehîmê Westanî

Navê wî Mela ‘Ebdirrehîmê kurê ‘Ebdirrehmanê kurê Îbrahîmê kurê Yûsîfê Westanî ye. Westan [Gevaş] wekî hindêk caran bo diête gotin, bajêrkekê navdar ê devera Wanê ye, dikeve başurê Behra Wanê û berê li serdema mîrnişînên kurdan ew yek ji cihên giring ên mîrên Hekarê bû û hingê ew bi ser Culemêrgê ve bû.

Mela ‘Ebdirrehîm li sala 1894ê zayînî li Westanê hatibû ser dinyayê. Lew dibêjinê Mela ‘Ebdirrehîmê Westanî û her li wêrê wî dest bi xwandina melatîyê kiribû, paşê piştî demekê ew çûbû Wanê û li nik zanayên wê jî bo demekê xwandina xwe bi rêve bir. Demê Şerê Cîhanî yê Yekem li

sala 1914an rû dayî û devera Serhedê tûşî şer û xela û celayê bûy, Mela 'Ebdirrehîm -û hingê jîyê wî li dorên bîst salîyê bû- ji devera xwe mişext bû û ber bi Cizîra Botan ve hat û li wêrê xwandina xwe timam kir. Paşê wî li Cizîrê li nik komeka seydayên mezin 'ilmê şer'î û tesewifê wergirt. Ji wan seydayan, Mela Mihemed Se'îdê Cizîrî ew ê bi nasnavê "Şêxê Meczûb" diête nîyasîn û Mela 'Ebdisselam Nacîyê Cizîrî û Şêx Se'îdê Cizîrî ew bi nasnavê "Şêx Seyda" diête nîyasîn. Piştî wî xwandina xwe bi dûmahî înayî û îcaze standî, dest bi karê melatîyê kir û li sala 1949an bi rengekê resmî wek Mela ji layê hukûmetê ve hate damezrandin û bû melayê Mizgefta Mushefa Reş li Cizîra Botan.

Ji bilî seydayên wî yên rêzê ew ên me navê hindekan înayî, ew yek ji şagirdeyên Mela Se'îdê Kurdî jî bû ewê bi nasnavê Bedî'uzzemanê Nûrsî diête nîyasîn û seydayê Mela Se'îd di mulheqê *Emîrdaxê* [Emirdağ Lahikası] da navê wî tîne û dide aşkerakirin ku ew yek ji telebên wî yên kevn e (Nursî, 2011: 321).

Ji bilî zimanê kurdî wî zimanê 'erebî û farisî û osmanî jî dizanî. Li sala 1956ê zayînî li bajêrê Cizîra Botan yê çuyî ber dilovanîya Xwudê.² Ji berhema Westanî hatîye zanîn ev in ku hêştta çî berhemên wî nehatîne çapkirin.

1- Kitêba Dilaîle'l-Sibyan.

2- Şerh û te'lîq li ser *Dîwana* Melayê Cizîrî (bi 'erebî, farsî û tirkî).³

3- Komeka şî'ran.

3. Şerha Mela 'Ebdirrehîmê Westanî bo Dîwana Cizîrî

Ji bilî ku Mela 'Ebdirrehîmê Westanî mirovekê zana bû bi 'ilmê melatîyê û şareza bû bi terîqetê û ji bilî ku wî jîyana xwe hemî di gel melayên medreseyê û şêxên tesewifê biribû serî. Ew edîb û şa'îrekê jêhatî jî bû û hejmareka seyda û hevalên wî yên wî peywendî pê ve heyî jî li demê xwe li Cizîrî her bi vî rengî bûn wekî Şêxê Meczûb, Şêx Mihemed Se'îdê Cizîrî û Mela 'Ebdisselamê Cizîrî hwd. Melatî, sûfîyatî û şa'îrîya Westan, her wesa jîyana wî li Cizîrê nêzik ji cih û şunwar û nefesa Melayê Cizîrî, yeka hind ji wî çekiribû ku ew xwe wek feqî û murîdekê Melayê Cizîrî bizane. Vê çendê her zû ew pal dabû ku xemê ji şî'ra Melayê Cizîrî bixwe û li dû daneyên dîwana wî yên destnivîs bigere û daneyan bi rêkûpêktir û timamtir bo xwe berhev biket û bi destê xwe binivîse. Piştî hingê bîr û boçûnên xwe û hizir û dîtinên xwe li dor pitir cihan ji dîwanê car wek haşîye û dehmen li dewr û berên dîwanê, car jî li ser hindek berperên cuda binivîse, heta dûmahîyê ew berperên wî berhev kirin geştiyê 387 berperan. Di encamê da daneyeka dî ya tîr te'lîq û haşîye ji *Dîwana* Melayê Cizîrî ji layê wî ve hatîye amadekirin.

Ew bi xwe Mela 'Ebdirrehîmê Westanî di jîyana xwe da pitir ji daneyekê ji *Dîwana* Melayê Cizîrî nivîsîye û pitir ji daneyekê bi xetê wî di pertûkxaneyê me da heye. Belê demê em wê daneyê dixwînin ya wî bi haşîye û şerh û te'lîq ve nivîsî, ya ku me divêt li vîrê bi berfirehî bidine nîyasîn, bo me aşkera dibe ku wî ev berhema xwe li Remezana sala 1353/1934ê danabû, li serdemê hukûmeta Mîstefa Kemal Paşayî ew ê zordarîyeka ducarkî li mizgeft û medreseyên kurdan û xelkê wan kirî. Carekê ji ber ku ew kurd in û carekê ji ber ku ew musulman in û daxwaza şerî'eta

2 Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. A. Bingöl (2008), *Kulîlkên Baxê Botan*, Diyarbekir: Enstîtuya Kurdî ya Amedê, r. 117-118.

3 Kopyeyeka vî destnivîsê me ji Prof. Dr. Abdurrahman Adak wergirtiye. Kitêb bixwe di pirtûkxaneyê taybet a Abdullah Yaşın da ye.

Xwudê dikin. Li wê demê dinya li Mela 'Ebdirrehîmî -û yên wekî wî- hatîye êk ji ber melatî û kurdîniya wî, wî penaya xwe bire ber *Dîwana* Melayê Cizîrî. Li dîwana wî xemên demê xwe yê tijî nexweşî verevandin û ji bilî tengavîya mezin ewa bi ser milletî da bi giştî hatî, wî demî tengavîyeka taybet hebû Mela 'Ebdirrehîmî tê diborî, ew jî mirina kurê wî Mehemedî bû, di ser û berekê hosa da wî dest bi nivîsîna vê berhema xwe kiribû. Her çend e Mela 'Ebdirrehîmî feqîyê Mela 'Ebdisselamê Cizîrî bû, xwudanê şerha Dîwana Cizîrî ya navdar. Belê, li dû vê dîrokê hizira me pitir bo hindê diçe ku wî berî seydayê xwe hizira nivîsîna şerha dîwanê kirbe, her çend e me bi durîstî nezanîye kanê Mela 'Ebdisselamî li çi demî şerha xwe danaye, her çend e hizir pitir bo hindê diçe ku piştî ew mişext bûyî Sûrîyê li sala 1933an wî şerha xwe danabe.

Mela 'Ebdirrehîm li pitir ji cihekî, û bi pitir ji manekî, behsê dîrok û kawdanên nivîsîna dîwanê diket wekî li cihekî dibêje:

فالمرجو من الإخوان أن لا يجعلوني هدف الاعتراض والملام، لأنني كتبت بقلب حزين و عين باك، و بالقلم الشلل و العقل الأخل و القلب الدغل، و فراق ثمرة فؤادي محمد، و تشنتت حالي، و النوائب و الوجعان و الضرب و المصائب التي ظهرت في عصر حكومة كمال باشا الذي أعمل على العباد ما شاء من البدائع و القتل و الضرب، و إنني ما داخلت فيه إلى الآن لكن لمنفعة الإخوان و شوقا لعدم انهدام آثار ملا أحمد قدس سره على كل حال كتب له.

Her weha li cihekê di dibêje:

صححت هذا الديوان على النسخة القديمة الموجودة المكتوبة في عصر حكومة عز الدين شير بك أمير الجزيرة العمرية وهي النسخة التي كتب على يد ملا محمد سعيد المزوري يحيى أفندي زاده غفر الله لهما و لوالديهما أمين. در سنه هزار و دو صد و شصت و هشت از هجره خير الأنام عليه أفضل الصلاة و السلام سنة ١٢٢١ هـ رجب في (١١) تمام كتاب ديوان حضرة محبوب حق و مجذوب مطلق طائر كركره أوج فصاحت بلبل گلبن چمن ملاحندليب مدح سراي شاهد معني طوطي شكر لشكر حقائق رعنا شيخنا و مرشدنا الشيخ أحمد الجزري قدس الله سره و عم خيره و بره نفعنا الله تعالى من بركاته...

Ji vê gotina wî diête zanîn ku yek ji jêderên wî daneya xwe ji dîwanê di gel hevberkirî û bo serrastkirinê mifa jê dîtî, ew dane bû ya şa'irê Badînî yê navdar Mela Mihemed Se'îd Mihrî (nevîyê Mela Yehyayê Mizûrî) li 11ê Receya sala 1268ê mişextî (1/5/1852) li Cizîrê nivîsî, li serdema Mîrtîya Êzdînşêr Begê Botanî. Her dîsa li dûmahîya destnivîsa Mela 'Ebdirrehîmî îşaretê didete wan nexweşî û tengavîyan yên wî demî heyîn ji ber hukûmdarîya Kemal Paşayî û dibêje:

قد تم ديوان المجذوب الحق، المحروق في العشق الأزل، العاطش لنور جمال لم يزل، ملا أحمد الجزيري، قطب الدين و سلطان العاشقين، قدس الله أسرار العزیز، اللهم ارض عنه كما يحب، على يد أحقر الوری المنذب الطامع للعفو والدعاء، عبد الرحيم بن عبد الرحمن الوسطاني في بلدة الجزيرة العمري في سنة ١٣٣١ من الهجرة النبوي في عصر حكومة كمال باشا

صبت علينا مصائب لو أنها صبت على الأيام لصرن لياليا

فافهم أه أه

Her wekî wî bi vê beyta şa'irê ya dûmahîyê divêt bi rengê nepenî bibêje, hukûmeta Kemal Paşayî musîbeteka mezin e bi ser me da hatî, û li cihekê di jî her îşaretê didete vê meselê, demê dibêje:

كتبت في كم سنين، و ربطت الحواشي و الزوائد بها مع دم كبدي و دموع عيني، و نزول المصائب علي و على زماني لا تضبطه الدفاتر، الحكم لله القادر، أه من الموت، يا سابق كل فوت، ارحم بجلال وجهك الكريم، و بكلامك القديم، و ببرهانك العظيم على عبدك الضعيف عبد الرحيم سنه ١٩٥٣.

Dîyar e piştî Mela 'Ebdirrehîm ji nivîsîna dîwanê bi dûmahî hatî, ji nû yê deşt daye dana haşî-ye û te'liq û şerhan li ser gelek cihan ji dîwan û li wan cihên te'liqa wî ya dirêj wî hindek perên cuda bi kar înayîne û dayîne di gel dîwanê û hindek caran jî wî hindek perikên biçûk û qedên kaxezan jî bi kar înayîne.

Mela 'Ebdirrehîmî haşîye û dehmenên dîwanê bi sê zimanan nivîsîne. Lew berhevkirina vê berhemê bo çapê kesekê wesa pê divêt van her sê zimanan bizane û demê mirov şerh û te'liqên Westanî li ser dîwanê dixwîne û hevber diket di gel şerha Mela 'Ebdisselamî û Zivingî mirov tê diîne der ku ew di têgehiştina xwe da kûrtir bûye û gelek meseleyan ew pitir li dû çûye. Belê kêmasîya wî ew e wî şerheka timam nenivîsîye ku hemî cihên dîwanê verbigire, belkî wî hindek te'liqên cuda cuda li ser hindek cihên dîwanê danayîne.

4. Deştivîsa Mela 'Ebdirrehîmê Westanî

Mela 'Ebdirrehîmî çend tişteken di yên bimifa di deştivîsa xwe de nivîsîne. Bo nimûne, li serê wê çend berperek li dor kêş û weznên şî're nivîsîye û her kêşekê hindek nimûne bo înayîne. Ji bilî behrên 'erûzî yên behs jê kirî wî behsê rengên meqaman jî kirîye. Aşkera diket ku bi serbor hatîye bineciherkirin ku her şî'reka Melayê Cizîrî demekê rojê bo xwandina wê heye; da karlêkirina wan li ser guhdaran pitir be. Der bareyê vê çendê ew bi 'erebî dibêje:

اعلموا يا أيها الإخوان كما أن كل بيت من هذا الديوان له نظم من علم العروض من الأوزان المقبول، كذلك لقراءتها وقت و ساعة خاص بها، بحسب علم الموسيقى كما جرب و زاد التأثير للمستمعين، مثلا: فعول مفاعيل من أوزان العروض له ساعة زحل، مستقلن فاعلن له ساعة مشترى...

Her wesa wî li hindek cihan hindek mifayên cuda cuda jî qeyd kirîne, li dor dîroka mirina hindek kesan yan rûdana hindek qewmîyan. Wekî bo nimûne li cihekî behsê wê dîrokê diket ya ku li ser kêlîya Mem û Zînê li Cizîrê hatîye nivîsîn û dibêje:

تاريخ مم و زين المتوفيان بالجزيره في زيرداب تحت مدرسة أمير أبدال في جنب المقبرة من طرف الغرب وكان مكتوبا على الحجر المنصوبان عند رجليهما توفيت فلانة في سنة أربعة و خمسين و ثمانمائة، في جانب الشمال من الجدار و قدامهما كذلك كتب على الحجر: توفي كلاهما في يوم الإثنين في سنة أربعة و خمسين و ثمانمائة. هذا ما رأيناه و كشفناه برأي العين فيكون في عصري ١١٥ سنة وفاتهما. وأنا المذنب عبد الرحيم الوسطاني الساكن بالجزيرة ٤٥٣١.

يا ناظرا فيه سل بالله مرحمة على الشهيدين واستغفر لكتابه.

Li ser te'liqên Mela 'Ebdirrehîmî hejmareka dîrokan diêne dîtin. Ew jî eve ne, 1353, 1366, 1371 û 1375. Ji vê diête zanîn ku heta wê sala ew tê da mirî jî hêsta wî te'liq lê zêde dikirin. Li dûmahîya deştivîsê jî Mela 'Ebdirrehîmê Westanî çend perper li dor şerha hindek zarav û muştelihatên Dîwana Cizîrî berhev kirîne, wek ferhengokeka biçûk û ew di şerha xwe da bo van peyvan li dû rêbaza sûfîyan çûye.

5. Şî'reka Şêx Mihemed Tahirê Maî

Ji mifayên ku di deştivîsa Mela 'Ebdirrehîmî da bi ber çavên me dikevin, ew e wî şî'reka farisî ya Şêx Mihemed Tahirê kurê Mela 'Ebdirrehmanê Maî (kd. 1915) di medha Melayê Cizîrî da bi zimanê farisî înafe. Çunkî ev şî're bi hizira min hêsta belav nebûye me divêt deqê wê li vêrê

bînîn. Şêx Mihemed Tahirê Maî dibêje:

دهد رونق فزای لا جرم بر شعر خاقانی
چو کلشن سر بسر از سنبل و نسرين و از لاله
پر از ریحان و نرگس از شقائقهای نعمانی
برقت برگ گول سیراب چون شاهبسر و افرام
به بو چون مشک و چون کافور و همچون عطر کرمانی
چو حافظ در معانی و بلاغت می رباید گو
ز میدان فصاحت طعنه‌بخش نظم قا آنی
ز سعدی و ز جامی می دهد اشعار آن اشعار
نظامی نظم خود سازد نثار آن بآرزانی
کند احیای دل‌های هر آن دل مرده هر لحظه
کند بازار عشق از نو بر ای قاصی و دانی
چو نظم لؤلؤ لالا چو یاقوت بها والا
چو مرجان قیمتش بالا بخود چون لعل رمانی
چو هر لفظی دهد معنی‌اش می کند گفتم
تعالی الله چه یکتا گشته این دیوان بوطنی
ز شیخ کامل و اکمل امام عارف و افضل
میان واصل و کامل لسانی غوث گیلانی
که نامی نامیش احمد امام امجد و اوجد
ازو گشته جزیر سر بسر پر فیض و نورانی
هزاران رحمت از حق باد بر جان شریف او
ز مایان آفرین بر وی چو بارانهای نیسانی
قلم بشکن تو طاهر کز تنایش چون توان گفتن
که در دهر ویش کجاگشته یک دیگر برش ثانی

6. Şi'reka Mela 'Ebdirrehîmê Westanî

Di vê destnivîsê da Mela 'Ebdirrehîmê Westanî şî'reka xwe jî ya kurdî di der heqê Melayê Cizîrî da îneye, ew jî belav nebûye. Eve deqê wê ye:

Meded ya Ehmedê Buhtî bike rehmê li me derwîşan
Te dîwanek ji durran rihtî Mela luqmanê dilrîşan

Kesê sahib fîraset bit dizanî cumle Qur'an e

Xudan 'ilm û heqîqet bit hemî remzên hedîsan e

Usûlê dîn diket îzhar we her beytek çu ayatan
Ji Furqanê bizan ey yar ji tamamê diket hikayatan

Cemî'ê me'na Qur'anê di dîwana te mezmûn e
We her lefzek di dîwanê heqîqet wehy e mewzûn e

Mu'emmayê bi lisanê hal ji kelimê heq tu yî natiq
'Ecaib durrê bêemsal 'ibaratên di wê sadiq

Ne Hafîz vê diket me'na ne Tebrîzî û hem 'Umer
Ne Keşşaf û ne Bûsîna heme ra her tu yî serwer

Edîbê 'alema xeybê mu'ellimxaneê 'ilmî
Ledunnî ra diket reybê bi wan surran bi wê hilmê

Heme feyz û tecella ye tamam esrarê qudret tê
Şerî'et ra çî derya ye terîqet mewcê hikmet tê

Çî taqatê beşer têtin bi vî terzî belaxet hem
Meger îlham ji heq bêtin çu mewcê behrê der Qilzem

Seraser cezbe û nûr e heqîqet 'işqê mewcûd e
Hizar me'na tê meştûr e ji sîrrê zatê me'bûd e

Cilaya jenga qelban e ew e ser çeşmeya nûrê
Muhîte cumle 'ilman e tecellaya li ser Tûrê

Ji rûhê tu mededxahîn bike rehmê li mehrûman
Ji hubba te dil her ahîn eya xiyasê meczûban

Tu yî sultanê 'uşşaqan beqa billah dilê Tûrî
Çî meşhûr î li afaqan heta bêt nefxeya sûrî

Meded ya qutbê Cizrawî dilê 'Ebdirrehîm derd e
Bike derman birîna wî bihibellah hilîn perde
Amîn el-wet wel-halat 1354

Encam

Dîwana Melayê Cizîrî yek ji şaheserên edebîyata kurdî ya klasîk e û ji ber vê yekê di dîroka edebiyata kurdî de gelek edîb û zana li ser wê şerh nivîsîne. Yek ji wan jî Mela 'Ebdirrehîmê Westanî ye. Mela 'Ebdirrehîm, alimekî ji hêla Westana Wanê ye û di navbera salên 1894-1956an de jiyaye. Ji ber şerê cihana yekem çûye Cizîrê û li wir jî perwerdeya xwe domandiye. Hetanî niha sê berhemên wî tê zanîn ku ew jî kitêba *Dilaile'l-Sibyan*, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî* û komeke şî'rên wî ne.

Mijara vê gotarê şerha Mela 'Ebdirrehîmê Westanî ye ku wî li ser *Dîwana* Melayê Cizîrî nivîsiye. Westanî şerha xwe bi sê zimanan an ku bi erebî, farisî û tirkîya osmanî nivîsiye. Destnivîsa Westanî ya *Dîwana* Cizîrî ji 387 berperan pêk tê û ji bilî nivîsîna dîwanê bi xwe û danana te'lîqatan li ser hindêk cihan, mela 'Ebdirrehîmî çend tiştêkên di jî yên bimîfa nivîsîne. Bo nimûne, li serê wê çend berperê li dor kêş û weznên şî'rê nivîsiye û her kêşekê hindêk nimûne bo înayîne û ji bilî behrên 'erûzî yên behsê jê kirî wî behsê rengên meqaman jî kirîye.

Ew bi xwe Mela 'Ebdirrehîmê Westanî di jîyana xwe da pitir ji daneyekê ji *Dîwana* Melayê Cizîrî nivîsiye li Remezana sala 1353/1934ê. Her weha li ser te'lîqên Mela 'Ebdirrehîmî hejmareka dîrokan têne dîtin, ew jî eve ne: 1353, 1371, 1366 û 1375. Ji vê têtê zanîn ku heta wê sala ew tê da mirî jî hêştê wî te'lîq lê zêde dikirin. Li dûmahîka destnivîsê jî Mela 'Ebdirrehîmê Westanî çend berper li dor şerha hindêk zarav û muştêhatên *Dîwana* Cizîrî berhev kirîne, wek ferhengokeka biçûk û ew di şerha xwe da bo van peyvan li dû rêbaza sûfîyan çûye.

Bi vê nivîsarê me xwest ku Mela 'Ebdirrehîmê Westanî û şerha wî ya li ser *Dîwana* Melayê Cizîrî bidine nasandin. Em hêvî dikin ku siberoj ev berhema destnivîsê bibe cihê lêkolînê xebatên kurdî yên akademîk.

Çavkanî


Adak, A., Acar, H. & Aykaç, Y. (2017). Bibliyografyaya Melayê Cizîrî. *Mukaddime*, C. 8, jimar 3, Hejmara Taybet - Melayê Cizîrî, 171-199.

Bingöl, A. (2008). *Kulîlkên Baxê Botan*, Diyarbekir: Enstîtuya Kurdî ya Amedê.

Mela Ebdirrehîmê Westanî. *Destnivîsa Şerh û Te'lîq li ser Dîwana Melayê Cizîrî*. (Fotokopiya Nusxeyê).

Nursî, Bediüzzaman S. (2011). *Emirdağ Lahikası*. (c. II). İstanbul: Zehra Yayıncılık.

Pêvek



Du wêneyên cuda yên Mela 'Ebdirrehîmê Westanî (1894-1956)



Deştpeka Dîwana Melaya Cizîrî bi deştivîsa Mela 'Ebdirrehîmê Westanî.



Dûmahîka Dîwana Melaya Cizirî bi destnivîsa Mela 'Ebdirrehîmê Westanî.



Destpêka Şerha Dîwana Melaya Cizirî ya Mela 'Ebdirrehîmê Westanî.



Wereqek ji Şerha Dîwana Melaya Cizirî ya Mela 'Ebdirrehîmê Westanî.



Wereqek ji Şerha Dîwana Melaya Cizirî ya Mela 'Ebdirrehîmê Westanî.



Wereqek ji Şerha Dîwana Melaya Cizirî ya Mela 'Ebdirrehîmê Westanî.



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 7

e-ISSN 2717-8315

DOI: 10.55118/kurdiyât.1302100

Rûpel/Sayfa Page: 75-79



Nirxandina Sempozyûmê Sempozyum Değerlendirmesi Symposium Review

IV. SEMPOZYÛMA NAVNETEWÎ YA KURDIYATÊ MELAYÊ CIZÎRÎ Û MÎRASA WÎ

IV. Uluslararası Kurdiyât Sempozyumu Melayê Cizîrî ve Mirası

IV. International Kurdiyât Symposium Melayê Cizîrî and His Heritage

Nevzat EMİNOĞLU

75

Cureya Nivîsarê/Makale Tûrû/
Article Types:
Nirxandina Sempozyûmê/
Sempozyum Değerlendirmesi/
Symposium Review
Dema Hatînê/Geliş Tarihi/
Received: 25.05.2023
Dema Pejirandinê/Kabul
Tarihi/Accepted: 12.06.2023
Nevzat Eminoğlu, Dr. Öğr.
Gör., Kürt Dili ve Edebiyatı,
Fen-Edebiyat Fakültesi, Muş
Alparslan Üniversitesi.
n.eminoğlu@alparslan.edu.tr
ORCID: 0000-0002-4980-7556

Atf: Eminoğlu. N. (2023).
“Nirxandina IV. Sempozyûma
Navnetewî ya Kurdiyatê:
Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî”,
Kurdiyât, 7, 75-79.
Citation: Eminoğlu. N. (2023).
“Symposium Review of
IV. International Kurdiyât
Symposium: Melayê Cizîrî
and His Heritage”, Kurdiyât,
7, 75-79.

Di salên 2009-10an de li Tirkiyeyê di hin zanîngehan de Enstîtuyên Zimanên Jîndar, beşên Ziman û Edebiyat/Çanda Kurdî û bernameyên mastir û doktorayên di qadên Ziman û Edebiyata Kurdî de vebûn. Paşê hin zanîngehên ku ev beş û program lê hene, sempozyûmên navnetewî yê girîng, konferans, komxebat û hwd. di derbarê nasname, ziman û edebiyata Kurdî de li dar xistin. Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê jî yek ji van zanîngehan e ku di bin banê Enstîtuya Zimanên Jîndar yê li Tirkiyeyê de programa mastira Ziman û Edebiyata Kurdî lê heye. Ev zanîngeh hema bigire ji serê destpêka vebûna Enstîtuya Zimanên Jîndar vir de her sal li ser mijar û kesayetên edebiyata Kurdî sempozyûmekê li dar dixê. Par li ser Feqiyê Teyran sempozyûmeke bi navê “III. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê Feqiyê Teyran û Mîrasa Wî”, pêrêr derbarê Ehmedê Xanî de bi navê “II. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê Ehmedê Xanî û Mîrasa Wî”, bêtir pêrêr jî sempozyûmeke li ser kitêb û xebatên bi Kurdî yê li ser zanistên Îslamê bi navê “Sempozyûma Zanistên Îslamê yê bi Zimanê Kurdî” hatibû lidarxistin.

Îsal di 27-28ê meha Nîsanê de li Wanê dîsa li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê sempozyûmeke navnetewî ya pir giring a bi navê “IV. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê: Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî” hate lidarxistin. Gelek akademîsyen û lêkolerên hêja ji zanîngehên welatê me û herwisa ji dewletên wekî Îran, Îraq, Sûriye, Emrîka, Almanya, Swêd û hwd. beşdarî vê sempozyûmê bûn. Di vê sempozyûmê de ji hêla gelek pispor û lêkolîneran ve gelek teblîxên giring ên li ser Melayê Cizîrî û dîwanên wî hatin pêşkêşkirin.

Melayê Cizîrî yek ji wan şairan e ku lûtkeya edebiyata Kurdî ya klasîk temsîl dike. Herwisa Melayê Cizîrî edebiyatnasekî berbiçav e di nav edebiyata Îslmî de ku hewzeya medeniyeta me pêk tîne. Ev kesayetiyê gewre ê edebiyata Kurdî cihgirtina di nav edebiyata cihanî de jî zêde zêde heq dike. Em ê li ser çend xalên giring bisekinin ku di sempozyûmê de hatine pêşkêşkirin.

Organîzasyona Sempozyûma Navnetewî ya Melayê Cizîrî

Di lijneya lidarxistinê ya sempozyûmê de navên wekî Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş, Doç. Dr. Haşim Özdaş, Dr. Yakup Aykaç, Arş. Gör. Mustafa Acar, Öğr. Gör. Hacı Yılmaz, Arş. Gör. Sinan Çakar ji Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Doç. Dr. Hemin Omar Ahmad, Dr. Zafer Açar, Öğr. Mehmet Nur Yavuzer ji Zanîngeha Bingölê, Dr. Yaşar Kaplan ji Zanîngeha Hekkariyê, Dr. Öğr. Gör. Nevzat Eminoglu ji Zanîngeha Muş Alparslanê cih digirin.

Di lijneya zanist û şêwrê ya sempozyûmê de jî navên wekî Prof. Dr. Abdurrahman Candan ji Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Prof. Dr. Abdurrahim Alkış ji Zanîngeha Şırnakê, Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi ji Zanîngeha Dicleyê, Prof. Dr. Halit Demir Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Prof. Dr. Hasan Çiçek ji Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Prof. Dr. Jalile Jalil ji Academy of Science Vienna-Austriyê, Prof. Dr. Mchel Cheyt ji Enstîtuya Kurdî ya Washington-Emrîkayê, Prof. Dr. Seyid Ahmed Parsa ji Zanîngeha Kurdistan-Îranê, Prof. Nesim Doru ji Zanîngeha Ankara Sosyal Bilimlerê, Yadgar Resûl Mihemed Emîn ji Zanîngeha Soran-Herêma Kurdistan Federe ya Iraqê, Prof. Dr. M. Zahir Ertekin ji Zanîngeha Bingölê û hwd. cih girtine.

Di vê organizasyonê de ked û xebata mazûvanê sempozyûmê, rektorê Zanîngeha Wanê Prof. Dr. Hamdullah Şevli, midurê Enstîtuya Zimanên Jîndar Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş, nivîskar-lêkolîner M. Xalid Sadînî, ji fakulteya îlahiyatê Doç. Dr. Haşim Özdaş, Arş. Gör. Mustafa Acar, mamosteyên enstîtuyê Dr. Yakup Aykaç, Öğr. Gör. Hacı Yılmaz, Arş. Gör. Sinan Çakar, û yek ji sponsorê sempozyûmê serokê Şaredariya Artemêtê Av. İsmail Say divê bi spasdarî bête bibîrxistin.

Di sempozyûma Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî de ji hêla 40 beşdarvanan ve bi qasî 40 teblîxên giring ên li ser Melayê Cizîrî û dîwana wî hatin pêşkêşkirin. Piraniya van teblîxan bi awayekî “bi amadebûn” yanî bi awayekî “hazirê wextê” hatin pêşkêşkirin. Lêbelê qismekî wan ên hindik jî ji ber ku îmkana beşdariya bi amadebûn nedîtibûn, bi awayekî online teblîxên xwe pêşkêş kirin.

Gülşen Orhan: Mêvana Rûmetê ya Sempozyûmê

Mêvana rûmetê ya vê sempozyûmê wekîla berê ya Wanê û serşêwirmenda serokkomar, Gülşen Orhan bû. Orhan ji sala 2009an vir ve her sal bi alikariya saziyên fermî yên wekî zanîngeha Wanê, walitiya Wanê, qaymeqamtiya Mîksê, şaredariya Artemêtê, rêberiya pêkanîna sempozyûm û panelên li ser kesayetiyên ziman û edebiyata Kurdî dike. Herwisa Gülşen Orhan rêberî û ko-

ordinatoriya çapkirina zêdetirê 16 kitêbên Kurdî yên klasîk ji çendîn şair û edebiyatnasên bijarte yên Kurd kiriye bi wasîteya Wezareta Çand û Turizmê ya dewleta Tirkîyeyê. Lewra di tarîxa komara Tirkîyeyê de cara ewil e ku dewlet bi saziyên xwe yên resmî kitêbên Kurdî çap dike. Di nav kitêbên Kurdî yên ku hatine çapkirin de kitêbên wekî *Mesnewiya Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî, *Dîwana Melayê Cizîrî*, *Dîwana Feqiyê Teyran*, *Nehcul Enama Mela Xelîlê Sêrtî*, *Dîwana Pertew Begê Hekarî*, *Mewlûda Kurmancî* ya Mela Huseynê Bateyî, *Mesnewiya Seyful Mulûk û Bediulcemal* a Siyahpoş, *Adat û Rusumatnameyê Ekradiye* ya Mela Mehmûdê Bazîdî, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, *Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî* hene. Lewma ev biryara wekî mêvanê rûmetê ya ji bo Gülşen Orhan Xanimê gelek di cih de û qedirşinasane bû.

Hin Teblîxên Sempozyûmê û Mijarên ku Derketine Pêş

Li ser Mela û dîwana wî gelek teblîx hatin pêşkêşkirin. Çend sernavên ji van teblîxan ev bûn: “Danasîna Destxeta Herî Kevn a Dîwana Melayê Cizîrî”, “Lêkolînewek le ser Wîşekanî Estêrenasî le Dîwanî Melay Cizîrî”, “Perwedehiya Edebiyatê di Medreseyan de û Dîwana Melayê Cizîrî”, “Bandora Melayê Cizîrî li ser Şairên Kurdînivîs”, “Rehendekanî Ewîn le Şî’rî Melay Cizîrî”, “Rewşên Eşqê di Şî’ra Melayê Cizîrî da”, “Nûnerekî Mezin ê Helbesta Hîkemî: Melayê Cizîrî”, “Ciwanînasî Wegêranî Şî’rekanî Melay Cizîrî bo Kurmancî Xwarû le Hawkêşey Me’rîfey Şî’rî da”, “Rêbazî Hurûfî le Şî’rî Melay Cizîrî da”, “Melayê Cizîrî di Romana Kurdî de”, “Înqîlaba Melayê Cizîrî di Şî’ra Klasîk de”, “Dîwanê Melayê Cizîrî de Peywendiyê Ziwanan”, “Unsûrên Mîtolojîk di Dîwana Melayê Cizîrî de” û hwd.

Ev çend nimûneyên sernavên teblîxan bûn ku di IV. Sempozyûma Kurdiyatê ya Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî de hatine pêşkêşkirin. Teblîx bi zimanên Kurdî (zaravayên Kurmancî, Soranî û Zazakî), Farisî, Erebî û Tirkî hatin pêşkêşkirin. Di vê hêlê de Mela û dîwana wî bi zimanên sereke yên rojhilata navîn ve bi gelek aliyên ve hate nixandîn.

Di vê sempozyûma navnetewî de gelek teblîxên li ser mijarên giring ê qada Cizîrînasîyê hatin pêşkêşkirin. Mijareke muhîm a bi navê “Dîwana Melayê Cizîrî wekî Berhemeke Klasîk” Prof. Dr. Abdurrahman Adak mamosteyê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Mardînê di teblîxa xwe de anî ziman. Adak, behsa pênc hewzeyên edebîyatê yên li dinyayê kir û ev hewze wekî “Hewzeya Edebiyatê ya Ewrûpayê”, “Hewzeya Edebiyatê ya Îslamî”, “Hewzeya Edebiyatê ya Emrîkayê”, “Hewzeya Edebiyatê ya Afrîqayê” û “Hewzeya Edebiyatê ya Rojhilata Dûr” destnîşan kir. Li gor Adak, di nav van hewzeyan de yên berbiçav û ji bo me jî giring “Hewzeyên Edebiyatê yên Awrûpa û Îslamî” ne. Adak got ku di nav berhemên van hewzeyan de derecebendiyê li gor kalîteyê heye. Li gor xebat û lêkolînen me yên li ser edebiyata klasîk ku di çarçoveya prensîbên edebiyata muqayeseyî de şahesera Mela, dîwana wî ya bi Kurdî di nav kategoriya pêşîn de cih digire û mensûbê lîga ewilîn e li erdnîgariya hewzeyên edebiyatên Ewrûpa û Îslamî. Digel van tesbîtên objektîf û zanistî ev problematîk jî hate nîqaşkirin ku dîwana Mela ya kanonîk herçiqas di nav edebiyata dinyayê de di rêza şaheserên pêşîn de ye, çima li gor vê kalîteya xwe nayê nasîn û qalkirin? Wekî sedemên vê yekê, behsa du egeran hate kirin. Yek, bîyanîbûna Kurdan a li nasname, ziman û dîroka xwe ya di vê sedsala dawî de. Lewra piştî xebata oryantalistê Alman Martin Hartmann a li ser dîwana Mela ya di sala 1904an da Kurd hê nû li ser dîwana Mela dixebitin. Ya duduyan jî wekî qedexê, berbendî û înkara nasname, ziman û edebiyata Kurdî hate nixandîn.

Di dempozyûmê de wekî xaleke giring û pêwîst li ser hat sekinîn ku ji bo nasîna tam a Mela ya di qada edebiyata cîhanî de lazim e hemû helbestên Mela bêne wergerandin bi zimanên sereke yê dinyayê yê wekî Îngîlîzî, Almanî, Fransî û hwd. Herçiqas Dr. Ferhad Şakelî akademîsyenê ji Başûrê Kurdistanê ku li Ewrûpayê dixebite, çend helbestên Mela wergerandin Îngîlîzî jî lê divê hê bêhtir bîn wergerandin.

Di sempozyûmê de hate destnîşankirin ku di van salên dawî de behskirin û cihgirtina edîb û şairên Kurd ên wek Mela ya di nav berhemên edebî yê cihanî û antolojiyên edebiyata dinyayê de hêvîyên me zêdetir dikin. Herwisa cihgirtina şairên wekî Mela, Xanî, Feqî û hwd. Di berhemeke bi navê “Edebiyata Îslamî” de ku li dor nimûneyên edebiyatên milletên misilman de hatiye nivîsîn de ji aliyê Prof. Dr. Mahmut Kaya ve li Tirkîyeyê jî giring hate dîtin.

Mijareke din a balkêş ew bû ku Melayê Cizîrî û mîrasa wî wekî babeta qada edebiyata modern hatibû nîrxandin. Ew jî ew roman bûn ku li ser Melayê Cizîrî hatibûn nivîsîn. Îlyas Suvağcı û Ümran Altınkılıç li ser vê mijarê sekinîn. Heta niha qasî ku tê zanîn li parçeyê bakûr du roman li ser Melayê Cizîrî hatine nivîsîn: Romana bi navê *Şebçirax* a Gülistan Çoban Eminoglu û romana bi navê *Xewneke Payîzê* ya İlhami Sidar. Van her du lêkolîneran behsa van romanên kirin û ew nîrxandin. Her wisa gotin ku ev hejmar pir kêr in û divê hê bêhtir roman bîn nivîsîn. Lewra Tirkan û milletên din li ser her şairekî xwe yê di hemtayê Mela de bi dehan roman û çîrok nivîsîne. Van rojên dawî romaneke bi zimanê Erebbî jî derket li ser Melayê Cizîrî. Ev roman jî hêla Jan Dostê ji parçeyê Rojava li Ewrûpayê hatiye nivîsîn bi navê “*Mecnûnê Selma*”. Wekî din divê ev yek jî bête lêkolînkirin ka gelo li Başûr û Rojhilat romanên li ser Melayê Cizîrî hene yan na. Lewra em nizanin û haya me ji wan nîne.

Mijareke giring a ku akademîsyen û lêkolînerên ji Îranê beşdarî sempozyûmê bûne, wekî pêşniyazeke li ser Melayê Cizîrî anîne rojevê ev bû ku ji aliyê UNESCO ya Saziya Parastina Çanda Cîhanî ya Neteweyên Yekbûyî ve saleke ji salên pêşiya me wekî sala cîhanî ya Melayê Cizîrî bête qebûlînkirin. Wihareng Melayê Cizîrî û mîrasa wî wê bi sponsoriya Neteweyên Yekbûyî ve bi gelek zimanan, li gelek welatan û di civînên zanistî-akademîk de bête danasîn û bi sempozyûm, çalakîyên li her aliye cîhanê ve bal û qîmeta ku heq dike bibîne. Lewra UNESCOyê jî bo helbestvanên hêja yê di asta Melayê Cizîrî de yê wekî Hafîzê Îranî, Mewlana û Yunus Emre sala cîhanê îlan kir. Çima jî bo Mela jî neye îlankirin?

Di sempozyûmê de mijara bi sernavê “Honerê Asêkirina Maneyê li nik Melayê Cizîrî” jî hêla Tehsîn Îbrahîm Doskî ve hate pêşkêşkirin. Li gor Doskî hin şair û edebiyatnas rengêkî asêbûnê wek hunerekî edebî û bi qesta ciwanariyê dixin nav karê xwe. Asêbûn pirî caran wek nîşana zîrektî û pisporiya şair têtê pejirandin. Di dîroka edebiyata Kurdî de Melayê Cizîrî yek ji wan şairê mahîr e ku hunerê asêbûnê yan asêkirina şîrê di berhemên xwe de bi awayekî serkeftî bikaraniye. Ev huner şîrê digêrîne hunerekî estetîk û meseleyeke zewq û lezetê. Herwisa behredariya şair nîşan dide.

Di teblîxa bi sernavê “Giringî û Revakirina Wêjên Dijber di Nêrîna Melayê Cizîrî de” de Ruhullah Öz nêrîna Mela ya ontolojîk, teolojîk û felsefî li ser wateya hinek wêjên dijber dinîrxîne. Li gor Öz, Melayê Cizîrî bi teşeya dijberî him bêhempatiya Xweda him jî dubendiya gerdûnê li ser bingeha yektiyê saz kiriye. Wî ev nêrîna muşkilpesend bi awayekî pisporane aniye ziman û

herwiha zimanê Kurdî di vê qada felsefî ya kûr û kompleks de bi awayekî mahirane bi kar aniye.

Rektorê Zanîngeha Şîrnexê Prof. Dr. Abdurrahim Alkış di rûniştina nîrxandina sempozyûmê de mizgîniyeke parve kir û got wan wekî Zanîngeh, Navenda Lêkolînê ya Melayê Cizîrî ava kirîye û di bin banê vê saziyê de li Tirkîyeyê û cîhanê dest bi xebatên li ser Melayê Cizîrî kirine. Li gor agahdarkirina Rektor Alkış, bi îlankirina hefteyekê ji salê wekî hefteya bîranîna Melayê Cizîrî, dê sempozyûm, panel, bîranîn hwd. li dar bixin. Herwisa dê hewl bidin ku vî nîrxê me yê navnetewî bi awayekî pîralî nas bikin û bidin nasîn.

Encam

Li Tirkîyeyê xewn û xeyaleke hemû Kurdan bû ku rojekê saziyên dewletê xasma zanîngehên dewletê li ser mezin, şair û nîrxên Kurdan sempozyûm çêkin û ji çar aliyên dinyayê zana û zanyar alim û akademîsyen bîn li ser wan teblîxan bidin. Ev sempozyûma navnetewî ya ku zanîngeha Wanê çêkir û dike, xeyalên Kurdan ên sedsale tîne cih. Di vê sempozyûmê de Melayê Cizîrî wekî cewher û nîrxekî Kurdan ê veşartî, ji her alî ve hate nîrxandin. Ev xebat ji bo nasîn û danasîna Mela ya di qada alema Îslamî û asta cîhanî de hêz û hêvîyên meriv zêde dike. Lewra gelek mijarên giring û gelek teblîxên hêja hatin pêşkêşkirin.

Meriv dikare wekî pêşniyaz, di sempozyûmên navnetewî yê wek vê sempozyûmê de kesayetên netewî yan navnetewî yê ku li ser mijara sempozyûmê xebitîne, bi awayekî taybet, wan xeberdar bike û wan dawetî sempozyûmê bike da ku xebatên xwe pêşkêş bikin. Lewra çend kesayetên navnetewî ku li ser Mela xebitîbûn di sempozyûmê de tunebûn. Wek mînak, Muhammed Xalid Cemîl ji Sûriyeyê yan jî Doç. Dr. Juanna Bohchenisca ji Polonyayê, Prof. Dr. Martin Van Brunessen ji Hollandayê û hwd.

Mijareke ku wek kêmasî dihate dîtin ev bû ku piştî her rûniştinê wext tunebû ku mêvan û guhdar pirsan ji teblîxvanan bikin û gilî û gotinên xwe bikin. Di sempozyûmên din de demek ji bo pirs û bersivan bête terxankirin dê baştir be bi qenaeta me. Herwisa ji bo zelalkirina mijaran, bersivdîtina pirsên di hişê mêvanan û hasilbûna meqsedan a ji sempozyûmê, dê fonksiyoneltir bibe.

Di nav beşdarvanên ku ji gelek zanîngehan û ji welatên cuda hatibûn, hejmara beşdarvanên jin kêmtir bûn. Tenê navê sê xanimên akademîsyen yan jî nivîskar hebûn di nav beşdarvanên sempozyûmê de. Divê akademîsyen, lêkolêr û nivîskarên jin jî di qada Cizîrînasîyê de derkevin pêş û xebatên xwe bigihînin raya giştî û qada akademiye.

Ev teblîxên di sempozyûmê de li ser Melayê Cizîrî û dîwana wî hatin pêşkêşkirin, dê paşê bi navê “Xebat û Lêkolînên li ser Cizîrînasîyê” ji aliyê Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê ve wekî kitêb bête çapkirin da ku bibe çavkaniyeke mayinde ji bo xebatên vî biwarî.

